K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# REXNEYA CIVAKÎ DI HELBESTÊN ABDULLAH PAŞÊW DE

TÊZA LÎSANSA BİLİND

AMADEKAR: Nali Abdullah Khudhur

ŞÊWERMEND: Doç. Dr.Vechi SÖNMEZ

Wan - 2016

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
SANAT TARİHİ ABD
KÜRT DILI VEKÜLTÜRÜ BİLİM DALI

# ABDULLA PAHSEW İN ŞİİRLERİNDE TOPLUMSAL ELEŞTİRİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN: Nali Abdullah Khudhur

DANIŞMAN: Doç. Dr. Vechi SÖNMEZ

VAN – 2016

NAVEROK ........ I
KURTE ........ II
ÖZET ........ III
ABSTRACT ........ IV
PÊŞGOTIN ........ V
KURTEBÊJE ........ VII
1.PÊNASE Û ÇEMKA REXNE ........ 1
1.1.Rexne ........ 1
1.2.Rexne ya civakî ........ 2
1.3.Rexne û afirandin ........ 4
1.4.Helbestvan mîna rexnevan ........ 6
1.5.Hevbendiya helbestê bi civakê ve ........ 10
1.6.Jiyana Abdullah Peşêwî ........ 13
2.DIYARDEYÊN XIRAB LI CIVAKÊ KURDÎ DE ........ 15
2.1.perçe perçebûn û hevirkya hevdû (yektir) ........ 15
2.2.Rewşa paşketna civak û êşa nezanîn û nexwendevanî ........ 27
2.3.Zordestiya li jinan dibe (jin û stemkarî) ........ 34
2.4.Xrapiya rewşa aburî û zordestî li kirêkaran ........ 38
3.NÎŞANDANA KÊŞEYÊN NETEWATÎ ........ 46
3.1.Perçe perçe buna xak û nebûna wilat ........ 46
3.2.Ala (beyreq) ........ 58
3.3.Prutistokirna şer û dixwazîya aştî ........ 61
3.4.Bêdengî welatan li astê zordariyê li kurd kiriye ........ 69
3.5.Rexnekirina sîstema wilat û nebuna 'edalet ........ 81
3.6.Zivrîn (vegeriyan) bu kelepura gel ........ 89
ENCAM ........ 102
ÇAVKANÎ ........ 103

**KURTE**

Ev lêkolîn (Rexneya civakî di helbestên Abdullah Pahşew de) ji sê beşên teorîk û kardarî pêk hatiye.

Beşa Yekem

Di vê beşê de, pênaseya rexneya civakî hatiye kirin, taybetmendîyên rexne û wêjeyê ên giştî, di naveroka helbestan de fonksîyona rexneyê hatiye dahûrandin.

Beşa Duyem

Di beşa duyem de, mijar û bûyerên ku helbestvan – helbestvanê ku bo civaka Kurd fenomenek e - bo helbesta xwe hibijartiye hatiye nîşandan.

- Parçeweslebûna welat.
- Ji alîyê hişmendî û pêşverûtî ve paşketina civakê.
- Dijraberîya bi hev re û berjewendîyên wan.
- Bindestxistina jinan, karkeran û mirovên xizan.
- Ev mijarên ku hatin diyarkirin, di hin helbestan de, bi awayekî diyarkirina payeyên nivîsandina dema wan helbestan hat nîşandan û dahûrandin.

Beşa Sêyem

Ev beş pirsgirêkên neteweyî dihewîne. Ew jî:

- Rexneya ku ji alîyê helbestvan ve li sîstema welêt hatiye kirin.
- Bêalbûn û pirsgirêkên bêalbûnê.
- Bangewazîya ku bo aştî û azadî.
- Têkoşîna li hemberê şer.
- Bêdengîya welatên ku li hemberê çewisandina ku bi gelê Kurd tê kirin.
- Vegera çanda gelê kurd ku a resen.
- Bo ev hemû mijaran mînakên helbestî û hunermendî hatin hilbijartin û hatin vekolandin û dahûrandin.

**ÖZET**

Bu araştırma (Abdulla Pahsew in şiirlerinde toplumsal eleştiri)teorik ve pratik olarak üç bölümden oluşmaktadır.

ilk kısım:

Bu bölümde, toplumsal eleştiri tanımı açıklanmıştır, eleştiri ve edebiyatının genel noktaları, elealınmış eleştiri ve şiirler gösterilmiştir ayrıca şiir içinde eleştiri fonksiyonu analiz edilmiştir.

ikinci kısım:

İkinci bölüm, Kürt toplumu içinde bir fenomen olarak şria kendisi ni ve şiirlerini öne çıkardiğı şu konular ele alınmıştır.

- Memleketin paramparça olması.
- Bilinç ve açık fikirli bir toplum düzeyine gerilemesi.
- Birbirlerine ve çıkarları nın karşıt duruma gelmesi.
- Kadınları, calısanları ve fakileri baskı altında tutmak.
- Tüm bu açıklanar olaylar, çeşitli şiirler ve onların yazı aşamalarının örnekleri tarihi olermak yeniden erek söylen analiz edildi.

Üçüncü kısım:

Bu kısımda ulusal sorunlar ele alınmıştır:

- Şair tarafindan ülke sistemini eleştirme.
- Adaletsizlik.
- Bağımsızlık.
- Bayraksızlık.
- Barış ve özgürlük için çalışmak.
- Savaşa karşı mücadele.
- Diğer ülkelerin sessiz kalmaları kürt milletinin ezilmesine karşı mücadele.
- Gerçek kürt kültürüne dönmek.

Bütün bu konular için, şiirsel ve sanatsal örnek alınmış ve sonra analiz ve incelenmiştir. Sonuç olarak, şu noktalara varmak mümkündül:

**ABSTRACT**

This study which is entitled ' Social Criticism in Abdulla Pashew's Poems : Theory and Practice' consists of three parts.

Part One:

This part deals with definition and concept of social criticism , general lines of criticism and literature , criticism and poetry and the role and function of criticism in poetry.

Part Two:

This part tackles the phenomena in the Kurdish community, the ones that the poet made the row material for hi poems such as:

- Disintegration of the homeland
- Low awareness and openness of the society
- Conflict and Interest
- Oppression of women , labours and poor class.
- For all the above mentioned phenomena poetic samples of various types , stages of writing and analysis are presented.

Part Three:

This part is devoted to the national issues such as:

- Poet's criticism of the ruling system.
- Lack of justice.
- Lack of independent country.
- Lack of flag and related issues.
- Call for peace and freedom.
- Confronting war.
- Silence of the international community toward Kurds oppression.
- Return to the authentic Kurdish culture.

For all these topics poetic samples and analysis are provided.

**PÊŞGOTIN**

Guhertinên mezin di jiyanê de encama nakokiyên mezin in. Piştî, ku Kurdên Kurdistana îrakê gelek qurban di riya rizgarkirina îrakê ji bin destlata sedamê de dan, ewana ji destkevtiyên wê rizgarkirinê bê par hatin hêştin, nemaze jî piştî ku jiyana perlemanî, bi encama tevdîrên leşkeran, di salên pênciyên sedsala borî de, jihev ket, pêre jî desthilata îrakê çavên xwe li kurdan pir sor kiri û tevdîrên awarte li ser wan pêk anîn.

Tiştê ku ji ber helbestvanan û nivîsevanan maye, û gîhaye me, dîwanên hinekan in, ên ku aferîn û hestên wan diyar dikin, lê di dîwanan de em nikarin her tiştê, ku li gel qulafet û durvên wan hevbestin, bibînin, pê re jî hemî rengdêrên wan, durv û reng û qelewbûn û lawazbûn û dirêjî û kurtbûna bejnê, û nûçeyên zaroktiyê û malbatê. hemî wendan e, û ne diyar in. Evan rengdêran, li gor derûn-nasînê (pisîkology), bandoran giran li ser şêweyê derbirînê û awayê pûnjiyê û pêkhatina kesayetiyê û veqetandina wê ji kesayetiyên din heye. Her weha evê yekê bandora neyênî kişand ser rexneya wêjeyî jî, ku li kêlek wan berheman tevgereke rexneyî peyda ne bû.

Belê ber bi rola tirazû, ritmê û muzîka hundirîn de dikşîne, pêre jî mirov pê hay dibe, ku Xemcivîn dixwaze gelek rêbazên rexneyê bixebitîne, û bigihe rêbaza, ku em mêldarê xebitandina wê ne, ew jî rêbaza hevtewaw e (Tekamulî).

Ev rêbaz, ji bo nirxandina berhema wêjeyî, gelek rêbazan dixebitîne, çi dîrokî, civakî, derûnî û çi hunerî bin, sûdeyê ji hemiyan werdigire, ji ber ku weha diçe, ku wêje hem berhema nîr û pergalên dîrokî, civakî, aborî û mirovatî ye, û hem jî berhema huner e, hem hukariya wê li civakê heye, û hem jî civak li wê hukardar e; ango hevguhertina hukariyê di navbera wêje û nîrên derdora wê de heye.

Bi ser de jî, piştî ku yekemîn cenga navdewletî bi dawî hat, pê re xêzên Sykes-Picot, ên ku sala (1916)ê bi ser sîngê Kurdistanê de kişandibûn, diyar bûn, û beşê Kurdistanê, yê ku bi ser dewleta Osmanî ve bû, bi ser her sê dewletên Tiryê, Sûriyê û Îraqî ve xistin, û her du têgehên (Serxet û Binxet) li ser zibanan geriyan, ewan têgehan tirajîdeya Kurdan hîn jî diwartir kirin, ji ber ku hemî deverên Kurdan, ku li Binxetê mane (Kurdistan), deverine gundî bûn, û ewê xetê têkiliyên wan li gel bajarên Kurdan lawaz kir, û ewana ta demek dûrdirêj, dîlên jiyana gundîtî, bê dibistan û bê xwendin hêşt. Vê lomê jî xebatên rehmelê Husên Hiznî Mukuryanî (1883 – 1947), ku yekemîn çapxaneya kurdî li bajarê Helebê sala (1915)ê ava kiribû, û heya sala (1925)ê li wir mabû, û gelek

rojnameyên kurdî û hin pirtûk weşandibûn, nikarîbûn bandoreke berbiçav li rewşebîriya Kurdan ya wê demê bikirana. Bi ser de jî ew rojnameyan wendabûne, û nakevin destên nifşê hemdem, ku mirov çavên xwe li wan bigerîne, ka ewana bala xwe didan wêje û rexneya wêjeyî, yan na.

( Rexne ) ya kurdî di warê wêje de bikara tê, mebest jê ew e, ku berhema wêjeyî ji her du aliyên wê ve; durv û naverok, gengeşe bike, warên serkevtî û yên neserkevtî yên wê berhemê diyar bike, jihev veqetîne, û biryara xwe di vê tengê de bide,bê ku nîr û rewşên civakî, wêjeyî û rewşenbîrî yên dem û çerxa wê berhemê ji bîra bike.

Dêmek karê û barê rexneya wêjeyî ew e, ku berhemên wêjeyî, wêneyên wêjeyî, celebên wêje, li ber siha rêbazên curbecur û li gor têgehên jiyana wêjeyî, civakî, rewşenbîrî, polîtîkî û dîrokî ya her çerxekê bixwîne, û wan berheman ji her du warên ramanî û hunerî de binerxîne.

Her weha xuya dibe, ku rêbazên rexnê ji bo ristina lêkolîna rexneyî gelek giring in, ji ber ku ewana yekemîn alava xwedî karînên kêrhatîn e di vê meydanê de. Ji ber vê giringiyê jî rexnevan nikare wan rêbazan bi paş pişta xwe de bavêje, belê ew her tim hewcedarê rêbazekê an jî pira ye, da lêkolîna wî neşimitê û ji rê bi dernekeve. Vê lomê Stanlî Haymin weha diçe, ku rexnevanên hemdem bi xêra rêbazên xwe ji yên berê serkevtîtir in.

Rêbaz, bi wateya zimanewanî, ji peyva (rê) hatiye, rê jî ew şûna ye, ku mirov tê re ber bi mebesta xwe de diçe, lê rêbaz, wek têgehekê an wek têrmekê, wateya ristina gengeşekirina mijarekê dide.

**KURTEBÊJE**

amd : Amadekar

B : Berg

Ç : Çap

H.r : Heman rûpel

J : Jimar

C : Cild

Ko : Kovar

R : Rûper

T : Tercume

Wer : Werger

Weş : Weşanxane

P : Pişt le newa û rû le kirrêwe

H : Hespim hewre û rikêfim çiya

d.n. : dîwanî nali

d.h. : dîwanî hemdî

d.c. : dîwanî cizîrî

d.e.x. : dîwanî ehmedî xanî (memê alan)

## 1.PÊNASE Û ÇEMKA REXNE

### 1.1.Rexne

Eger em li dor rexne (Critique)î, bi axivîn gereke behsê dîroka edebiyet bikin, ji berkû destpêka rexne grêday ye bi peyda bûna êkemîn têkista edebî. Rexne ya berayî dûr nebwiye ji hest û sozên merv û bend û grêdayî bu bi bûyer û rûdanên xweş û nexweş, yên wî demî evejî bu ye egera hindê kû rexnevan rexneya ji wan mijaran yên kû nivîskar bîr u hizirên xwe behis kiriye û gotye. Dikarîn bêjin, rexne li paşî vekolînên edebiyet bi danan û afrandna dûyem, tê sbandinê, anko piştî (têkista yekem) li dem û şûna diyarîkrî têt. Eve jî bi sanahî cihê xwe li nav tiyora edebiyet vedikit( *hemî bizavên kelturî grêdayîne bi dem û çaxên civakî û jiyarî , herwiha her bizavek li tiyora edebiyetê da ewjî bi vê awayî bend û grêdaye bi rewşa dîrokî û edebî, kû bune binge û serokanî bu bi dest anîna bîr u hiziran*)[1] Peyva rexne beramber û hemberî krîtîk (kritike) ka grîkiye, kûev peyve ramana (*şrovekirin, nirxandin*)[2] didet bi sanahî rexne nahêt berniyaskrin an niyasîn, ji berku s– çimkî- rexne di çar çova zansit û zanîneka azad tê serederî kirin, gelek kesan bizava hindê kiriye, daku rexne bidin niyasîn, lê belê rexne bi wê hindê razî nabit kû bihayê wî bêt kêmkirin û di çar çoveka teng dabit, belkû gereke dibiyav û mesaheka berifreh dabit.

Di heman demda, hindek nivîskar û helbestvan û rexnevanên cîhanî karîne, bi awayekî baş li prosesa rexnekirin têbgehin, dikarîn bêjîn, kû ewan bi temamî rexne naskiriye. li pertûka (*firhing û tewsiyfî û êtlahatê edebî*) bi vî awaiyî behsê rexneya kiriye û têda hatiye: (*rexne an hurtir rexna edebî, zarav an îdiyemeke tê bikaranîn bu wan lêkolînan kû mijarên wan, niyasîn, şrovekirin, ravekirin, û helsengandina berhemên edebiyete*)[3] rast û rast rexne ji bu wan vekolînan hatiye danîn, yên mijarên wan nizîk û grêdaiyne bi niyasîn û şrovekirina her têksit û ravekirina wan ve hebit, belê ji bu vî niyasînê dikarîn bêjin, ev berniyaskirinepitir erk û rolê rexne berçavkiriye, ev rolejî li çarçova serederî kirine digel berhemên edebî.

Li ser mijara rexne, helbestvan û rexnevanê îngilîzî (Matthew Arnold 1822- 1888) dibêjit: (rexna edebî bizaveke dûre ji her merem û armancên taybetî, ji boy ku tiştekî baş û spehî hatbite *hizra merevî, bête niyasîn û berçavkirin û di heman demda pêşbikevit*)[4] helbestvanê îngilîzî li dûr mijara rexneye daxivit û xuya dikit ku rexne li dem û çaxê wî da

[1] D. Şûkrî azîz el mazî,*fî nezeriyetil edeb*, dar neîir el mûeseset el erebî lildirasat, libnan, 2013, r:13.
[2] D. Sûhêr el qelmawî, *mihazerat fî neqid el edebî*, dar el marifa, qahîre, 1959, r:10.
[3] M.Ç.ebramiz, *ferheng tewsîfî û îstîlahat î edebî*, t. s'ed sebiziyan, întîşarat rahinma, tehran, 1384, r:66.
[4] D.Ebdel hûseiyn zirîn kûb ,*aşnaiyî ba neqid edebî*, întîşarat sexin, tehran, 1387, r:21.

riha xwe ya drûst dît, ewjî ewe ku armanca rexne ewe ku berhem û têkista edebiyet bêt niyasîn û pêşbkevit. wekî tê zanîn dû corên rexne heye: yaêkem ewe, ku li ser riha raste , eveqazancî ji bunivîskar û civakî heye, lê belê corê duwê yê rexne riha rast negirtiye, belkî pitir bu şkandin û kêmkirina bihayê berhema edebiyete, ev terzê rexne mifa û qazanc bu pirosêsa edebî û civakî nabit.

### 1.2.Rexne ya civakî

Êke ji cor û rêbazên rexne, ku divêt civak edebiyet hevbendî êk biket û pêkve grêbdet. Bi awayekî din armanca rexne ya civakî, ewe têksit û mijarên edebî bi civakî bend û girê bidin. Dibit bzanîn kuew kesên bi hizir û nerînên civakî vekolîna edebî dixebtin û kardikin, tinê behsî bandor û rengvedana têksitên edebî nakin li ser civakî, belkî vekolînê li ser war wi jîngeha edebiyet dikin, ew jî bi (*armanca eşkrekirin û berçavkirina wan mijarên civakî ku li nav wî têkist da tê dîtin. Herwiha da bizanîn ew nivîskar ji çi çîn û texê civakiye û rewşa abûriya jiyana wî çawa buiye. Karye çi qas berisva daxazyên texyên civaka xwe bidit, aya ev rewşe li têkista wî tê dîtin û berçave*)[5].

Bi vê awayî bu me xuye ya dibit ku rexne ya civakî, tinê êk araste û alî nîne, belkî diçend alyan dixebtit, mîna jîna nivîskarî û rewşa jîna abûrî û şunda asta civaka wî , jiber ku nivîskar êke ji endamên civakî, herwiha bandora rewşa saykolojî û keltûrî û adetên civakî li ser wî heye, çimkî ew li nav vî jîngehî dijit.Jiber vê çendê gereke van tiştan danîn ber çavên xwe. dema nivîskar bandora civakî li ser bit, tiştekî normale ku berhema wî grêdayî civakî bit, şunda risim û wêneya wan mijaran dikêşît û behis diket yên ku dinav civakê da dibînit, ji berko (*edebiyet berhemeka civakiye, nivîskar ji dinav civakê da peydabuiye û mezin buiye*)[6]. Ji alyekê din ve, nivîskar bidrustahî berhemên wî kamil û temam nabin ji rûiyê civakî ve, an nivîskar ji alyê civakê ve bandora rewşa civakî li sere, lê belê kêmukasiya vê corê rexneewe ku (*helbestvan û nivîskar hindek caran, rewşa civaka xwe pişt guhê xwe dihavêjit û beruvajî daxaziyên civakê, keder u kulên xwe behis dikit*)[7].

An nivîskar û an helbestvan, ji ber xem û kederên xwe xema civakê ji bîrkirye, eve ji buiye sedema hindê ev terzê edebî(edebiyet bûcivakê) armanca nivîskarê nîşandan û berçavkirina bîru hizirên gemar û kîne yên li nav civakê da hene, di şunda dixebtit ji bu

---

[5] Riniye wîlk û eustn warn, *nezeriyetil edeb*, tercwme:miheadîn sûbhî, d.hîsam el xetîb, teb'eya:3, dar neîir el mûeseset el erebî lildirasat, beiyrût, 1987, r:99.

[6] D.Ûmer muhemed talîb, *el mezahîb neqdiye*(dîrase u tetbîq), dar el kutub lil tiba'e u lil neîir, el musil, 1993, r:173

[7] D. Hîmdadî hûseiyn, *derwazeiyek bo rexne î edebî kurdî*, çap..xanî, dihok, çapî ekem, 2007, r:16

guhrîna wan hizirên paşketî, lê heke em li alyekî din ve rexne ya civakî mêze bikin, bu me dibit ku rexne yacivakî (*li dûr mêzekirina civakî vekolînê li ser edebiyet dikit, li gor her sê binaxên edebiyet, ku pêkhatiye ji nivîskar ji alyê kar û kesaiyetiya wî, yadin têkista edebî ji alî ew mijaran weşan dike ber çavan, herwiha ya siyê civake li gorî çewanya wergirtina berhemên edebî*)[8]. Rexne ya civakî wî demî bitemamî armanca dînte cihe, dema dikarît van sê tuxim û binaxên edebiyet (nivîskar, têksit, xundevan) tevlî hev biket, eve ji dibite egera hindê têgehiştneka dirûst li navbera wanda çê bibit, an nivîskar ji riyalîzim û rewşa civakê xwe, nivîsîna xwe dinvîsît(têksit danan), ji hember vê da xundevan dibite (wergir)ê têksitî bi vê terh û awayî edeb dinav civakê da bi erk û karê xwe radibit.

Li vir pirsek têt beramber me û peiyda dibit, gelo armanca rexne ya civakî çiye? bu berisva vê pirsiyarê" klod doşiye" dibêjit: (*rexne ya civakî armanca têkista edebiyete, eve ew derazînke ku rexne dikarit li riha wî ve mor û sîmaiya têksitî nîşan bidit*)[9]. rastî civakî vedguhêzite nav têkista edebî, ewji rewşa aburî û bandorên pozitîv û negetîv yên ser civakî, herwiha laiyenên keltûrî û dîrokî û saiykolociya civakî bi dristahî diçite nav têksit û berhemên edebî.

Dikarîn bipirsîn, gelo rexne ya civakî çi daxazyekî jinivîskar û helbestvanan dikit? li dor berisva vê pirsê dibêjin: (*rexne ya civakî daxaz ji nivîskarî dikit ku bi dirustahî rewşa civakî ji hemû alyan ve berçav bikit û bibitnûnera dem û çaxê civaka xwe bi temamî*)[10]. rexne ya civakî bi armanca hindê kar û bizav dikit, da bêjit nivîskar an helbestvanê , dibit têksit li gor pêtiviyên civakî bit, hun raber û serkêşa bîru hizirên nû û kiryarên baş û dirust bin bucivakê. dibit nivîsîn an têksit li gorî hişiyarya civakê bin û bibin hevêna dahênan(jenîna nûiy) û pêgehandina hizirên îstatîkî, da herdem tiştên rend û can bibit, heya gehiştin bi civakeka aiydyal û mînek bit.

Rexne ya civakî wî demê temam û cantir derdikevit dema ku tevaiya asteng û buiyerên civakê têda bête dîtin, li wî çaxê ku têdaiye, bibit nimuneyeka baş û pêşengu bibit egera çarekirina asteng û arîşan û bi can û ruheka hevdem berisva hemî pirsên wî çaxêbideteve(*eger karê rexne û vekolînan rûiyê wan li dîroka kevin bû, wî demî dibit mijara dîrokî, lê heker ruiyê wî li çaxê nûiy bit , wî demî dikarîn bi rexne ya civakî navdêr*

---

[8] Said yasîn, *tehlîl ectîma'eî lil edeb,* dar 'eiyn lil naşir, teb'eya:3, el qahîre, 2007, r:8
[9] *Mecmû'e min katib,* tercume: d.rezuan zaza û d. El munsîf el şinufî, medxel ela menahîc el neqid el edebî, sîlsîle 'ealim el m'erîfe(221),el kiueiyt, 1997, r:135.
[10] D. hûriye muhemed hemu, *hereke el neqid el mesrehî fî suriye(1967-1988)dîrase,* min menşûrat îtîhad el kîtab ereb, 1988, r:164.

*bikin*)[11].ji alî dîrokî ve her berhemeka rexneyî an vekolîn bi tinê behsî mijarên dîrokî naket, eve ew berhem diçite nav çarçuva rexne ya çvakî, belê heker araste û ruiyê nvîsînê li dîroka kevin bû, ew mijar dibite rexne ya dîrokî, vêca heker behsî civaka çaxên berê bikit.

Çimkî rexne ya dîrokî niha u demê nû pêve diyar dibit, an jibu başkirina tiştekî bit ku alyê duwê (nivîskar, civak) hest bi wê çendê nekribit, li demê têt bikarin li dûr vê mjiarê bi axvin û pêngava baş bihavêjin. ev terhê rexne î pirosêseka berdewam û bê vebre, herwiha çinivîskarancivak berdewam pêtivî bi nûiybûneve heye, wî demê ku nivîskar binvîsît û civakji bibecivakeka zindî.

**1.3.Rexne û afirandin**

Rexne û afirandin( dahênan), dû tiştên nêzîk hevin, gelek cara têkelî êk dibin, dikarîn bêjîn, sinûr û txuba afirandin li têkista rexne yê diyar dibit, anko rendî û spehiya têksitî nîşan didit û dihête nasîn(*rendî û balkêşiya têksitî wiha diyar dibit, kû çi qas ew berhem û têkista edebî an hunerî kariye bandorî li ser hoş û hizir û wijdana mervî hebit*)[12]. an jî pîvana nasîna caniya têksitî ewe dihête zanîn çawa ew têksit bandorî dikete ser bîr û hizir û wijdana civakî. nivîsîneka rind, hevbendî digel civakî dikit, armanc ewe ji bu başî û drustiya civakî bit. Dikarîn bu her têkistekî bêjîn (*rendî û spehî sîmayek nîne ji xwediyê wan bi xwe, belkî li hizira wan mervye yên, ku mêzedikin û têradmînin*)[13].

Ji buhindê dibêjîn, rendiya têksitê ne tinê rûiyê derveye, belku bende bi naverok û hizira wî kesî yê wî têksitî dixunit.

Erk û rola rexneewe ku têkistan keşf bikit û nîşan bidit, li şunda vekolîn û ravey bu bikit. Li ser meseleya rexnevanji, dibêjîn(*merem û armanca rexnevanê bicih înana tiştekî nû nîne, belkî têkistekî rave û şrove bikit*)[14]. li vir dibêjîn karê rexnevanê digel têkista êkeme ku (afirandinê) ye.Ew wî têksitî rave bikit, belê raveiyeka nû û dirust, ku hêijay wî têksitî bit. hinek cara rexnevan dema rexne li têkistekî digre, ew rexne dibit sedem û egera cantirkirin û bihadarkirnia têksitî, çimku kêmin u kasên têksit an helbestê dide berçav, ev karejî pitir têksitî yan helbestî bihadar diket. dibit rexnevan mervekî xwede şiyan û ezmûn bit (*her çi qas ezmûna afrandina edebî ji bu vekolerî balkêş û bimefaiye, belê karê wî cudaiye, heker wî bivêt karê wî di çarçoveiya zanîn da bit, wî demî ezmûna xwe bi*

---

[11] D. Silah fezil, *menahic el neqid el mi'easir*, mîrît lil neşir û lil m'elumat, teb'eya:1, el qahîre, 2002, r:37.
[12] Amanc usman hemed, saîkolociyet î deqî edebî, ko. raman, j.20, r:25.
[13] D.Ûmer muhemed talîb, *el mezahîb neqdiye(dîrase u tetbîq)*, dar el kutub lil tiba'e u lil neîir, el musil, 1993, r:8.
[14] D.Ebdel hûseiyn zirîn kûb ,*aşnaiyî ba neqid edebî*, întîşarat sexin, tehran, 1387, r:41.

*zimanekî locîkî bêje, herwiha formeka mukim û hêja bide*)[15]. bi ramanek din dibit vekoler hevbendiyeka mukim û bihêz li nêvbera serburd u ezmûna xwe û rendiya têksitî û derbirîna têksitî çê bikit, nabit ew vekolîn bi awayekî blez û serpêkî bit nvîsandin, belkî dibit sînûra wî vekolînî bgehînte astekê blind û ezmûneka mezin û afrandin bi sîmaiya wî vekolînê ve diyar bit.

Bi awayekî giştik ew tişte em li ser diaxvîn diçe çarçova huner (*armanca huner mîna armanca akar û exlaqê ye, an ji wek hevî li nêvbera karê baş û têkisteka rend*)[16]. li navbera huner û exlaq tinê êk armanc heye ew jî wek heviye ku li navbera têkista rend û karê rast û baş e, dikarîn hevbendî bikin, li navbera têkista rend û karê rast û baş, ewjî nivîskar têkistekî dibeje, vekoler jî ji alyê xwe wî têksitî rave û şirove dike, daku bibe berhemekî baş û rend, li ser têkisteka balkêş. sarter dibêje: berhem û karê afirandin wî çaxê chê xwe digre û didume, dema nehêt ji bîrkirin(*karê afirandinû hunerî tinê li riha xundenê temam û kamil dibit*)[17]. Ji berku- çimkî- eger her têksit û berhemekî edebî û hunerî nehêt xandin û nebite mijara nivîskar û vekoleran, ew têksit bê bihaiye û wî bi têkisteka mirî dihêt hisabkirin. Gelek bîru hizir û nêrîn li dor proseiya edebiyet hene, dikarîn nasînaka kurt û kind bikeiyn û bibêjîn(*lipêşî da dikarîn bêjîn têksit berhemekî huneriye, têksit û berhemek weku mervekî hunermend înaiye bûnê û afirandinê*)[18]. dema behisê edebiyet tê kirin, bêjîntêkista edebî berhemeka huneriye ku dahênan û afirandinbîru hizirên hunermend û nivîskarekiye. an jî texa hunermend û helbestvan û nivîskaran ku dikarin tiştek nû bafrînin û binvîsn û dikene diyarî bu gel û civakê xwe. dikarîn bêjîn rexna edebî (*bizav kiriye û xebtiye bigehte peyiskeka blind ta bikarît têksitên edebî rave biket.... Rexne dixazît xundina têksitî bit û herwiha li heman demda nvîsînekî nû û blind bit*)[19]. Dema rexne xundineka rastî û riyalîzmî bu mijar û têkistekî diket, ku di çarçova mukim û zimanekî locîkî bit, wî demê rexne karê xwe bi cih anî ye û dikarit bibit terh an terzek ji afirandin û dahênan (*rexna edebî karu bizaveka jenîna nû ye, hinek carajî rexnevan, bi qasî xudiyê berhem û têksitî, xudî zewq û selîqe û dest rengîniye*)[20]. Kar û xebata rexne ya edebî di çarçova jenîna nûy, ji berku rexnevan mîna nivîskarî, xudan soz û dahênane. Bu nimûne xundevan dema şî'ri û helbesteka klasîkî dixwene û baş tênagehit, wî demî hez diket rave û şrovekirina wî helbestê bixinitve, da pitir li helbestî bigehît, hinek caran ew rave li ba wî balkêş tire.Li vir

---

[15] Riniye wîlk û eustn warn, *nezeriyetil edeb*, t. ziya mûehîd û perwêz mûhacîr, întîşarat ‘elmî û ferhengî, tehran, 1382, r:3.

[16] Amanc usman hemed, *saîkolociyet î deqî edebî*, ko. raman, J.20, r:26.


[17] Can bul sarter, *mel edeb*? , t. d. Muhemed huneiymî hîlal, dar el nehze misr lil teb’e û neşir, qahîre, r:53.

[18] Wiliyam c. grîs, *edebiyat û baztab an*, tercume: behruz ereb defterî, r:86.

[19] Ş’eban ş’eban ehmed, *kurte pênaseiyek bo cîhanî firawanî rexne î nû ê*, ko. raman, j.(50) , r:72.

[20] D.Sîrûs şîsima, *întîşarat firdus*, tehran, 1381, r:23.

dikarîn bêjîn rexne û nvîsîna bihadar mîna heviyekin û pêkve ne, hinek caran dibin êk, heya qasî êkgirtin, heke têksit nebit rexne jî nabit, û prosêsa dahênan û jenîna nû çênabit û drust nabit. eve nexşeiya rexne û dahênanêiye




**1.4.Helbestvan mîna Rexnevan**

Dema behsa helbestvan û rexnevanê têkirin, an jî em behsa dû bingehên edebiyet bikin, kêm cara ev dû sîma û navdêre pêkve li mervekî da hene. rol û erkê helbestvanê nîşandana rendiye, lê belêdema ew canî û rendî tê xirapkirin, wî demî çîçeka helbest û rexne li bal helbestvanê dibişkivin. helbestvan mîna endamekî civakê ye pitir hest bi bûiyerên diket, rendtir wan mijaran didete berçavan, peyama xwe bi riha helbestan dgehinit, bi vî rengî rexne têkelî helbestê dibit. civakinas "'elî werdî" li dor helbestvan û nivîskarî dibêje: (*ew her tim rexne li heqîqet û rastya civakê digirin, ku bineche û qaîm û rehaye û nahêlit civak drewşa tenahîda, ber bi guhrîn û pîşketnê biçit*)[21]. Helbestvan annivîskar têt rexneya li wan mijaran digre yêt ku bi awayekî di nav civakêda hene û dibine sitrî û kelem di riha pêşveçûnê û guhrînê, ev bîruhizirên şaş dinav tim hene. Vêca helbestvan annivîskar diçe alyên dijî van hizirane û dixebtit ji bu nehêlana van hizirên şaş û xerab. bizavên xwe didomîne ji bu kêmkirin û jinavbirina van bîru hizirên di paşîda û di paşerojêda. ziman çekê helbestvan û rexnevanê ye, eger helbestvan bixazit guhrînê çêbiket, dibit xwe rend û balkêş bit û bîruhizirên xwe bi awayekî rend u bi başî berçav bike(*herkes û mervek dikarî di riha zimaneka paqij û balkêş berevanî ji bîru hizirên xwe bikit, herwiha berevanî ji wan tişta biket ku li jem wî rastî û heqîqetin, her di riha ziman û şiyana axaftinê merv dikarî li heqîqetê afirandin bike*)[22]. anko ziman û delîve û rêkeke, helbestvan dikarît bîr u hizirên xwe bigehînte civakî û berevanî ji tiştên rend û bihadarên civakê biket û pişkdarbit ji drustkirina heq û rastî.

Xuye ya ku ew têkista helbestvan dinvîsît sanae nîne, çimkî helbestvan bîr u hizirêt xwe ên taybet o yên civakê têkel êk diket. Û hinek mijarên nepenî û veşartî di têksitî da hene, merv

[21] Raber tel'et, pêgeiy '*eqil û sefsete lay 'eli werdî*, dezgay aras, çapa ekem, hewlêr, 2008, r:45.
[22] Raber tel'et, pêgeiy '*eqil û sefsete lay 'eli werdî*, dezgay aras, çap ekem, hewlêr, 2008, r:35.

hinek caran hest bi wan tiştan diket (*xuiya ye ku  têksit xudyê merem û remzekî ye*)[23], têkista helbesteka balkêş, pir e ji raz û nihênyan, herwiha kod û sîmbulên şi'rî têda hene. helbestvan têkisteka wesa di afrînît ku bi sanahî tê negehîn, belkî me pêtvî bi şehrezayî û rewşinbîriyeka biyavên fikrî hebit. li dor rolê ziman, helbestvanê îngilîzî "şîllî" dibêje: (*helbestvan hevbendyeka  bi hêz digel ziman heye ew dikarît zmanê nû biketeve, peyv bûneka dinyaya helbestan, o hozan û helbestan bi zindî dibe*)[24]. helbestvan û ziman hevbendin, helbestvan nahêle ziman bimre, hertim xebetê diket da zimanê bi awayekî zindî bihêlîteve jiyanek nû bidete zmanê. Ew peyvên kevnin û bi karnahên, helbestvan bi terzek nû canî didete wan, bi vî awayî ziman ji neman û mirdnê rizgar biket, herwiha guhrîneka baş dikefte nav zimanê, ev proseye bi sura jiyana zimanê tê nav kirin.Bi nêrîna şîllî: (*helbestvan yasa û qanûnan dadnit, ew binyatnerên civakê û efrênerêt jîrî ne. Xulqênerên hunerên jiyanê ne, mamostaiyê rastiyêne ji boy nizîk bûna rastyan*)[25]. bi hizira wî helbestvan, yasay bu jiyanê zimanê dadnin,  bîr u hizirên helbestvanê dibit e biniyat û bingeheka civakî û tiştên rendên jiyanê, ew xudyê hizireka pêşkeftî ne ji boy gel û mîllet. Li paşîda helbestvan mîna mamostayekî amajey bi rendî û rastyên jiyanê diket û berçav diket. Helbestvan yan nivîskar di riha rexne ya edebiyet ve (*bizavê diket bu bi dest înana berhemên edebî û hizirî, ji bu nîşandana riha blindkirna berhemên nvîsevana*)[26]. dumahî bizava nivîskar û helbestvanî ku bibit sekêş û raberê nivîskarên li paş wî tên, çimko helbestvan bizavê bu pêşve çûn û amadekirina biyavek berifre bu nivîskarên din û amadekarî bu blindkirina berhemên nivîskaran. hinek caran helbestvan bi terzek din erk û rolê rexne î bi cih dînît (*gelek caran helbestvan dibit rexnevanê helbestên xwe, nemaze helbestvanên xwedî ezmûn, herwiha dibin rexnevan li ser berhemên helbestvanên din*)[27]. bi cih înana vê rola gran sanahî nîne, o pêtvî bi bakgrawendeka ruşnibîrî û hizirî û ezmûneka mezn heye, lê belê hinek helbestvan divê bi ware da şehirezan, çimko ew bi xwe dinav vê bazn û çarçove ya ne û ne tiştek nû ji bu wan. destipêka bikaranîna peyva rexne li cem şa'ri û helbestvan  cizîrî  tê dîtin)[28].

[23] Rolan barit, *çêjî deq*, wergêran: îsma'el zari'eî, çap. minare, çap ekem, hewlêr, 2007, r:81.
[24] D. Hîmdadî hûseiyn, *derwazeiyek bo rexne î edebî kurdî*, çap. xanî, dihok, çap ekem, 2007, r:81.
[25] Çavkanî pêşî,r.60.
[26] Ebdul mecîd 'ebdul rehman, *rexne y 3 honrawe keiy himare ekî defterî kurdewarî*, ko.defterî kurdewarî, b. sêyem, çap. zehira, bexda, 1970, r:349.
[27] Muhdîn aware, *rexne î kurdî be çi aqarêk guzer dekat*, ko. nuserî nû ê, j.64, hewlêr, 2013, r:18.
[28] Sadiq behadîn, *dîwana melaiyê cizîrî*, çap. korî zaniyarî kurd, bexda, çapa ekê, 1977, r:78.

têtin ji nûrê wek reqî

bê 'eyb û neqê û rexneda (d. c. r.78)

Hestek nû di helbesta kurdî da serhilda, helbestvanan, mîna texek bi bizav derkevtin û peyamên xwe gehandin û behsek nû hate bûnê ew jî rexne ye, belkî di riha edebiyet û nvîsînda nivîskarek çê dibit, peyamek bu civakê hebit û civakê ji tarî û nezanî derbaz biket, ev helbestê blind ji bal ehmedê xanî çê bibû, dema rûyê xwe li civakê diket û dbêjît)[29].

ger dê hebuya mejî xudanek

'alî keremek letîfe danek

'îlm û huner û kemal û îz'an

şî'ri û xezel û kitab û dîwan. (d. e. x. r.25)

Rêknekeftin û nebûna wilat û serkirde, kar û bandorî di hemî biwarên jiyanê kirine, her bin destî buye sedem û egera drust bûna helbestvan û nivîskarên mezn. Bi ramanek din eger me xudanek hebuiye di kora helbest û nivîskaran de, dengê me da blind bit. Dema li cem nalî helbest û rexne bi hev dileiyizin, koşkeka helbestî berv bi asmanê blind dibit, dema dibêje)[30]:

kes be elfazm nelê xwe kurdîy ye xwe kirdye

herkesê nadan nebê xwey talîbî me'na deka (d. n. r.43)

Helbestvan bi zimanê xwe helbestan dinvîsî û rexne lê tête girtin, belê "nalî" bersiv ji bu hindê hebû û dbêjît, şî'ru helbestên min tijî dûrr û gewhern, binêrin mana û kodên helbestên min bi zelalî diyare. digel gohrîna zemen û deman, helbestvanan pitir hest bi hindê kir ku rexne di çarçova têkista helbestêda sanahî tir di bişkevin û civak berisva şa'rî dideteve, helbestvanên nû û hevçax jî rexnevan bûiyne.

Helbestvan (Ebdula Peşêw) di helbesta deselat dibêjit[31]:

qelemekem çekuçew

her peyvêkim bizmar

---

[29] Ehmedê xanî, *mem û zîn*, amd. heharî mûkiriyanî, çap. enstîtû î kurdî parîs, çap ekem, parîs, 1989,r:25.
[30] Marf xeznedar, *dîwanî nalî*, çap. hacî haşim, çap duyem, hewlêr, 2008, r:43
[31] Ebdulla peşêw, *hespim hewre û rikêfim çiya*, helbest, çap sêyem, kurdistan-hawlêr, 2008, r:210.

stem le her cêyek bê

deyismim wek textedar

Ramana helbestê:

qelema min çekuçe

peyvên min jî bizmar

zulm û zorî li her cihekî bit

dê simim mîna depê darî. (H. r.210)

Di her cih û warekî zulm zorî hebît, dengê azad tune ye, lê belê helbestvan dibêje nikarm zoriyê bibînim û bi helbestan berisva wan nedem û dijayetiya wan nekem. berdewamya rengvedana rexne li helbestan, wî nîşan didet, ku helbestvan nikare bê deng bit û helbesta xwe araste ya dewir u ber û civak û cîhanê dike. ebdula peşêw bi vê awayî behsê hinek helbestên xwe diket (*dema min pertuka xwe yê helbestan "firmêsk û zam= rondik û birîn"çapkir û weşand, zû min hest bi hindê kir ku xwezî min leze lez nekirba li weşandinê, hinek tişt ku ev dema lawînî diket, di paşida merv poşman dibit, eve bu min dersek lezê nekim ji weşandinê*)[32]. li vir "Peşêw" behsê ezmûna xwe diket dema êkem koma helbestên xwe li sala (1967) bi navê (rondik û birîn) weşand, dibêjît, min hest kir ku min leze lez kir, çimko ew helbest li gorî hêvî û daxazên min nebun, eve jî tişteka normale, li cem hinek helbestvanên din jî ev tişte hebûiye. Ezmunên berayî mîna ezmunên pişt hingî- şûnda- nîne, li ber ku roj bi roj bîr u hizirên nû li cem hozanvan û helbestvanî peiyda dibin. Sibe ji evro baştre, bi vê awaiyî helbestvan dereca bedewya helbestî blind diket. Tiştê girîng ewe ku helbestvan nabt lez û ecele biket, belkî mîna peiyisk û qaldirmê binêrîne helbestê. Bi karbit bi helbestekî an bi demekî kind tim derece û peiyiskan bibre. Belkî pêtvî bi dem heye, ew dem jî dê amade û berdest bit, eger bikarît ji alyê ruşnibîrî û kelturî ve pêşve biçit.

Peşêw dibêje: (*ez zaroka rondik û birîn û bitê şikandî bûm, her li tiştekî poşman bim eve mijara (ziman, ziman, ziman)e, hinek tişt pêtvî bû rontir û spehî tir bane*)[33]. destipêka peşêw dibwarê helbestîda bi (rondik û brîn- 1967) û (bta şkandî- 1968) weşandibû, dest pêkir, helbet helbestvan jwan dû dîwana poşîman nîyne û dbêjît heker rexney lê bigrimtinê

[32] Azad ‘ebdulwahîd, *diyalog*, b. sêyem, çap. şehab-hewler, çap yekem, hewler, 2013, r:328.
[33] Çavkanî pêşî, r:329.

mesela zimanî ye, anko ji alyê ziman ve helbestvan rexne î li berhemên xwe yên berayî digre û lezkirin bu weşandna wan êke ji şaşyên demê borî, dixezt hinek peyv rendtir û balkêş tir ban. helbest nivîsîn, ji ba hinek kesa sn'ete û ji ba hinek din îlhame li gor helbestên peşêw bizanîn ew çawa helbestan dinvîsît û dbêjit (*tu cara min helbest li gor plan nenvîsiye, çawa têt wesa dinvîsim, belê eger min nivîsî, gelek xebatî li ser zimanê dikim, eger serborya hinek helbestên xwe vegêrim, di mendehoş bin, ku hinek ji wan helbestan" 50" caran nvîsandibîteve, bi kurtahî hatna wan hiziran demek kinde, lê belê nijintin û danana wan helbestan demek zor dixaze û gereke*)[34]. helbest li ba "Peşêw" îlhame, digel hindê jî da, kar û xebateka zor divêt, xebatê digel zimanê diket û bi sanahî helbestan weşan naket, eve xuiya diket ku helbest ezmûn û kar û mandî bûnê divêt.

### 1.5.Hevbendiya helbestê bi civakê ve

Hevbendiyeka bi hêz li navbera helbest û civakê de heye, destipêka vî hevbendiyê dizivre bu dîroka kevnar û bi temamî diyar nîne, helbest berhem û xwezaya civakî ye, di nav civakî de serhildaiye, ji bir hindê helbest êke ji tuxmên dinya ya roşnibîriya civakê (*di çax û demekî de helbest rêk – rêç- kenalek bû , bu gehandna wan name û peyaman yên ku dibine sedema hişiyarkirina mîllet*)[35]. helbest di çaxên beray î de, rolek mezn dîtiye û leyistye, anko helbest, gelek rol hebuiye u bend buiye bi alyê roşnibîrî û rexne û civak û dîrok...anko dema helbestvanê xaztiye behsê buiyereka dîrokî biket, bi riha helbestê merema xwe gehandiye, herwiha bi riha helbestê behsê evîn û kul û keder û derdên civakê kiriye, behiskirina hinek mijarên din jî her bi riha helbestê bûiye. dikarîn bi pirsîn, gelo ji bu çi tinê helbest di biyav û meydanê de buiye, yan jî ji ber çi tinê helbestvan ev rol dîtiye û leyiztiye? di berisva vê pirsêda, dikarîn bêjîn, eger û sedem ewe ku helbest sanahiye û bi demekê kind merv dikare helbestê liber û hifiz ket, pitir li bîr u hizira merv ê dimîne û zû li bîra merv ê naçe. Helbest mîna sitran û lawk û heyranokan di hiş û hizirên merv dimînin û tên hifizkirin. Helbest mîna mijarekî kelepurî li bab û kalên me hatiye veguhaztin bu kur û neveiyan, eve buiye egera hindê ku helbest nemir bit û her û her bi zindî bimîne, dinav civak û xelkêda bimînit û bêtin xundinê.

Terhekê helbestê heye bi navê ( helbestê dastana) ku taiybete bi mijarên civakî û gel, dinasîna vê terhê helbest hatiye (*terheke ji hikayetên dirêj, xudanê wî nivîsînî diyar nîne û ne xuiyaye, wêne ên hestên biyanî di (nivîskar)î yan jî derveiy helbestvaniye, ku bi temamî*

[34] Çavkanî pêşî, r:335.
[35] 'Ebdulla xidr mewlud, *ew ş'eraneiy le dahênanêkiyan ziyatir têdaiye*, ko. zanko, b. 18, j.1, r:25.

*ji (got û bêj) diyar dikeve, ji ber hindê di çarçoveyeka gelek mezine, wêne û rismên kultur û jiyara (hemî aliyên bûn û jiyana) mîllî û gel têda hatiye nexşandin*)[36]. dikarîn bêjîn hemû ciuiyin û texên gel xwe dinav (helbestên dastana) dibînin, çimko ev terz û tehrê helbestê bi çi awaiyekî behsê helbestvanê nahê kirin, belkî tinê bi awaiyekî berifreh behsê jîna mîllet tê kirin (*bihaiya rendê û karên edebiyat, hind mezne, ji ber hindê kesaiyetiya helbestvanê winda dibe û nahî dîtin*)[37]. helbest bi awaiyekî mezn di mijar û tiştan dinêrît, bi çi awaiyekî behsa tiştên hûr û yên kesî nahê kirin. Belkî qewmîn û buiyerên gel û mîllet tê behis kirin, buiyerên kesî nahî behis kirin, gel dibit qihremanê helbestî, û zat û jiyana helbestvanê winda dibe, anko gereke helbest, armanc û tiştek têda hebit ji buiy mîllet, xuiya ye ku helbest van dibt dinav civaka xwe da vê karê biket. qewmiyn û buiyerên cor bi cor bandor li ser helbestvanê heye, berova jî hindê helbestvanê bandor li ser buiyeran nîne, herwek feiylesufê firansî (Nicolas Malebranche – 1638 - 1719) bu gehiştin bi heq û rastî, dibêje: (*livir helbestvan bandor li ser heye, anko war u jîngehî bandor li ser wî heye*)[38]. Her tim helbestvan di xema gel û mîlletê xwe daiye, erk û rolek giran li ser sito û milê helbestvaniye, hinek caran jî dibit arîşên mîllet. Lê belê her tim helbestvan, ji aliyê gel kar lê têkirin. Xala hevpişk li navbera helbesta helbestvanê û civaka wî, ew diyarde û mijarên nav civakê ne, yên baş û yên xerab û şaş. Eve dibine sedema hindê ku helbestvan bibut şemal û çira û ronahî bu civak î û riha tarî, ronahî biket, herwiha dibite pir ji boy gehiştin bi cihekî ewlehî û aram. Helbest gereke şaşyekî rast biketeve, peyamekî bigehînit, di xizmeta civakê bit, tiştekê vejenît û çê biket.

Bu vê meselê, "Dilzar"ê helbestvan dibêje:(*gereke helbest te'bîr ji tiştekî biket û bibit xudîk, bi dereca êk helbest rêçeke ji bu çêkirina hemî rewşekî, vêca ew rewş, siyasî bit, an civakî bit, an edebiyat bit, yan jî bizav bitin bu pêş veçuna jiyanê, baweriya min wesaiye ku helbest bu helbest, huner bu huner, tuneiye, eger helbest dixizmeta gel û civakê nebit, ew nehelbeste*)[39]. helbest dibit derman û çareser bit, axaftineka nerm û balkêş bit, xiwedê peiyam bit û armancekî bigehînit, ji aliyê civakê û siyasî û edebî ve, tiştekî nû pêngaveka nû bit. "refiq hîlmî" di kitêba (şî'ri û edebiyatî kurdî), dibêje: (*ne tinê bese em gil û gazande ji gelê xwe bikin, yan jî têbgehîn ku ew riha li ser di çît, riheka şaşe, û riha pêşkeftinê nîne, lê belê, gereke riha rast nîşanî wî bideiyn, herwiha riha rast û zelal xuiya bikin, di pêşiya*

---

[36] D. 'Ebdulla xidr mewlud, *janirekanî edeb*, ko. raman, j. 187, r:57.
[37] D. Muhsîn ehmed umer, *edeb û baiyografî*, ko. raman, j. 112, r:110.
[38] D. 'Ebdulla xidr mewlud,*janirekanî edeb*, ko. raman, j. 187, r:57.
[39] Azad 'ebdulwahîd, *diyalog*, b. sêyem, çap şehab-hewler, çapî yekem, hewler, 2013, r: 12.

*gel bi rêve biçin ew jî li duiy şopa me bên*)[40]. refîq hîlmî bi awayekî zelal û aşkire, axaftina xwe araste û ruy bi ruy helbestvanê diket û dibêjît, nabit bi tinê gleiyî ji gel û mîlletê bête kirin, belku gereke riha rast nîşan bide û di berawî de biçe, herwiha ji bu gel zelal bike ku eve riha rast û pêşkeftinê ye. Anko pêtvîye helbestvan bibit çira û raberê gel û mîllet, û nimuneye ka pozetîf bit, heya ku ev soz û hesterengvedet û bandor hebit, piştî hingê civak berev serkeftin û pêşkeftin biçe u pêngavan bihavêjît.

Bi awaiyek din dikarîn bêjin bîr u hizirên helbestvan dibin rêbaz û bîr u hizirên civakê, ji ber hindê texê helbestvanan, erk û rolek mezn li ser sito û mlê wane. her di çaxên kevnar de, îşaret bi hevbendiya edebiyet û civak hatiye kirin û hatiye nîşandan. (*Hevbendiya di navbera edebiyet û civakê, hevbendiyeka dû sere, dû alî ye, çimko civak ji alyekê ve, riha sanahî diket ji bu geryan li dû şert û mercên peiyda bûna pêk înana berhemên edebiyet, ji aliyekî din ve, amûr û rihekê ji bu helsengandin û bihadarkirin*)[41]. Civak roleka mezn dilîze bu dirust kirin û çêkirina, ew rewşa ku edebiyet bi gişkî û helbest bi taybetî pêtvî pê heye, ji aliyekî dibit egera dirust bûna wî û li aliyekî din puiyte û bihay bi helbestî didet. ev bîr u hizirên henê û ev rêbaze di kurdistanê jî peiyda bun. hinek helbestvan li kurdistanê hebûne, dibawerya wî de gereke helbest û edebiyet bi temamî dibit di xizmetkirina civakê bit, û helbest bibit mak û hêvêna serxwebûna wilat, evîna kanî û sîpel û çiya û dar û berdên wilat. Despêka ev rêbaza helbestê li dema helbestvanê mezn "Ehmedê xanî" serhildaiye û peiyda bûiye, di dawîda helbestvanên din xebat û bizav kriye, ku peiyamên mezn bigehîne gel, mîna (hacî qadrê koyî, qanî'e, hêmin, ciger xuiyn,...) paşî nû buna helbestê kurdî û guhirtnên cîhanî û diniya ya şî'ri û helbestan. Helbestvanên nûxaz ber bi wan bîr u hiziran pêngav havêtin, puiyte dan bi xelkî û harîkariya helbestvanî ji bu civakê û pişkdarî kirina. helbestvanê li bune û buiyer û merasîmên, nexweş û zehimet û dijwar yên gel û civakê, kar û rola serekî ya helbestvaniye.(*peşêw helbestî bu xelkî dinvîsît, çimko gotin û vegêrana her buiyerekî armancek heiye, helbestên wî ser bi rêbaza sîmbulîzme, ew cîhana ew dafrînt, li ple û dereca meznatiye buiyerî daiye*)[42]. araste û rûiya helbestên "Peşêw"î, ji bu civakê ye, her merem û armancek di helbestên wî da hebit, bu civakê ye, hêma û remiz (ceveng) di helbestên wî da xuiya û reçavin, eve jî ramana hindê didet ku armanca helbestvanê netinê helbeste, belkî armanca helbestê di hundirê helbestê deiye, lê belê bi ceveng û sîmbul hatiye behis kirin (*merc û şert nîne romantîk" romansiyet" di xudê helbestî de hebit, hinek caran di hevbendiye helbestvanye digel helbest*

---

[40] Refîq hîlmî, *ş'ir û edebiyatî kurdî*, b. duyem, metbe'e el te'lîm el'alî, erbîl, 1988, r:30.
[41] Silahedin hesen, *hewl tebî'e elfen û mulamehe electîma'iye*, mûcele el eqlam, 1976, r:58.
[42] Marif xeznedar, *bo biray berêz ebdulla peşêw*, ko. karwan, j. 168, r: 46.

*û xelkî, bi bawerya min xelk jî bi awaiyekî xerîz î û xuzayî li romantîk tê digehin*)[43]. "Peşêw" dibêjît: hinek caran ew romantîk diçit derveiy helbestê, herwiha ew hevbendiya li navbera helbestvan û helbest û xelkî da heiye û winda nabit û xuiya ye. (*Helbest muqif û helwêste li jiyan û bûn û cîhan û evînî, mak û gewhera hemî mijar û meseleyekî jî azadiya mervê ye*)[44]. Helwêsta helbestvanî li mijar û jîngeha merv li jiyan û evînî, xweşî, nexweşiyên gel, dibin hêvêna helbestê. Ev tişte jî hevbendin digel helbest û evînê û jiyan û bûn û 13emi hevbendiyên nav civakê berf neman û mirin diçin û wi namînin.

### 1.6.Jiyana abdullah Peşêwî[45]

Navê helbestvan peşêw (Ebdullla mela şêx Mhimd Umer bêrkotî)ye, bavê wî melayê gundê (Bêrkot) bû. Peşêw li sala (1946)ê li gundê (bêrkot) li parêzgeha (Hewlêr) hatiye dinya yê. Her zû li destipêkda naznavê "Peşêw" bu xwe helbijardiye. Peşêw dibêje diya min nexundewar bû lê belê geleg pend û metelok dizanin û ferhenga (Ehmedî) ya şêx marfê nodeiyî dizanî û ji berbû, ku piştî nimêja 'eşa (şevê), bi dengekî pirr grî, mîna du'ayan bi rîtim û awazekî rend hinek pend an hinek beiytên (Ehmedî) di goteve, bê ku ez hişyar bim ev gotin bandorî li ser min hebûiye. bi armanca xandinê peşêw çû şarê (Hewlêr)ê. Di despêkêda li dibistana (Xalîdiye ya seretayî) dest bi xandinê kir, wî demî divê dibistanêda xwendin bi zimanê 'erebî bû, li paşyêda xwendna navencî û amadeyî her li hewlêr temam kir, di sala (1968- 1969) birwanameya peymangeha mamostayan li hewlêrê bidestve îna. Piştî temam kir bi mamostayê seretayî li sala (1970) li gundê (Kendal) hat damezandin, paşî li gundê (Gelyawe) dibit wanebêj. Piştî borîna salekî vedguhêzn bu dibistana (Herdî) li hewlêrê, li paşda li dbistana (Ronahî) heta sala (1973) mamusta bû. Li dûmahîka salên (1973)an de, bi egera qbulnekirna syaseta rijêma 'êraqê û herwiha bi armanca bi destînana birwanama ekadîmî çû dervey wilat, çû îketiya sûfiyet. destipêka vehandin û nvîsîna helbestan li cem peşêw dizivrit bu sala (1961) ku cara êkê bû helbest nvîsî. Çê dibit wî demê helbest neweşand bit, piştî despêkirina şer li navbera hkumeta 'îraqê û şurşa kurd bi serkirdayetya mistefa barzanî li sala (1963)de li başurê kurdistanê, peşêw helbest li dûmahîk hijmara heftenameya (Hewlêr) weşand.

Êkemîn koma helbistan bi navê (Firmêsk û zam) li sala 1967 çapkir û weşand, herwiha li sala 1968 jî komeka helbestan bi navê (Bitî şikaw) weşand. Li paşda û piştî hingê li çendan fistivalên cuda cuda li (kerkuk, hewlêr, koiye) helbest xandibû, êk ji wan

---

[43] Azad 'ebdulwahîd, *diyalog*, bergî sêyem, çap şehab-hewler, çapî yekem, hewler, 2013, r:334.
[44] Çavkanî pêşî, r:332.
[45] Azad 'ebdulwahîd, *diyalog*, bergî sêyem, çapxane î şehab-hewler, çapî yekem, hewler, 2013, r:223.

xandna koma helbesta (Duazde wane bu zaroyan) bû, ku li êkemîn fîstivtala helbesta kurdî, ko li rojên (22-23) yê meha adara sala 1972 li şarê (Kerkuk)ê li dar xistbû, xwendibû,ev pêngave peşêw mîna helbestvanekî nûxaz linav edebiyeta kurdî hate nasîn. peşêw li êkemîn kongra êketya nivîskarên kurd ku li (23-24/6/1970) li bexdaiyê li darxisti bû bibû endam, herwiha li konferansa liqa hewlêr ya êketyan nivîskaran, li roja (15/1/1971) li darxistibû, xwe kandîd kirbû- berbijêr- kirbû, bu bidest înana dengekê zor buiye endama desteiya îdareiya liqa hewlêr ya îketya nivîskaran bi vê awayî delîve û firsetik din ji bu wî çê bû bu xizmetkirina karwana edebiyeta kurdî.

## 2.DIYARDEYÊN XRAB LI CIVAKÊ KURDÎ DE

### 2.1.Perçe perçebûn û hevirkya hevdû (yektir)

Êk ji dyarde wisloxên herî kirêt dinav civakî de, beş- beş û par- parbûn û pêknehatin û hevrikî ye, li demek zû şa'rên klasîk yên kurd, dermana ev derdê gran û dijwar daye nîşandan. Bi bawerî ya wan pêkhatin û tebabûn û serederî kirin, bi xala serkeftin tê hesbandin. dikarîn bo helbestvanê pêşeng di vê warî de her êk ji (Ehmedî xanî) û (Hacî qadrî koyî) dest nîşan bikin. helbesta nû canek daye vî mijarî, xuyaye ko pranya helbestvanan prosîsa hevrîkî dinav civakî de, bi tiştekî krêt û vehêt hesbandye. peşêw yê helbestvan, zêtir ji kesên din behsî vî dyarda kirye û protistokirye, ptir hevbêj"te'bîr"yên (hevrikî, nîştmana bext reş, nekbetî, brakujî, heya nîvya rêkê hatîn,....) eve û gelek din bi wêneya şî'rî arasteya civakî kiriye û civak haydar kiriye ji xrapî û şaşya djayetî û hevrikî, daye xuya kirin ku çareserya vê tiştî tnê êkbûn û êkgirtne, heker mîllet êk dest û êk qse û êk axivtin nebit, hingî armancên xwe bi sanahî bi dest ve naînit, herwesa şop û rêka serkeftinê kurtir dibit, hingî xebatek kêmtir gereke.

*Deryan kirdim.*

*Çunke şî'rim,*

*Mnallêkî çetûn asa,*

*Plûkeberdî hawêşte*

*Mallî şûşebendî gewran!*

*Deryan kirdim.*

*Çunke şî'rim hêllî bezand:*

*Le rûy gencîney dizrawa*

*Gllopêkî*

*De hezar volltî dagîrsand!* (P. r.307)

Helbestvanê aza û mêrxas xwedî peyame, û li tu bandor û karvedanekî natrisît, xwedî peyam guhê xwe nadete çi tiştekî ew bê perwa û bê mnete. Helbestên xwe bi çendan cor û rengan didete nasîn: helbest lehye, burkane, guleye, berde, diherfînt û vedjenît,....

Helbest bibte zarokekî bi bizav û çapuk û helgirê peyame, bi mala şuşe benda deselatdan hatye durpêçkrin, tû çare nîne, gereke wan şuşe benda bişkînîn, bla destipêk bi (ber)bit, ji kevinda kurdan gotye: ( Heker mala te li şuşey hatbîte çêkrin, berî nehavêje mala xelkî). êk ji mesic û peyamên helbestî bedewkirna dinya û jiyanê ye, dûrî tiştên xerîb û kêmasî ya me, xweşî bu tevaya, tenahî û aştî bu tevayan. Helbest sînur û hêlên sor nas naket, dixwazît li pişt wan hîl û sînuran tiştan eşkerebket, lêdana meslehet û berjewendya hinek kes û aliyan biket armanc.

*Ta nîwey rêga hatuyn*

*Ta nîwey rêga hatuyn bîr leçî dekenewe*

*Taze bo kwê .bo dwawe*

*De temaşay dwawe biken*

*Çi şureyek be hêskî şehîdan helçinrawe*

...

*Ha gulle. Lê î biprisn*

*Paş ewey agir dedrê*

*Qet awrr dedatewe*

.....

*Ha wuşe lê î biprisn katê ledem heldefrê*

*Qet awrr ledwawe dedatewe*

....

*Ha coge lê î biprisn*

*Ke berew çem rê heldebrrê*

*Qet awrr le dwawe dedatewe*

.....

*Ta nîwey rêga hatuyn*

*Bîr leçî dekenewe*

*Taze bo kwê? bo dwawe*

*De temaşay dwawe biken*

*Çi şureyek be hêskî şehîdan helçinrawe!!* (H. r.13)

Heya nîve ya rihê hatîn (Ta nîwey rêga hatûyin), helbesteke bi pirsekî dest pê diket, bê ku tû guhrîn têda bête kirin, her bi wî pirsî dumahî têt, ez vî tiştî bo tekezkirin, dûpatkirin û pê şdandin vedgerînim. Nîve ya rihê qedandî ye, ji niha pêve vegeryan û poşmanî bê wic û bê mifa ye. Êk awr tuvaya bîru hizirên vegeryan an westan dest lêberdan, vedrevînit, binêre:

*çi şûreyek be hêskî*

*şehîdan helêncrawe!*

Kesek heye xwe li ber vî sosret (Trajîdya)î bigrit, hizir an xeyalek bi 'eqlê wîda nehêt! Heke li vê meşa mezn û pîroz kesek an grupek tiştek bête nav dilê wan, wî demî helbestvan sê nimunên locîkî û bedew tomarkiriye û berçav kiriye, ku tevaya gumanên lêvebûn nahêlit. Daxwazî ji me diket li ( gule, peyv, cok)an, pris bikin: dema gule li lûley tête der, dikarîn vegerînîn, dema peyv li ser herdû lêvan bête derve û bifrit, dikarîn awrê bdeyn! Dema av jor da têt bu çem û cokan ew jî nikarît bo piştve awrê bidet. ev her sêke nikarn li şopa xwe poşman bibin!

xew

*şew le xewma*

*Aramgey hacî dîtewe*

*Çokim dada,sujdem bird boy*

*Gutim hacî , perêşanîn !*

*Serî kiz kird*

*Destî dana ser dllî xwey*

*Gutî merd be , zîndûm kewe*

*Gutim gewrem*

*Min 'îsa nîm*

*Çon zîndût kemewe , bêje*

*Gutî " lêre derm bêne*

*Dûberekî*

*Le şwênekey min bnêje* (H. r.126)

Hacî qadrî koyî, hizirvan û 'aşqê azadî û xweserya kurdistanê, fener û çrayê riha tarî ya mîlletê kurd, helbestvanê me turbeyan ev zatê pîroz di xewêda dît, bi rêz û bi rûmet serê xwe bu çemand (Tewand), perîşanya xwe û mîllet di gehîntê û haydar kir, ew jî dama û pey hindê daxwazî lê diket wî vejînt û zîndî biket, li nav gor û turebeya wî bînine derve û li wî cihê ev hevrikiye li nav kurdana heye, wî bin ax ket û veşêrît! ev para helbestî hevrikî (Dûberekî) hizir û helwêstên (Hacî qadrî koyî) tin tê bîra me, ku ji dil yek deng, yek reng û yek rîzê kurdan dixwest. Dema dibêjit: (Merd be zîndûm kewe) merema wî leş û can nebû! Belkî merema wî bîr u hizirên rast û drust yên wî bû li hember doza kurdî û paşe rojê.

*Şayî*

*Katê şayî dadebestîn*

*Yek çepkîn û dest ledestîn*

*Şilke bejn,ellqe ellqe*

*Epoll deden û şax deken*

*Şan debête dalldey şan û*

*Pê pêkewe rimbeyan dê û xak dax deken*

*Ey tênagem!*

*Bo ke şayîy serifrazî dadebestîn*

*Her çawêk û*

*Xemî somay xwey depêwê*

*Her destêk û*

*Dehollî xwey deengêwê*

*Her pêyek û*

*Nîştîmanî dête ber çaw be pêllawê*

*Her smêllêk*

*Fîr'ewnêkew*

*Le 'erşî xway kemtir nawê!* (H. r.317)

Govenda helbestî (Şayî şî'r) dû tabloyên li nav dû çemberan nîşan didet, tabloya êkê govend û şehyana zewcîna xurt û qîzekîye, lê tabloya duwê, govenda azadî ye! Helbestvanî bi dû hiziran dû wêneyên rengîn nîşan daye. Heker ew şehyan , şehyan û govenda zewcîn bit, ewyên govendê diken , pranya wan mîna êk kinc, û dersok û klav, rengê wan mîna hevin (ruxsar, çaw û biro û bizey lêwan), lvîna şan û pê û mlê wan, xwe çemandin û blindkirna pê yên wan û rîtma pêt wan, dema li 'erdî diden. Tevaya van lvîn û bizav û saloxe, yên êk kesî tê zanîn. şehyan û govenda azadyê, berova ji ya govenda êkemîne, livir her çav an dest an pê, tinê dxema xwedaye, haydarî wan kesan nîne yên ku li herdû alyan de pêkve destê wan dinav vê goveendê daye, her kes tinê haydarî xem û rewş û berjewendya xweye, her êk ji vane, xwe mîna (Fîr'ewn)î dibînit û li cem wî (Serê şahî jêve kiriye) ewê ew dixwazn, wek dibêjin: (Diqodîka tû 'etarekî de nîne)! Ev xrur û poz blindye, vî şehîdan û govendê biken sosret (Trajîdya) ne ser dyar bit ne bin!

Paşketin, nebuna azadî,xweserî û alaw..... Netîce û encama ev rewşa xrap û pir kêmasye.

*Ewey hewr peredekaw*

*Deytarênê*

*Qonax qonax, aqar aqar*

*Her xwemanîn*

*Ewey kewew kew rawdenê*

*Rewez rewez, znar znar*

*Her xwemanîn*

*Her tabûtêk boman dekrê*

*Textew çekuç mêx û bizmar: her xwemanîn*

*Her şarêkman dugmey yexey detrazênrê*

*Destedzu paşedzu*

*Heshesî şar: her xwemanîn*

*Leher baxêk girr leballî darêk berbê*

*Leher şaxêk*

*Taşe berdêk birrmête xwar: her xwemanîn*

*Her rojêkman*

*Her mangêkman*

*Her sallêkman helldewasrê*

*Sêdarew pet: her xwemanîn*

*Dû let bîn û*

*Çwar let bîn û*

*Hezar let bîn tîxî nefret: her xwemanîn*

*Pişt û qamçî, balldaru daw: her xwemanîn*

*Pê û berpêne, agru aw: her xwemanîn*

*Ba kes çîdî tif hellnawê bo ewaney mêjûy mirdûn*

*Bas kes çîdî sûç nexate*

*Estoy deryaw qîsmetî xwaw keç gerranî çerxî gerdûn*

*Gişt sehrakan.. Bnarêkyan pê nagîrê*

*Ême xweman lûtkekanman pêşkeşkirdûn* (H. r.339)

Jêderek bu dîrokê (Perawêzêk bo mêjû), helbesteke tijiye li wêne û tabloyên bi bizav û lvîn, heşt caran bi hevbêja (her xwemanîn= her emîn) despêkriye, peşêw gelek bi şehrezayî û zanayî û nêrîneka waq'î, behsê arîşe û pris grêkan diket, ku em wek kurd rol û dewrekî şaş nedrust dîtiye, bu çarekirina prisgirêk û alozyên rewşî, heker me ev rolê tijî arîşe û alozî me çêkirbin, wî demî tû çar nîne dibit tevaya netîce û encaman qebul bikin. tarînî hewr(dyarneman û çûna êkcarî ya 'evrî), girtna kewa, dep û çekuç, bizmar û tabut, jêkvebuna dugmên sîng û bera, ( gir û padiz, paş diz, heshes) agirgirtna darekî, kevrek hatexarê, ev bedbextî û xwelî serîye, jinav birna xwe û herusa xwe ku jî, li kurdan nabiryet û didome! Bêdengya mîlletê kurd bê hîkmet nîne. dema roj, hev û salên me bidarve diken û di helawîsn! Sêdarew werîs, sedem her em bxweyne, vêca gilî u gaznan ji kê bikin. helbestvan ture û xeydye û hawar diket û dibêjit, heker em dû beş-par- bîn, an çar an jî hizar, sedem û tîra nifrîna perçe perçe bûna me, her em bxweyne! Xirvekrin wrîzkirna van cimkane, çi ramanekî diden, ew wêne bi ronahya zêtir têne berçav (pişt û qamçî, frinde û daw "faq", pê û berpêne, agir û aw). dumahî tabloya helawîstî yê berçave, dibêjte me: çi dî tif nekene rûyê vane (Dîroka mirnê), vî glî neken wibla bes bît, ku sînura kurdistanê nekeftye ser deryay! An eve qismeta xudê ye, belkî çerxa felekê ji bo kurdan, ya keçe û bi xwarî dizivrît, tevaya byaban û sehrayan dormanorî me nikarn êk zinar û çyayekî bigrin! Eve em bxweyne serên çyaya pêşkeşî wan dikeyn û dikeyne dyarî bu wan!

*Topanê*

*Kurdistanim be gorrepan dête ber çaw*

*Serbexweyîş be topêkî baş fûdraw.*

*Lewetî heyn,*

*Rakerrake qedermane,*

*Çarenûse qet nesrewîn.*

*Top ball bigrê û*

*Êmeş belez wedûy kewîn!*

*Her carêkîş topekeman dête berpê,*

*Lêy debîne dujminêkî şêt û dilreq,*

*Heta hêzman leberdaye*

*Deydeyne ber pêleqe û şeq!* (H. r.341)

Ev Fotbole ya peşêwî cudaye ji tevaya sporên dinyayê, bla bizanîn çewa hatye damezrandin: meydan kurdistan, xweserî tope, kurd jî tîp û yarîzanin (Fotbolcî), demê ku kurd vî sporî diket û li dûy topî dikene xar û bez, dema digehte topî, mîna dujimnekî damarî û dil req serederî digelda diket, didete ber şeq û pênan û ji xwe dûr dêxit û nikarît golî biket. li vê tabloy da, dijayetî û berovajî têdaheye! Li nêvbera xweserî û gol kirin, bi encam gehandna, herdû halet û rewşan, şop û riha taybet hene, kirine xar û bez li dû topî û şut lêdana topî û dûrketna topî bi temamî dij û bervajî bi dest înana azadî û xweserî ye!

*Lem nîştmane çarerreşeda*

*Çîtan hêştuwe*

*Dabeşî neken wek rezî xwetan?*

*Her be şehîdan serman bllind bû,*

*Ewanîştan kird be pezî xwetan!*

* * *

*Nawêrm qellemêk hellgrim.*

*Nawêrm krasêk leber kem.*

*Rûtan reş bê!*

*Xwe rengekanîştan beş kird.*

*Bllêm: xwêndkar ya qutabî?*

*Jin ya afret?*

*Rûtan reş bê,*

*Ta wşey naw ferhengekanîştan beş kird!*

*Dû kenarî zêy cawîdanî -*

*Xanî û hacî qadirtan beş kird.*

*Xak û aw û agirtan beş kird.*

*Kwa? Çîtan hêşt?*

*Kwa? Kêtan hêşt?*

*Bigre ...*

*Qehpe û diz û rêgirtan beş kird.*

*Wek zirrtekî gakujbedest,*

*Nîştmanêktan kird be dû ...*

*Şar be şar, gund be gund gerran,*

*Le her mallêk*

*Agirdanêktan kird be dû!*

* * *

*Xellk mêjûyekî heye,*

*Ême dû mêjûman heye.*

*Hemû dinya*

*Yek serkirdey lê bellaye,*

*Ême lewîş dûman heye!* (H. r.414)

Li vê wilatê bext reş da, ev helbeste êke ji wan yê ku bu mîkrofon hatye nivîsîn, ne bu xwendna bê deng, ev parê helbestî ku hijmar (2) li ser hatye nvîsandin, behsî qonax û çaxekî gelek dijwar û zehmet û nexebtiye dîroka kurdan diket, peşêw waq'ekî bome ve dgêrit, ew buyer bi çavên xwe dîtîne, kul û derd û êş û xemên rojên reş ku têda jiya ye. bi peyv û hevbêj (te'bîr)a, wêne an bunyada wî helbestî kiriye, kesek nye hîvî xwezî bu wan dem û rojan bixwazt. Ev helbeste qewmîn û buyerên qonaxeka dîrokye, hinek berperên reş yên mîlletê kurd berçav diket, ku tevaya xelkî nifrînan li wan rojên reş dikin. pranya tiştan (mezn û biçîk), (baş , xrab) li nêvbera dû alî li kurdistanê bûye dû beş, anko li nêvbera xuda lêk vekiriye û beş kiriye, ew dem û roj tinê bazirganên ceng, ewên djî berjewendî û paşeroja gel û mîllet bûn, tinê wan mfa û qazanc kir, hêj brînên wan buyeran xwe negirtye

û çênebuyeve. peşêw helbestvan û hest û soz nask, haydarî tevaya tik tk û çirpe çirp û piste pista wane wtevaya karesat wbuyeran protisto diket û şerimzar diket, mîna kurdekî xudan peyam û dilsozî gelê xwe, dzanit çi pîlan dijî kurdan hene û brêveye. Ji ber hindê dikete qîrî û hawar diket û amaje bi wan şaşî û kêmu kasyên wan dem û çaxan daye, heya vî helbestî nexuynîn, bîr u hizirên peşêwî, rexne û glî û turebuna wî bome diyar û xuya nabit.

*Emro rojî şî'ri niye*

*Boye min botan dême go*

*Bezmanêkî êcgar sade*

*Ewey kurd bê û kurdê bikujê*

*Zolle,terese,gewade!* (H. r.426)

Peşêw basê rastyekî diket û dbêjit: evro dem û roja helbestî nîne! Dixwazît vê carê puytey bi helbestî nedet, wekî dema tê gotin: (Zor gotin quran xweşe) = (raman ewe anko bese ey qelem te pir drêj kir). Gelek bi sanahî, bi kurdî û bi kurtî, li ser perçeyekî me'denî , ev hinek peyv bêt neqşandin, da bi tû awayekî ev peyve winda nebit:

*ewey kurd bê û kurd bikujê*

*zole, terese, gewade*

*Li helbestekî din dibêje*

*Ke brakujêk debînim*

*Bawerrken rşanewem dê*

*Ta beyanî heda nadem*

*Daym emdîw ewdîw dekem*

*Sed qonaxîş dûr kewmewe*

*Bonî lakî makerêkî topîw dekem* (H. r.427)

Demek drêje ku brakujî li cem peşêwî bûye babet û mijaraek bu (Nifrîn) lê kirin û protisto kiriye û bizav kir bo nehêlana brakujî, paşeroj şahdî bu "Peşêw"î didet, wî gelek puyte û gringî bi vê tiştî daye û li ser nivîsiye û axivti ye, çi destê wî hatbit kiriye, mîna

hawarkirin, rexnekirin, hişyarkirin, glî, tan lêdan, di vî wêne yê da, tinê bi dîtna brakujî bzane çi hatye serê helbestvanî: vereşyan, nemana tenahî û aramî, nerazan, nenvistin, xwegevzandin, riha sed rojan dûr dikeve, bêna pîs û genî bêna laşê sketbûna makerekî, li hember dujmin ev tişt tê gotin. helbestvanê xudan prinsîb û bîr u hizir û peyama pîroza netewe, mêrxas û wêrek, hertim amadeye her kes û alyekî rû reş û protisto û şerimzar biket, heker şaşyan bikin û amajey bi kêmasî û xrapî yên wan dikit.

*Tênagem!!ger tifengêk*

*Hezar guley têdabê*

*Be dest kurdêkewe bê û*

*Rûy le kurdêk krabê*

*Çon dil î dê bîpêkê*

*Ba agrîş drabê!* (H. r.433)

Ev tabloye jî her ew prisgirêke, ku têkelî xuyna helbestvanî buye û binav tevaya ree û demarêt wî dgeryit, ew jî babet û mijara (Brakujî) ye! Bi bawerî wî gereke kurd çi car çek û sîlahî djî êk bikar neînin, çewa kurdek dikarît û dil didet guley bihawête brayê xwe! Dema helbestvan evîndarê gel û netewey bit, gereke rolê hişyarkirin û haydarkirna gel bibînit, çi car newestyêt û hertim bizavê biket bu bidestve înana berhemê bîr û hizir û nêrînên xwe.

*Destit birrzê*

*Çawt kwêr bê*

*Rêgey rastit kêwî qafî pirr helldîr bê*

*Hey krim le goştit bda*

*To ezanî ewey kuştit çî bû...kê bû?*

*Pêşmerge bû...*

*Pişt û pena tiwêşûy rê bû* (H. r.436)

Çend salekan berî peşêwî, helbestisvan "hemdî" bo kurdistanê gutbû:

*rebbî mûy lê bê zmanî pencekanî hellwerî*

*herkesê gullşen be derdî gullxenî dozex berê .* (d. h. r.115)

Ev beyta helbesta hemdî bi ser (9) beş û xana tercî' bend, nîştman dizivrit, hind blind û pir me'naye, mîna pend û meselên kurdî lêhatye, bi pend û gutna kevin yê kurdan tê şubandin: binêre du'a û nefrîna hemdî! Binêre rîtim û kêş û wêna wî! Helbestvanê mezn berhemên rind û balkêş dafirîne. peşêw di vê beşê de, behsî kurdan diket, nemaze pêşmerge, ku hêma û sîmbula azadî û mêrxasî ye.

Hemdî – xak

Peşêw – kurd.

Her dû helbestvan êk û dû temam diken, binêre ev du'a û nizaiya peşêwî : (destit birzê, cave te kor bit, rêgay rastit kêwî qafî pirr helldêr bê, krim le giştit bida, şêrpence be xwênt fêrbê). piştî van tûk û nifrînan li dujminî, bi qehremanê şerê brakujî dihesbînt, çimko kariye xuyna brayê xwe yê pêşmerge brêjit, ku şervane û berevanê kurdistanêye, dilsoza riha dûr û drêj bû, şerê pîs ya brakujî, rojek ji rojan dê vegerît, mervê normal li hember vî meseley rawestyaye winkarît çi biket, çi bêjit! Nemaze êkî mîna peşêwî xudan bîr u hizirên mezn ku haydarî gişk bizav û buyerane yên kirêt û şaş, ew wek helbestvan û hizirvan, brakujî protisto û şerimzar kiriye, ew di vê warî de paqij û pak bê minete.

*Negbetî berokî girtûyn*

*Lemlawe dê*

*Gêjellûkey lmî aran*

*Lewlawe dê*

*Terze û brûsik, befr û baran*

*Danewextêk barroveye Reşebaye*

*Danewextêk gerdawî terî deryaye;*

*Keçî êmey sirr heta nax*

*Êmey rûttir le tîşeşax*

*Xwênî yektir dexweynewe*

*Leser kurtî û drêjîy mûy kilkî wllax* (H. r.441)

Pamfilît: peyveka îngilîzye, têkisteka biçûk ya edebiyate, mijarek kirêt protisto û şerimzar diket, armanca vî têksitî civakî û siyasye. eve pamfilîta sêyem e, peşêw nivîsiye, wênên rengîn neqşandye, bi peyvên balkêş haydar nîne, encam bi karesatek satîr (galltecar= hinek bazî) dumahî têt, ev pare li (30/6/1987) li bajêrê terablus li wlatê lîbiya hatye nvîsandin, bu cara êkê li (13/4/1992) li parka gilkind li bajêrê hewlêr hatye xwendin. ev beşe, behsî trajdya û bext reşiya kurdan diket:

*negbetî berokî girtûyn!*

*lem lawe dê*

Bahoz û baroveya ax û baran li herêma aran (Devera germ) têt, terzeye (Gijloke) şrîxe û şirqijnî bruskeye (Şirqe şirqa brusyane), berf û barane, demekî baroveye, tuş hatna derd wbelayane, em wekî mriya bê hest û bê dengîn, me tû (bnema û pêkhatên mrov û mrovayetî nemaye û bê parîn ji vam bnemaya), em rût wpêxasîn, piştî van hemî karesat wdijwarî û nekbetyan, xuyna êk jî firkeyn, gelo ev belaye çi ye!: ( aya huştir be kunî derzî we deçê ya na), li hindê jî zêtir, Peşêw dibêjit: leser kûrit û drêjî mûy kilkî wllax!

### 2.2.Rewşa paşketna civak û êşa nezanîn û nexwendevanî

Pêşveçûna civakî pêtvî bi zanîn û çand û xwendin heye, bi awayek din ev tişte mak û canê pêşveçûna civakî ye. Tunebûna zanîn dinav her mîlletekî de, dibne egera hindê ku ew mîllet rastî gelek nexweşî û êş û derdan bibit. Bi armanca hebûna civakek zindî, gereke tev endamên civakî li derya zansit û zanînê vexwen, daku derbaz bibin. gehiştna civakê bi qonaxa pêşveçûnê, prosîseka dijwar û hêdî- hêdî û li ser xweye, prin ew kes û mrovên ciye û şopê wan di pêşvebirna civakî xuyaye û dyare, ew buyne rêber û pêşeng ji buy vî armanc, mîna (şkispîr li îngiltra, dantî elîgîrî li îtalya, firdrîk nîtşe li elmanya, puşkin li rusya, mhatma gandî li hînd). rol û bandora nvîskar û helbestvan û hinek rêberên din, buye sedema hindê ku xelk guhê xwe bdete şîretên wan. Civaka kurdî ji zû û ji destêk xrap bû, egera hindê xuya û zelale, mîna: cih û şûna cugrafî, nebûna wlatek xweser, bûna asteng û şerr û cengan, perçe-perçe(par-par) bûna wlat, nebuna zmanek standard. Eve bûye egera hindê ku edebiyet û çanda gel li ser pêt xwe rawestît, qalb û çar çovek xurt bi çand û ruşnibîrya gişkî bidet (*derkeftna nasnama neteweyî, mifa û qezenceka gelek zor bo doza*

*kurd dê hebît û mak wkaklê netewa kurd berv pêş dibet*)[46]. drustibûn û serhildana zimanek standard, dibit sedema hindê sebeb û hokarên bingehî li hember doza kurdî bi sanahî bibit û çarebit, herwesa cudayî nemînin. Xwendin û zanîn, rih û şopa pêşkefitna civakê ye, riha serkeftinêye li hember paşketna civakî, sedema serifrazî ye.

Eve zêtre ji sed salan li kurdistanê prosîsa xwendinê cihê xwe qaym kiriye, berî hingî rewşa xwendinê li kurdistanê nebaş bû. Giring û gereke ku em zanbin, ku mizgeft (Camî) rolek mezn leyistye ji bu blavkirina xwendin û zanînê. Li destipêkêda mizgeft rolê dibistanê dîtiye, û (Mela) jî rola mamostay dîtiye,( *mela an hinek caran dibêjnê mrovên olî li nîvya êkê ya çaxê nozdê li kurdistanê, xwendevanên serekî û bi rûmetbun, dema ders û xwendna mizgeft hinek caran demek baş ddome*)[47]. Li demê kevinda tinê mizgeft cihê blavkrin û weşandna xwendin û ruşnibîrî bûye, ku (Mela) jî rolek berçav û bi rûmet hebuye di vê warî de. Gereke em ji bîrnekin ku mizgeft rolek mezn leyistye ji bo çêkrin û amadekirina kesên zana û roşnibîr û hizirvan. Xebtin bi armanca nehêlan û ji navbirna nezanîn û nexwendevanî û rexnekirina sedema paşvemay ya civakî, nehêsaye û bizafek zehif xwaztye û gerek bûye, vêca ji boy bi dest înana vî armancî ked û karek baş hatye kirin. Hzirvan û rewşinbîr û mela û şa'îrên klasîk yên kurd bo vê meremê bzavek baş krîye, da mîlletê kurd ji nezanîn û paşketnê derbazbibt û serifraz bit. ev riha ta niha jî berdewame û didome û şa'îr û helbestvanên rêber, boyne rexnevan li hizirên paşketî û derd û êşa nezanîn û nexwendevanî.

*Kejawey giryan*

*Bram, şêrko!*

*Kejawekey giryanî to,*

*Wek ademzadî raperrîw*

*Gyanî germî leberda bû,*

*Xencerêkî cewherdarî*

*Korpaşay lekemerda bû.*

*Le pêşengî kejaweta,*

[46] Mehirdad r.êzdî, *ziman, wêje, xwêndin*, wergêr: yusuf ezadin, govara raman, j:110, r:115.
[47] Dr. Marif xeznedar, *dîcle î hizirim*, dezga î mukiryanî, çapxane î wezaretî perwerde, çapî duyem, bergî ekem, hewlêr, 2006,r:76.

*Allay xwênînî mehabad hellkrabû.*

*Le tek ewda,*

*Sêdarekey çwarçra bû.*

*Ke hate lam,*

*Peyamêkî way bo hênam,*

*Wşekanî*

*Wek prrişnigî agir wa bûn,*

*Hî rojanî avêsta bûn...*

*Xwêndmewe û gelêk giryam.*

*Giryam bo xwem,*

*Giryam bo to,*

*Bo hezaran*

*Zîndûy nêjrawî naw gillko.*

* * *

*Bram, şêrko!*

*Rast dekey to:*

*Dû hezar û pêncsed salle*

*Denûyn ... Dexweyn ... Leser dro!*

*Rast dekey to:*

*Dû hezar û pêncsed salle*

*Gwêman kerre,*

*Zmanman gîrode û lalle.*

*Bellam, heyho!*

*Key lay ême*

*Pesnid buwe pyawî rastgo?!*

* * *

*Bram, şêrko!*

*Bem çawe dîm*

*Zerdexeney le dwawe bû*

*Kejawekey giryanî to.*

*Le tnokî firmêskitda*

*Demarî bazûy kawem dî,*

*Laşey kewtûy zuhakim dî,*

*Allay berzî şekawem dî,*

*Asoyekî rûnakim dî.*

* * *

*Le tnokî firmêskitda*

*Zerdeştim dî,*

*Baweşî xwey degirtewe*

*Bo hejar û çewsawekan.*

*Beheştim dî,*

*Rast debowe*

*Leser laşey çwar dîware rmawekan!* (P. r.143)

"Kejawey giryan"[48] navê helbest(Qesîde)ka, drêje ya helbestvan (Şêrko bêkes), li pey hindê buye navunîşana dîwana duwê ya (Şêrko bêkes)î, ko li sala 1969an weşand, ev

[48] Şêrko bêkes, *kejawey giryan*, helbest, wezaret el seqafe û wel e'lam, çapxane y kameran, çapî ekem, silêmanî, 1969.

qesîdeye behsî par û qonaxeka jîna hevalekê xwe diket bi navê (Letîf), ko drêka kurdînî û dûr ji wlat şehîd ketye. Dema "kejawey giryan" hat weşandin, daneyek ji wî ktêbî kre dyarî bo helbestvan "Peşêw", ewjî bi qesîdeyek, ku ji çar beş û paran pêkhatye, berisva qesîda (Şêrko bêkes)î, dideteve. Di başa êkê de: kejawey giryan bi mrovekî xebatker dişbîne (hatye şubhandin) ko pre ji canekî germ û tjîye ji hest û sozên zindî, ko eve hevbende bi remiz û cevengek mezn ya netewe, ewjî (Xencera gewherdar), ya kor paşa (Paşay kore), mîr mhimd paşayê rewandizê(Mîrê îmareta soran).

"Peşêw" dem û çaxên gelê xwe pêkve hevbend dike, li pêşeng û ser karwanya wî (Kejaweke)helkrin û blindkirna ala mhabadê nîşan ddet, herwesa li cem wî jî qewmîn û sosret û trajîdya(Meydana çar çraye)ye, bi ramanek din behsî dîroka dijwar û tjî xuyn û agir ya kurdan kiriye, van qemînan bi buyerên nû û nha hevbend diket. li para duwê de rexne û şrovên xwe berçav dket, di wî demîda tekez li dyardeka civakî dket , ko şêrko bêkesî behis kirbû, em haydarnînîn ko eve demê dû hizar û pênc sed salane em li ser axiftna drew û drewkrin, dçerîn û dxweyn. zêdebarî hindê (ji bir hindê) dû hestên gring yên mrovî kurd hatîne bin pê krin û pêpes krin, ewjî (Ziman û gwe)e, xuyaye ku dema mrovî ev dû hestên gring û hêja nebin, şubhê bedenekê hişk û bê can xwe nîşan didet. kengî mrovên heq û rast bêj cîhê wan li nav vî civakî de heye! di para êkê de, behsî pêşeng û despêka (Kejawey giryan) hatyekrin, û herdû rû yên dîrokî hatye nîşan dan mîna(mêrxasî û şanazî, sernekeftin). para duwê behsî rewşa nha yê kurdistanê diket, para syê behsî dumahîka (Kejawe) diket, ko kenî û grinjîn nîşanên vî parî ne. Eve jî wî tiştî nîşan didet ko gereke di paşerojê de, heq û maf bo xudana vegerrît, anko li dumahîda astneg û dijwarî namînin, dinav rondik û hêstirên çavên (Şêrko) da çeng û zend û baskên kawey dibit û hatebûn, herd heman demda beden û termê zuhakê stemkar dmeydanê keftye asman û stêra runahî ye û ala ya blinda kurdistanê jî di hejinit. li par-kopla- dumahîde "Peşêw" wêne û resma wî behşitî neqiş diket, ew jî piştî heriftna her çar dîwaran, li ser 'erdê me tê avakrin , ev tişte ne tinê bu "Peşêw" belkî bo tevaya kurdan eve, anko vekirna dumahîk grê ya derunî ya kurde.

Qesîda (Kejawey giryan) li ser ew rêç û şupa bîrubawerya netewe persitî "Peşêw" dmeşe û di dome, ku ew dîroka pre ji stemkarî û zordarî li kurdan, nhajî pre jxebtîn û têkoşînek mezn, stêra ronahî û grê ya blindkirna alay, belê ala grê yekî derûnî (Saykolocî) yê helbestvanê meye.

*Xweşewîstim*

*Le pyawêkî gerrokim bîst*

*lay ewan kçanî kok*

*le batî gull honrawe deden le berok*

*gewrekanyan bo peykerî hunermendêk ,*

*dêne ser çok*

*keçî le gişt kurdistana*

*le mellbendî hacî û bêkes û gorana*

*ger bgerrêy ser ta xwar*

*Wek xerîbê bedî nakey ,*

*Tapoy peykerî edîbê* (P. r.153)

"Peşêw" bîr û hizire ka jiyarî û mirovatî ji zimanê mirovekî gerok û rêwî vedgêrrît. Gerok anko: ew mrovê zor dgerît, dkevinda hatye gotin : çand û zanîyn li ser çar stunên bingee hatye damezrandin: (xwendin, ders bêjî, gerryan, priskirn), nav înana wî kesî axiftna wî buye xwedî mfa û bhadar, bi ramanek din "Peşêw" mêzekrin û dîtna kesekî şehreza û xudan ezmûn vedgêrît, ev tişte têkel û tevilhevî xeyala helbestvanî hatyekrin, ev wêneya helbestî gelek bedew û balkêşe, mîna tablo (Keval)ek huneryе. ev para helbestî dû rûy ya jyarî û şaristanî nîşanî me dden. Jyar û çandek xewnî bi çanda din ve dbînt, di çand û jyara êkê de pranîya mjar û tiştan di cîhê xwedane û bnechin, jyara duwê bêseru bere û li ser êk nîne!

Qîzên bedew yên civaka ji ya pêşkeftî li şuna gulan, par (Beyt) ek helbestî li ser sîngê xwe didin, xuyaye ku helbest û helbestvan cîhekî blind û bi rûmet hebûye dinav gel û mîlletî de. Li gerok û rêwî yekî hatye bîhîstin ku li nik wan ( *li nêvbera her peyker û peykerekî, peykerek din heye, lê belê li bajêrê bexdayê li nêvbera her çayxanek o çayxaneyekî dî, çayxanek din heye*)[49]. li wlatên pêşketî peyker ji bo wan kesan jî tê druskrin ko cadeyan paqij dken, peyker ji bo wan li nîveka bajêrî tê druskird, eve belge û

[49] Ev axaftin di dr. Muhemed xidir meulud wergirtiye, dema li rusiya xandina bilind temem kir, ev tişte dît bû.

nîşaneye ko ev kese hêjay peykerî ne çimkowana xizmetabajêrê xwekirye wib dilsozî karê xwekrîye. bi rastî “Peşêw” karîye bi hinek amûrên helbestî yên xurt karîye hizru wêneyên helbeytî bi afrînt, ko pranya helbestî xeyal û hiş û wêneyên balkêş û rind têda hene, evejî meznîya helbestvanî nîşan det.

*Erê xellkîne bo hênde xawn?*

*Mellên:kîsellîş sist û tembelle*

*Meger nazanin eger hîç nebê*

*Sed sallî rebeq 'umrî kîselle*

*Erê xellkîne bo hênd bepelen?*

*Mellên:kerwêşkî deştîş radeka*

*Axir kerwêşkî bedbixt û klloll*

*Jînî zor kurte boye wadeka?!* (H. r.309)

(Kusele û kêvruşk) dû rawr (Heywan)n, sîfet û kiriyarên wan, buyne kaklê naveroka helbesta (Heşt xiştekî), wek tê zanîn ku kusele xav û sist û hêdî- hêdî yen belê kêvruşk bi lez û beze, kusele hêkê diket, lê kêvruşk dizê. Li nêv çîrok û gotin û meselên folklorî de navê wan dû rawran gelek hatye. “Peşêw” li afrandna van dû tablo -par- yên helbestî, bi tû awayekî û tû sîfet û kiriyarên van dû rawran wernegirtye û bikar neînaye, belkî bi bîr u hizireka nuy ev duwe (Kusele û kêvruşk) kirine qehreman û mijara helbestî xweda. “Peşêw” rûyê xwe hemberî xelkê sist û xav diket û rexney li wan digre û wi dibêjite wan nabit mîna kuseley sist û xav bin û tînte bîra wan ku cudatya 'emir û temen li nêvbera (Kusele û mirov) heye, û dibêjit wan haydarbin, lasayî û zarvekirna kuseley zerer û zyanî dgehînite we, dema (Kusele) nêzî sed salan dijî, lê belê mirov kêmtir dijî û 'emrê wî nagehîje hindê, li vî dîtnê, peşêw karîye bi awayekî hunerî hizirên xwe behis biket. Li nîvya (Heşt xiştekî) dwêda, wane û şîretên din didete me ew jî ewe ku hinek xelk hene hertim leze lezê diken û ranawestin û haydarî pranîya tiştan nînin. Xuyaye ku (kêvruşk) buye hêma û cevenga van terzê mirovan, vêga helbestvanê me bi bîra vane tînît ku hişyar û haydar bin, û bzanin ku 'emir û jiyê (kêvruşk) kinde ji ber hindê eve jî xwezay ya wêye. Helbestvan ev mebest û ramaneka di çar çoveyeka hunerî û rengîn û balkêş nîşan didet. Bîr û hizirên “Peşêw”î di vî (heşt xiştekî) de kefiş dibit diyar dibit ku kur hizir dike û dûr

dibînit, herwesa mîna rexenevanekî kîmokasyan pranîya mijaran berçav dixet, li dawîde dijwarî û astengên gişk behis diket û encam jî nîşan didet.

### 2.3.Zordestiya li jinan dibe (jin û stemkarî)

Jin êke ji tuxmên bingehî û serekya, berdewamya jiyanê. Cihê jinan ji alyê civakî û ol û ayînî ve di dereceka blind deye, zêtir ew karên jin pê radbin, dibit mak û hêvîna pêgehandin û drust bûna civakî. Jin li kêleka mêran drust bûye, erk û rol li ser sto û mlê wêye, mêr jî rolê xwe dibîne, her êk ji wan angorî keda xweye, dema xudê jiyan afrand, jiyan ne afrandiye dako mêr txuyb û sînorî jinan pêpes bike. An beruvajî jin û sînora mêrî pêpes bike. Heker haydarî û hişyarî nebit sedema şad bûn û bedewya jiyanên hingî jîn dinav civakî de wekhevî û 'edalet têda namînit. Stemkar mafê mirovên din pêpes dike. civaka kurdî bi zelalî û bi eşkere sîma û nîşana dîroka xwe pêve dyare, o heta niha jî li dest nedaye û winda nekiriye, ew dyarede û mijarên ku helbestvan hest û ş'orî pêdket, di helbestên wî da dyare behis kiriye, (*Jin dinav kurdan de, mîna amûr û tiştan serederî dgel hatyekirdin, û mîna dyarî û xelat bo kesên din bkar anîne, anjî mîna tiştekî bi kar anîne bo çarekirna arîşên dnêv dû malbat*)[50]. mezintrîn bin pêkirin û pêpes kirina li beramber ji nê hatye kirin, ewe ku bêpşik û bê behir boye ji mafên xwe, herwesa ji gelek tiştan bê par bûye, bê hezkirina wê, biryar û qerar bi serda hatye cih bi cih kirin. biha û puyte bi jiyan û xwezyên jinan nehatye dan, eve jî derd û pejyeka dijware, tuşî her civakekî bibit, dibte egera dumahyeka xrap û nîgetîv, mezenya jinê dhindê daye ku qedrê wê bête girtin û di cihekî hêja bitin, mafên bingehyên jinan, mafê biryardane, ewe ku xudî qerar û biryar bit, gereke hişyarya jinan blind bitin, ev tişte baştre ji hindê ku em biryar li ser jîna wê bidin. diyarde ya serdestya mêran di civaka paşketî de, tê dîtin, mafên jinan tê pêpes kirin û zor destî li jinan tê kirin û jin xwedî biryarê nînin, ev terhê civakî bi cvateka zindî nahî hesbandin, çimko nabit tevaya biryar û pişkdarîkirin, dibyavên jiyanê de didestê mêran de bit. Jin evînî û jêhatî û serifrazî ye, rolek mezn di jiyanê de , dileyze. Azadiya jinan pêtivye û bihadare, herwekî azadiya civakî ( *meseleya jin û evîn hertim hevbende dgel meseleya azadî... Mxabin li wllatê meda ez bê behir bûm jevîneka serifraz û azad*)[51]. “Peşêw” dibêje, jin û evînî hevbendin digel azadî, heker azadî nebit, ew bi xwe bi serifrazî biryarî bidet û ew bi xwe paşeroja xwe diyarbiket, wî demî jîna jinê dibit zîndan, mîna koyle û bendey serederî dgel tê kirin , heker dilber û evîndarê êkî bit, rihê lê bigirin, eve wî tiştî nîşan didit, ku ev civake serdestya mêrane, li vir dengê jinê nahêt û pêpes û bê behre. vehêt û krêt

---

[50] Îlham bacelanî, *ciyawazî nêwan kiç û kûr le komelgakanda*, govarî karwan, j:237,r:156.
[51] Azad ‘ebdulwahîd, *diyalog*, bergî sêyem, çapxane î şehab-hewler, çapî yekem, hewler, 2013, r:332.

kuştna jinane, ev dyarde dinav civaka kurdî de tê dîtin, zolmeke mezne jin bête kuştin, pitir û zêtir ew kuştin bi navê namûs tê kirin, gelek caran ew jin paqij û bê gune ye derdkevîtin, tinê li ser gotin û axiftnên xelkî, ew kuştin tê kirin. ev kare li ser hiş û hizira "Peşêw" bandor hebûye, helbestvanê me xembar û daxbare bi hindê ku hinek mirov, demarî û roşnibîrya wan hind paşketî bit, li cem wan tiştekî sanahî bit bi karn bê sedem xuyna êkî brrêjn û bikujin. Ji bu vê diyardey "Peşêw" dibêjit:

*Xweşewîstim!*

*Namekanim bsûtêne.*

*Ew honrawey bot nûsîwm*

*Sêdarey bo damezrêne.*

*Dillgîr mebe...*

*Le lay ême, nek to, pyawîş*

*Leser wşeyekî balldar*

*Qollbest dekrê, dedrê le dar.*

*Dûr mebîne.*

*Ger toy afret*

*Bo çrîke deng hellbrrît,*

*Şêtekanî ser kursîy şar*

*Gerûy sewzit biqllîşênin,*

*Çawî geşt pirr çqill ken,*

*Pirçî reşt bsûtênin.* (P. r.151)

Helbestvan amaje û îşaretê didet û dibêjit, sînorî azadya xwe bin pê û derbaz neke, çimko di vê şar u bajêrî de, hinek mirov hene, li cem wan tiştekî normal û sanahiye, bi sedema peyvekî an hevokekî, jinê bikujin û nehêlin û jinav bibin. hişyar û haydar be bla dengê te nizim bit, ev mirove dikarin hemî tiştekî can û rend jinav bibin û bikujin, bşewtînin, ev mirove hêj dinav civakî de mane û xudî kriyarin. hizir û dîtna "Peşêw" li dor

vî meselê, negeşbîn û necîhê şadbunêye, evejî nîşan didet ku ew tîtal û bîr û hizirên xrap û şaş û vehêt, hene wi didome. "Peşêw" di helbesteka din dibêje:

*kezî to - çepke grrêke*

*Hemû rojê , derjêyte naw jûrî tarm ,*

*Wa hest dekem ,*

*Rojê daê , lafawî agir helldestê*

*Zerdexenet , keştyêke*

*Hemû rojê rê win deka ,*

*Wa hest dekem,*

*Rojê dadê , le benderî dllî minda radewestê !*

****

*Nihênî xwem*

*Ta êsta, bekes negutuwe*

*Be toy dellêm :*

*Min çyayîm ,*

*Xellkî şarî ( estê ) kujem*

*Hemû rojî ,*

*Xwênî (zîn)êk le xencerm dadeçorrê*

*Ger dêyte lam wiryay xwet be*

*Xweşt newêm , lêt negorrê* (P. r.309)

Raz û nihêniya dilê helbestvanî eşkre û zelal nîne, nepenye û veşartye, ew xelkê wlatekî xerîbe, ew şarê ku (Sitî) têda tê kuştin, helbestvan gereke jinê haydar û hişyar biket, bêjitê, dûr nîne, ew tiştên qewmên, carek din bi qewmit, di vê bajêrî evîndarî mîna ruh û cane, her xencerek bête helkêşan, wî demî xuyna (Zîn)ek, dihête rêtin. livir

helbestvan rexney li paşketna civakî digrit, û şîretan li xurt û qîz û lawên nû dem diket, dibêjit, di demê pêşî û berayî de, ew mirovê ku karî xuyişk û diya xwe bikujît, ni hajî ew mirov hêj mane û hene, ji ber hindê, bla haydarî û hişyariya we di pêş evîna hewe bit. ew xwe bi endameka civakî di hesbîne, dixazît ew tîtal û bîr û hizirên şaş ku dinav meda hene xuya biket û nîşan bidet. "Peşêw" di helbestekî din dibêjit:

*Min fallçî nîm*

*ktêb bo kes nagirmewe*

*Naw lepî kes naxwênmewe*

*Keçî , lêm rûne û dezanim*

*Madam to mint xweş dewê*

*Debît be nerme besteyê*

*Qerecekan , şewanî zistan detbêjn*

*Debît be dêre hellbestê*

*Beyanyan roj detnusê ,*

*Ke zerdeperîş derkewê ,*

*Şî'ri kujekan detnêjn !* (P. r.357)

Madem jinî dixazît û biryarda, bi serifrazî bijît, gereke hazr û amadebit li hember her tişt û buyerekî rawestît, ku tête riha we. Dema hizra evînî di dilê jinêda serheldidet, dibit zanbe ku tiştekî normale navê wê diçit nav helbest û sitranan , li hemû cihekî, bi roj bi şev dibit behsê wê. Gereke jin amadebit, hemberî arîşe û astengan bibit û li cem wê normal bit, piştî hingî hinek kes û mirov, ku helbestvan wan bi (helbest kuj) navê wan dibet, dikarin te bikujin û dumahî bi jiyan û bedewî û rendya te bînin. waqî û dîfaktoya civakî wesaye, an jiyan li gorî wan derbaz dike, an jî bizavê bike ku biryar bi destê te bi xwe bit, lê belê hişyarî her tiştekî be ku tête riha te. ew jîna dramatîk û trajîdya ye, bu jinê hatye hazirkirin û amadekirin, ew hizirên şaş û serdestya mêran, ku ta niha jî dinav civaka kurdî de tê dîtin, jiyaneka tijî ye ji kul û xeman û damarîya mêran, eve boye sedema ku texa helbestvanan bixazn û bikarbin, hinek ji xem û êş û kul û kederên jinan telhevî helbestên xwe bikin.

### 2.4.Xrapiya rewşa aburî û zordestî li kirêkaran

Hest û hizirên helbestvanî dinav civakî de serhildaye, aliya mirov dostî û jiyana xweş boye mijar û behsê helbestvan û nvîskaran. Vane tekez li ser hindê kiriye, ku gereke tevaya endamên nav civakî mîna yek bijîn û wek hev bin, di xweşî û nexweşî yên jiyanê de beşdarbin. Heker kanyek hebt gereke tevaya mîllet mifa û qezencî ji wê avê wergrin û bibînin, heker darek hebit, bla berê wê darê bo qezenca hemya bit, lê belê li alyekî din ve her tim jiyan cudatîy têda hebûye, tex û çînê dewlemend û hejar û belengaz dinav civakî de hebûye (çi qas jiyana aburî ya mirovî, kakil û bingeha bîr u hiş û zanînê buye, li alyek din zanîn û zanyarî bi xwe jî bûye zevyeka berifree bu xebtîn û bizavên mirovan)[52]. mirov heker bîr u hizirên xwe bikarbînit û zanistekî bigrit û mfay lê bibînit, wî demî dikarit bi ser feqîrî û hejarî serbkevit. tex û çîna hejar wbelengazan, hertim boye mijar û behiskirina xelkî, çimko zulm û zorî li wan tê kirin û mafên wan tê pêpes kirin, zehmetî û bargranya jiyana mirovên hejar û rêncber û belengaz, bûye mak û kaklê çendîn vekulîn û roman û çîrokan. şa'îrên klasîk di helbestên xwe de behsî tex û çîna rêncber û belengazan kirine, nemaze demên berê ku hinek axayên gunda mirovên zalm û stemkar bûn û zulm û zorî li pale û rêncberan dikirin. Pey hindê şa'îr û helbestvanên nû berevanî û piştevanya mirovên bin dest û rêncber dikirin, di helbestên wande zelal û xuyyaye ku ew dil sotî û xem xwerêt rêncber û belengazanin, di vê mijarî de hinek peyv peydabûn û hatne nav dinya ya helbestî, mîna: (nakem kenî, pale û karker,belengaz, stemkar, jîna te'l, axa , beg, zelemê axay,...) berevanî ji çîna hejar û rêncberan, byavek berçav li dinya ya helbesta kurdî bu xwe girtiye.

Sebaret vî mjarî “Peşêw”î zêtir hest bi erk û berpirsyarî kiriye, li hinek helbestên xwe da, berevanî û piştevanî ji heq û mafên pale û kiryêkar û rêncberan diket, şeş helbestên nav dû dîwanên helbestvanî taybetin bu behiskirna zulm û zordarya axay û xrabya rewşa aburî ya hejar û rêncberan û pêpes kirina mafên wan. “Peşêw” mîna helbestvanekî xwedî ezmûn, rolek mezn leyistye li nîşan dan û berçavkirna derd û xem û êş û janên, par û beşeka civakî, ew jî tex û çîna bin dest û tepeser (pale û rêncber)an. dema tengavî û arîşên çivakî dibîne mijar û babet û dema êş û kul û janên civakî dibine mijarên bingehî dinav dinya ya helbestên “Peşêw”î, bi vî corey bu me xuy ya dibit ku peşêw dinav civakî peyda bûye, ji bu civakî drust bûye, herwesa di riha helbestan dinav dilê civakê dijit.

---

[52] Îsa’il resûl, lêkolîneweyeş le edeb û folklorî kurdî, kowarî defterî kurdewarî, j:1, bergî ekem, bexda, 1970, r:126.

*Krêkarîn*

*Krêkarîn, krêkarîn*

*Pihruhirdhî êş û azarîn*

*Arhiqrrêjîn,*

*Jîn dihnêjîn,*

*Takû bjîn.*

*Krêkarîn, krêkarîn*

*Kollhikhî jînîn, bihkarîn*

*Bihhhllimhitî bazû û şanman,*

*Bihthimhnî pirr mhînhitî têkoşanman*

*Şaxudaxî pirr mihtirsî*

*Binkoll dihkhîn, chirg dihdrrîn,*

*Lihkîshî thimhnî xweman*

*Nirxêkî tazhî bo dihkrrîn ...*

*Bihllam tûşî shirsurrmanîn,*

*Kihnazanîn,*

*Bo kê dihçê rhincî bazû*

*Cighilhnan, çhind lihtêk nan*

*- makî jyan -*

*Himhiş boçî?*

*Ta bêyinhighirr wihkû amraz,*

*Bê qirrhqirr, nihmanbê raz,*

*Cighilhirrhinc, cighilhkar,*

*Bo gîrfanî shirmayhdar!* (P. r.25)

Ev par û beşe demekî hatye gotin, dema ku karên gran û pir zehmet, bi dest û zendik û xuhên krêkar û rêncberan, hatye kirin. Çax û demê berê amûrên teknulocî tû nebûn, ji ber hindê her sal, bi sedan, bi hizaran pale û rêncber di bûye û qurbanî û gorîya karên giran. dsalên pêncî an şêstan de yê çaxê bîstê, ew bîr u hizirên wî demî dinav xurt û lawên xwendevan hebûn. Texa krêkar û rêncberan yên nav civakî hebûn. Dem berv pêşve çû rewş hat guhrîn û hingavên baş hate havêtin, peyvên mîna: texa rencber, jîna pir zehmet, bin destî , kapîtalîzm, xwe dan, rencberî, hejarî û belengazî, stem , nexwendewaryetî, qse û axiftin û mijarên kor û kumbunên xelkî bûn. Par û pişkeka bîr u hizirên xurt û lawên wan salan bûn. “Peşêw” ew bi xwe û malbatawî, dinav ev rastiyekî pirgran û nexweş bû. dinav çîna jêrî yê civakî jiyana xwe burandî ye, mîna xurtekî xwendevan û haydar, êş û kul û keder û birçîtî ya kesên din, dêşand û hest pêkir û bandor li ser wî hebû. Beruvajî hindê, encamên drust û rûn û eşkere, ku berhem û berê tevaya têkuşîn û ked û bzavek xurte.

*Axa gutî:*

*Min phîkhirî xudam ktumt*

*Dihbê gişt la*

*bimpihristin hhir wihku bit*

*Rastbunhuhfîr'hun û hîtilhir*

*lihgorr*

*Gutyan:bihllê raste!*

*Êmhiş dwênê waman dihgut.!* (P. r.52)

Dû tabloyên helbestî yên rind û rengîn, bi dîwarî helawîstîne bu temaşekrin û têfkirîn, herwesa bo pend 'îbret û şîretan. axayek ji axayên xun xar û damarî, mîna axayên berî wî daxwazya xudayî û baxweyya drewîn diket, ji 'urf û 'edetan çûye derve. kurd berî niha gutîye: (ecela biznî bit, dê nanê şvanî xwet) her axayekî xun xar û gemarî, daxaza vî tiştî biket (musîlînî, hîtlir) dinav gor û turbeyyên xwe dî rabneve û piştevanyê dê lê ken. tabloy duwê, peşêwî axiftinek heye li ser ew pend û mesela kurdî, ku dbêjit: (çi bi çînî, dê wî helînî) anko genmî bi çînî, dê genmî dûryeve zîwanî bi çînî, dê zîwanî dûryeve bi

awayek din: heker mirov karên baş biket, dê başî ête riha wî heker mirov karên xrap bket, dê xrapî ête rêka wî.

"Peşêw"î ev pend (gotin)ê kurdewarî ber bi alyek din ve briye, xizmeta hizrekî pê hatye kirin ku berovajî hindê ye. Ew dbêjit: kurd gutneka hosa (vî corî) heye, lê belê min di gelek cîhên kurdistanê kar û xizmet kiriye, belê mixabin tevaya karu keda min bi belaş û herwe çû, min çi dûreve bê mfa bû. Xuyaye ku heker karek qenc û baş bit, lê heya dawî nebit, tu kes nabêjte xudanî aferîn, hinek caran mirov li hemberî ked û karan xwe dest betal dêmînit. ew tişta li wan dû tabloyên qeşeng tê mêzekrin, navunîşana (wşey perde) ev navunîşane hêma û cevengeka nepenî û nhênî heye, carek din bi nxêvîn da dyarnebt! dibit çi raman û me'nayek hebit! Pranya vana bi qeencî û famkirin û zanîna helbestvanî tê hsêb kirin. dikarîn ku alyekî herdû tabloyan bi vekrî bihêlin.

*Le bindîxaney tarîk û nûtek*

*Gwê pirr le dengî kelepçey meçek*

*Pirr be naxî dill*

*Zor germ û bekull*

*Ger bitllêmeweş*

*Bistey rizgarî*

*Her dllêmewe djî zordarî.*

***

*Herwa le bîrme,*

*Daykî niştman*

*Katê naye dem gopkey memkî jyan,*

*Çirpandîye gwêm , be soz ,be giryan :*

*"çend salle,rolle,*

*Lem xak û xwelle*

*Dê dengî zîlî*

*Pirr tirsî dîlî.*

*Bo tolle goş be. Ne ki bo zelîlî"*

***

*Naçê lebîrm*

*Ke bawkî jîrm*

*Çekî mirdaney xiste serşanî.....*

*Êmey be cêhêşt bo têkoşanî*

*Neygêrrayewe eşkence û sza*

*Ta rojêk agir be dillya çza*

*Bellam hemîşe dwa qsey pende*

*Satê pêy gutim dem pirr le xende*

*"rolle ,merd bijî, nek wekû bende* (P. r.91)

Riha min an (srûda zaroka şehîdekî): ku pêkhatye ji sê par-kople- helbestên kurt. Dema mirov helbestî dxuyne bi hûrî lê mêze dike, o carek din vedxuyneve, hest bi hindê di kî ku eve çend dem û se'et borîn, wesa xeyal û hizir dikî romanek balkêş dixunyeve. despêkê bi hinek peyvan behsî waqî'a jiyana nêv zîndan û girtîxane diket. Deng û tarî û tris, mîna fîlman hatye nîşandan. Gereke bizanîn ku girtîxane û kelebçe û zincîr, nikarn riha xebtîn û tekoşînê bigrin. Ew kelam û srûd û sitranên yê balkêş yên rizgarî û serbestî li hemberî zalm û zordestan dibêjit û distrê. dayka wilat, çi çk û mekkê xwe didete zarokî, bi girî û dile kî şewtî behsî jiyan û dîrokî diket, rastyan vedgêrit, tirsa girtin û bendî kirin, dengê girî û axî nik, hatna cor û terzekî taybet ji perwerdekirinê. zarok-ax (xak), dengê zîlî – tirsa dîlî, jîn û grî, zelîlbûn, terhekî rîtim û awazeka kelejan, daye wî parê helbestî. Bîru hizra zarokan rûne, tête bîra wî demê ko, babê wî neşyaye û nkarye, zulm û zorî û bin destî qebûl biket, jberhindê çek hilgirtye li hember hêzên reş û damarî, ku xelkî dkujn û jiyanî dşewtînin. rakirin û helgirtna çek û sîlahî djî dujminê xuyinxar, gelek tiştan li pey xwe tînt, wek brîndarbûn û şehîdbûn, bab bi serifrazî şehîd dibt, lê belê berî vî sosret û qewmîn bi rûyekî bi kenî dbêjte cegerê xwe! Cegerê min, bi serblindî bjî, ne bi serşorî û zelîlî, ev axiftna babî bo zarokî, dem û qonaxan pêkve hevbend diket.

*Pênakenim*

*Ta ew rojey hejarekan*

*Mamzî xende raw deken*

*Bo lêwî ladê û şarekan*

*Ke ewem dî*

*Ewsa mnîş wekû ewan*

*Wekû şney gullegenim*

*Wekû areqey nawçewan*

*Le naxewe pêdekenim*

*Pênakenim*

*Pêkenînim hergîz nayê*

*Ta be çawî xwem nebînim*

*Le her layê*

*Lafawî agirpjênî çewsawekan*

*Rastibûnewe û yaxîbûnî*

*Dîl û ejnoçemawekan*

*Depçrrênê kot û zincîr*

*Rademallê*

*Gencîney xwapêdawekan*

*Ke ewem dî*

*Ewsa mnîş, germ, betaw*

*Beste dellêm*

*Pêdekenim*

*Ledyar kot û bendî şikaw* (P. r.129)

Helbestvan şert û mercan bu kenîna xwe dadnit, ew nakete kenî heya: wî rojî ku hejar û belengaz digehîjin mafê xwe, wî demî ji nîveka dilî dikete kenî, dema kenî dikefte ser lêvên xelkê gund û bajêran, vêga wî demî ew bayê gulên genmî dihejînit, yan jî mîna xuhên enya mirovan, hingî jî wekî wan ji dil dikeme kenî. bu cara duwê dibêjit: nakeme kenî heya wî demî ku bi çavên xwe dibînim, anko hez ji peyman û sozên drew naket, belkî dvêt bi çavên serî bbînt! Ewjî kengî? lehî û lêmşit û tofana burkana agrîn yên mrovên bin dest û belengaz. Rabûn û hişyar bûna dîl û girtî (çok şkestî) kot û zincîran bişkînin û mulk û xezîneyên damarîyan jnav bbet û nehêlît. Dema min pranî van tiştan bi çavên xwe dît! wî demî bi germî û bi dil û canekî rehet, dinêrme kot û bendên şkandî û bi kenî distrêm, distrêm û dikeme kenî. dema zulm û zordarî û stemkarî û bin destî û herwesa bargranî û birsîtî hebin, hingî kenî li ser lêvan namînin, wî demî tnê dujminê damarî bê wîjdan, bi rewşa xelkî dikete kenî. "Peşêw" li ser hinek tiştan tekez kiriye û behis kiriye, ku hevbendin bi êş û jan û kul û xemên, tex û çîna bin dest û belengaz.

*Mnallekan (zarokan)*

*Leser borîye newtekan*

*Le dîwarî*

*Awedestxaney mizgewtekan*

*De milyon car*

*Nûyisman bjî çewsawe*

*Nûsîman bjî krêkar*

*Bellam, hemû nûsînekan*

*Tenha carê*

*Neyantwanî bibne paru*

*Têrken zgî krêkarê?* (P. r.236)

Di vê warê de "Peşêw" şkestina hinek jwan ceveng û amaje û druşm berçav diket, ku nekariye bi tû awayekî vî rewşî bguhrin, tû bandor nebûye û neşyan bha û nirxên wan

tiştan zêtir biken, amko bha û wimfay bgehînin wan tiştan. ew druşm û nîşan li engorî çiye û çax û qonaxên, cor bi corin: (rojnamên cuda cuda, li ser buyerên pitrolî, li ser dîwarên destava mizgeftan (camyan) gelek caran hatye nvîsandin: her bijî rêncber, bijî krêkar! Lê belê tevaya van nvîsînan nikarîn tinê carekî bibne paryekî nanî û zgê birçyekî têr biken.

Peşêw dwaneya (deyem) xwe kiriye nwênera qonax û çaxeka pir arîşe û tengasên gel û mîletê xwe. Hember kirina cihê nivîsîna druşman, ew bi xwe terheke ji famabûn û pev çûn di çembera mijarek pêkenok, gotna: herbijî! Bê plan nikare rewşî biguhrit.

## 3.NÎŞANDANA KÊŞEYÊN NETEWATÎ

### 3.1.Perçe perçe buna xak û nebûna wilat

Despêka çaxê bîstem û pey neman û heraftna deselata kolonyalîzm (îst'mar= dagîrker), ev bîr û hizir li nik gel û mîlletên cuda cuda peydabûn, karîn li ser axa wilat ,dewletek drust bikin, bi hêvî û armanca hindê da bi aramî bijin. wilat û dewlet li despêkêda li ewrupa, pey hindê li asya û efrîqya, hatin damezrandin, lê belê ew devera ku pir arîşe û tengazî bû, rojhlata navîn bû, ji berko (çimko) pranîya hêzên kolonyalîzmê mîna (îtgilîz, frinsa, rusya) li vir bûn, pey hindê ji bu berjewendî û armanca xwe guhê xwe nedane çarenvîs û paşeroja gel û mîlletên deverê, peymannama (saykis –bîko) li nêvbera wanda çêbû, bu perçe perçekirina vî deverî û danîna sînurek nû, belê ev sînure li berjewendya gelê kurd nebû, çimku li gor vî peymannamey axa kurdistanê dabeş û parkirin bu çar beş, kurd bê par bû ji drustikirin û damezrandna dewleteka xweser. Pey hindê kurd bûye gelek bin dest û zulm û zorî lê hate kirin.

Gelê kurd li hember stemkarî û zulm û zorî, bê deng nebû û karî xwebgirît û whertim bi hêz û qwet bû. şorş û xebatên tevaya perçên kurdistanê, nîşan didin, ku gelê kurd razî nebûye bin dest bin û zulm û zorî lê bêt kirin, hertim bizav û xebat û tîkuşîn kiriye, bi armanca azadî û serbestya kurdistanê. (*Bîru hizra kurdînî, buye sedema hindê ku xwendevan û rewşenbîrên kurd, li aydyolocya û felsefe û tyorên cuda cuda, yên civakî û aburî bnêrn, da mfay lêbken û bkar bînin, bi merema dest ve înana armancên kurdînî*)[53]. şorişvanên kurd, nemaze rewşinbîr û kesên xwendevan, bizavek xurt kirin û pêngavên baş havêtin ji boy ku çavên mîllet vebin û wi runahî bibînin, çimko ew karên em pêradbîn û wi dikin, heker bu mifa û qazanca mîllet û civaka kurdî nebit, wî demî kirin û nekirina wî karu kiryarî nurmale ( *eflatun li hzir û nîrîna xwe, li wê bawerê buye , ku mrov li tebî'et û xwezaya xweda geher û bûnek civakî ye, bkarît bê, malbat û civak û bajêr û dewlet bjît, pêtvî yên civakî dibne sedema hindê ku bajêr û dewlet, bibne êkem rêkxistin wpêkhate yên civakî wisyasî*)[54]. ev nêrîn û bîr û hizira eflatunî, gringe û di cihê xwedaye, çimko bi bawerya wî pêtvî yên çvakî û siyasî , dibine sedema hindê ku mirov bajêr û dewlet çêbket, û bizavê biket jiyanek azad û xweser bijît, (*xweserî meselek nisbî û rêjeyye, jber hindê gereke zêtir behsî azadî û serixwebûn û derkeftin li bin bandora hêzên derekî û derve bêt*

[53] Dr. Marif xeznedar, dîcle î hizirim, dezga î mukiryanî, çapxane î wezaretî perwerde, çapî duyem, bergî ekem, hewlêr, 2006,r:280.
[54] Dr. Hamîd ezîz, hizirî komelaeytî le çiwar çêwe î sîstemêkî sertapagîrî da, govarî raman, j:110, r:136.

*krin, çimko dinyaya îro , cîhana hevgirtin û piştevanî ye li hev û wek hevî ye*)[55]. babet û mijara xweserî li nîk mîllet o mîlletek din ji hev cudaye, anko tevaya wan hez ji azadî û xweserî diken, lê belê gereke guhrin hebit, hevgirtin û xweserî dibite sedema hêz û şiyan. di rewşa îro de ya çaxê bîst û yekan de, gereke wlatên dunya yê piştevanê û harîkarê hev bin, daku jînek hêja û bi rûmet bijîn. tevaya hikumet û rjîmên 'êraqî, êk li dû êk ku deselat û hukim kiriye, zulm û zorî li gelê kurd kiriye, lê rijîma be'si û (sedam husîn) , ji hemya zêtir zulm û zorî li kurdan kiriye. Ev siyaseta rijêma be'si li hember gelê kurd, dû alî an bi dû rengan bû:

Yekem: kuştin û cînosaydikir û kîmya barankirina kurdistanê û enfalkirna kurdan, ev tişte bi eşkere û li ber çavên wlatên cîhanê dihat kirin.

Duyem: hikumeta be'si b awayekî veşartî û bi nhênî, li bin navê (bi 'ereb kirin) siyaseta regez perêsî li hembir kurdan bikar îna, eve anko derbderkrin û koçbarkrin û guhrîna dîmografya kurdistanê, peyrewkir(cih bi cih kir).

*(Prosîsa syaseta bi 'ereb kirna kurdistanê, ew bû ko hkumet 'ereb înane war wcîhê kurdan, da li kurdistanê bmînin û zevî û 'erdê kurdan bikrin, ev proseye ddemekî dabû , ko ji kurdan qedexe û yasax bû 'erdî li deverên mîna, kerkuk, xaneqîn, şingal, bikirin*)[56]. herwesa (*syaseta rjîma be'si l hember kurdan û deverên kurdistanê, syasetek, regezperîsî û şufînî bû, syasetek dûr ji bhayî mirov dostî*)[57]. tekoşîn û şorşên kurdan li hember stemkarî û zulm û zorya dujimnan berdewam bû û ddome, ji berko wan zulmek mezn û giran li kurdan kirin, ji ber hindê tevaya kurdan ji xwe diprisin (*gelo eve kurdistane perçe perçe bûye û hatye parkrin bi ser dewletên dujminî kurdan, ku kurdistan ketye bin destê wan*)[58]. helbestvan "hemdî" hest û soz a azadî û xweserî û nehêlana û zilm û stemkarî û li ser kurdistanê, li bîr û hiş û hizira tevaya kurdan peydabû, evejî li nvîsîna pranya nvîskar û helbestvanan, reng veda wkarîgerî û bandur hebû.

"Peşêw" tîhinya azadî û xweserya wilat û axa kurdistanê, dujminî sînurên dujimna danay û çêkrî, dujminê perçe perçe bûna wilat bû, herwesa dujminê rijêmên faşîst bû. di helbestên wî de bi soz û helwestek qaym û hêja behsî wilat û xweserî û bin destî û stemkarî diket, bi riha helbestan tabloyên rind û wêneyên rengîn neqşandiye.

---

[55] Ferhad celal mistefa, rolî asaiyş le siyasetî newdewletî da, g:senterî lêkolînewe y sitratijî, j:68, r:213.
[56] Fereydun ebdulrehîm, barudoxî siyasî Kurdistan-îraq,çapxane minara, çapa ekem, hewlêr,2006,r:198.
[57] Çavkanî pêşî, r:201.
[58] 'Ebdulla xidir meulud, lêkolîneweiyek le ş'irî hemdî, çapxane î roşinbîrî, çap:ekem, hewlêr, 2004, r:84.

*Bo şovênîm?*

*Wa vêtnamî*

*Bo vêtnamyan serdadenên.*

*Felestînî demrin, dejîn*

*Bo her dllopeawêkî*

*Bo her berdêkî felestîn*

*Eger mnîş dawa bkem*

*Serbest bjîm, wekû pyaw*

*Le kurdistanêkî azad*

*Nek letlet û pêşêl kraw*

*Bo şovênî û xweperistim*

*De pêm bllî, xweşewîstim*

*Bo şovênî û xweperistim?* (P. r.246)

"Peşêw" jî mîna me dizanit, ku tevaya kes û wlatî yan, ax û nîştman û wlatê xwe divêt û hez jê diken, wî bu nimûne navê dû netewan tînit,(vîtnamî û felestînî), ji ber ku ev dû gele ji bu bi dest înana azadî û xweserî, taybetmendyek heyeko cudaye ji gelên din, eve têkelî û tevilhevî wênên şi'rî, eve mafê wane, lê belê heker ew jî mîna her mîlletekî dinyayê (wekî mêrxasa) bxazît bi serbestî bjî li wlatê xwe kurdistanê, neku wlat perçe –perçe, tepeser û pêpes kirbît ( bo ez şofînî û xweperistim)! Carek din jî dibêjit, ji ber çi şofînî û xwe periste, ev helbeste li sala (1970) hatye nvîsandin, wî demî deselatdarê faşî wregez persit bi berdewamî ev prupaginde dkir, bîruhzirên hinek kesan jî her bvî awayî bû! Deselatdara be'si ya dîktator, tevaya maf û tiştan bo xwe bi heq û maf dhesband , lê jber kurdên bin dest ev tişt bi heq û maf nahesbînî, her tişt ko deselatdaran bi xwaztba dhat cî bcî krin, tiştên din jî pişt gwe dhavêt, kurdan ji kevinda gotye: (banêke û dû hewa).

*xew*

*Sindimyan kirde herdû pêm*

*Kelepçeyan kirde destim*

*Xencer nîşte ser gerdnim*

*Lêyan pirsîm:*

*Nawî çîye xweşewîstim*

*Bê deng westam wek singî mit*

*Dame qaqay pêkenîn û hîçim negut!*

*********

*Çawyan kollîm*

*Seryan brrîm*

*Be xencer dillyan şeq kirdim*

*Xwênim weku hewre trîşqe*

*Şrîxandî û her nemirdim.*

**********

*Katê xwênim firrkey kird û*

*Wekû çepkegrrêk pja*

*Beser 'erda,*

*Celladekan*

*Hatin... Penceyan têwerda*

*Hatin... Çîlkeyan têwerda:*

*Pîtî nawêkî serbirraw*

*Nexşey wllatêkî dizraw*

*Têkellaw bûn wek tanupo*

*Yekallayan nekirdewe*

*Herçend penceyan têwerda*

*Herçend çîlkeyan têwerda!* (P. r.311)

Sîxûr û hewalgran bi merema wergirtna zanyarî yan çi înaye serê peşêwî, pêt wî grêdan, zincîr û kelebçe êxistne destê wî, xender li ser stoyê wî dana, navê evîndar û dilketî yê wî lê xweztye, bi sema hindê ew sewdaser bûye, li bin eşkence û fşarên nefsî (saykolocî) nikariye çi biket, ji berhindê kire kenî. (xew) helbesteke behsî têkelî û tevilhevbûna peşêw û kurdistanê diket! Helbestvanê me tevaya şop û rêkan girtiye û cerbandyew ezmûnkirye heya (xewn) jî, her ji ber hindê da cûda bûn û dûrketin çê nebit, bi rastî bizava hindê kiriye (be pence û çîlke têwerdan) nikarîn ev cuda bûn encam biden. hinek bîr û hizir hene, ku dujmin û deselatdarê tirsînok, gelek jê ditrisn û hedarî li wan dibrit û nahîlit, bzane ew çi bi çavên xwe dibînin, çav înane der, serbirîn, dil înane der bi xencerî, xuyn mîna cokan bête der! Lê wî li hember hindê xwegirtye û maye û nemrîye! Belê mirovên celad û xuyn xwer, hun dikarin, xuyna gel û mirovên sivîl birêjn, xuyna sedan mirovên jar û belengaz! Lê belê dema ew xuyn dirjîte ser 'erd û axa pîroz, hingî (wî demî) celadên xuyn xwer nikarin (xuyn wax) jêk cuda bikin, heker (pencew çîlke darî têwerden).

*Katê valya lêm deprisê :*

*key pêt naye em dinyaye?*

*Pêkenînim , wekû çûzere rêwasêk,*

*Lejêr befrî dem û lêwma ser derdênê,*

*Pêkenînim – giryanêke ,*

*Zerdexeney hemû dinya degeçllênê !*

*Bellê vanya !*

*Nyandertall bûm*

*Katê pêy xwem naye dinya.*

*Be çawî xwem*

*Çaxî hemû pêxemberekanim dîwe.*

*Karwanî mêjûy şermezar*

*Beser loçî nawçewanma têperrîwe.*

*Keçî hêşta...*

*Ofîse qollbirrekanî*

*Em çaxe wîjdan topîwe*

*Le defterî zînduwanda*

*Nawî minyan nenûsîwe !* (P. r.314)

Komeka wênên rengîn bu berisva pirsekî....Valiya li min dipirsit, kengî tû ji day bûy(kengî hatye ser dinyayî)? Min jî kire kenî! Kenya helbestvanî mîna kata(rêvas)ekiye, dema ku li bin berfê serê xwe tînte der, kenî û giryeka ji dil tevilhevî êk bûn, karvedanek dyar û baş hebû, kenî grinjîna wî ree û rîşalên wan dê brîn tu nahêlît. belê valya, dema dîrok behis mrovên nyandertal dket, eve ezm, min dem û çaxên pêxemberan dîtye, tevaya karwanên şerimzarî ya dîrokê bi ser çirç bûna dêm wrû yê min derbaz bûye, nhajî gelek cîhên dinyayê li wlatê xwe min nemal heye ne xanî ne nasname (defter nifus), byanî xudanî tevaya tiştane, ez jî benî û kuylem. peşêw rast dibêjit: ev kiryare ji çax û zemenê bê wîjdan tê çaverê kirin! Ku ta niha jî navê kurdan li tomara zîndiya nehatye nvîsandin, li tû cye û derekî navê wî nehatye tomarkrin û nvîsandin.

*"zile" (şeq)*

*Rojtan dewê?*

*Roj le singî aso daye,*

*Be xenceran aso şeq ken*

*Roj derbênin.*

*Sîmay winbûy xwetan dewê?*

*Sîmay êwe xelîfeyek kirdî be xişt bo binçîney yekem mizgewt:*

*Brron mizgewt brrûxênin.*

*Çîtan dewê?*

*Serbestîtan?*

*Hezar salle serbestîtan*

*Kçe û denwê legelltana*

*Bellam kwanê pyawetîtan?* (P. r.427)

“Peşêw”î zlle(şeq)ek, li wêne û peyvan da û rêk vê kevt, peşêw bi vî (şeqî) dxazît mîlletî hişyar biket. Bi eşkere dikete qîrî û hawar diket, ew tiştên we divêt û dixwazn wil nav xelkî xwe pê pozblind diken, bi hêz û mêrxasî û 'ugîdî tê kirin, vêca kerem ken (ewe 'erz û ewe gez). Heker we hêz û mêrxasî hewe heye, eve meydane li ber we karê xwe biken. zile sê wêneyên şi'rî nask û balkêşn û hzir û xeyala bedew têda hene.

*Bo qerecêk (1)*

*Bes temaşay nawlepim ke!*

*Xwe min namewê pêm bllêy,*

*Debim be bawkî çend mnall,*

*Zengîn debim, ya herwa lat...*

*Tenya ştêkim pê bllê:*

*Heta mawm wek to dejîm,*

*Yaxwe debme xawen wlat?* (H. r.15)

Ewê nav lepa mirovan dxuynît (falgir), û ewên dnêrne bextê xelkî gelek pris li nîk wan hene û li heman demde besv jî gelegin, peşêw li (qereç)ekî, dixwazît tnê yek tiştî bêjte wî: (zanîna jimara zarokan, dî zengîn bim, an jî dî her jarbim) ew naxwazît van tiştan bizanit, ew tinê dixwaze, bizanit aya li paşe rojêda dibit xudan dewlet yan jî mîna wî qerecî bê mal û bê wilat dimîne. helbestvanê me hertim bîr û hizir û xeyala wî li ser kurd û kurdistanê ye.

*Ême dirextî ...*

*Ême drextî zirr û bêbernîn ,*

*Ta le çwar lawe bmanbirrnewe .*

*Ême tûtin nîn*

*Çerçî û bazirgan*

*Bmanifroşn û bmankirrnewe .*

*Ême be henyey dinyawe tif nîn*

*Be sûke destêk bmansirrnewe .*

*Ew dlle pakey gwanenewtêkî dagîrkerane-*

*Sbey milyonan rmî balldare .*

*Ew nîştmaney berdebazêkî berpêy hemuwane*

*Sbey milyonan sengerî sware .*

* * *

*Hestin , helloy şaxan , hestin*

*Le hestanda êwe yekin :*

*Yek bîr , yek rê , yek mebestin*

*Hestin , helloy şaxan , hestin*

*Le hestanda êwe zorn :*

*Çil milyon çaw , çil milyon qaç*

*Çil milyon meçek û destin*

*Hestin , helloy şaxan , hestin !* (H. r.20)

Mijûl buna hiş û bîr û hizira bi serbestî û azadî, boye sedema afrandina wêne û tabloyên şî'rî qeşeng û balkêş, gelek prisgirêk helbestvanê me mendehoş û sewdaser diken (wlatê xweser, ala,.......) darên hişk û bê ber gereke bên birîn, çar alî he ne û çar parçên kurdistanê, tacir û bazirgan tutnî dikrin û difroşn, û (kurd tutin nîne), kurd tif nîne bi dêm wenya dinyayî bi sanahî bsirn û jê biben. doşîna guhanê neftye, wilat mîna berên riha, wêneyên şî'rî,

*guhan ---------- rimî baldar*

*berdebazî berî-------- sengerî swar*

heker elhoyên çya rabin wibfirn dibne êk û êk armanc. Li rabuna duwê de: gelek zehif tên dîtin, çil milyon, çav, ling,.. ev helbeste tjî ye ji awazên nask û xweş, rîtim waheng jê dbarn, ev tişte şyan û hunermendya peşêwî xuya dket, bo dyarîkirna ew qalbê babet û mjara helbestî ku dinvîsît, kopla êkem qalbê bi kêş û wizna tibla:

10=10

5=5

15=15

Kopla duwê îqa' û rîtma wî bo qalbek din hatye nvîsandin: 8=8

Kopla yekem: behsî mjarekî dket,si wêne wtiştan pêk dişbînt (mîna hev) û hevber dket, kopla dwê b:

*hestin, heloy şaxan, hestin!*

*raman (rabin, elhoyên çyan, rabin!)*

Destipêdiket û her bi wî jî dumahî tînit. Li rîtma wî dyare ku daxwazî ye û hêvî xwaze. Tevaya helbestên peşêwî, li veguhastna rîtim û awaz û axengan ya dewlemende. Herwesa ew li alyê (ruxsar û naverok)de, li ser helbestên xwe dixebtit, hertim ezmuna helbestvanî zêtir û baştir dibin. Berhemên wî ple blind dibit. navunîşanên helbestan, helbjardna peyvan, peyvên ferhengan, rîtim wkêş û qalban (wezn û qafye) awaz wmusîqa helbestî, bedewî û kuk buna wek hevya peyv wdengên serwa, gringir wpuyte dan bi b pêkhatên hûr û bçuk yên pirbha, bunyada helbestî.

*Nexşe*

*Mnallekan*

*Ktêbekantan welanên !*

*Kaxezêk û hendêk qellem*

*Leberdemî xwetan danên*

*Wêney pellehewrêk bken , rengawrreng bê*

*Ba leserî hespêk bka*

*Mûgzing û çawpereng bê.*

*Pellehewrekem nîşan den*

*Le çî deçê*

*Serî hespê*

*Ta şil debin temaşay ken*

*Ba le mêşk û xwên bçespê* (H. r.182)

Li jêdera vê parê helbestê, behsî nexşa sê welatan hatiye kirin, heker bi hûrik li nexşên wan wlatan bnêrîn, wêneya hinek tiştan tê hizra me, nexşeya îtalya li wêneya pêlav û cizmeyekî ddet (mîna cizmeye), nexşeya wlatê (finland), mîna qîzeka êk dest, ku semay diket, xelkê îranê jî nexşeya wlatê xwe bi pşîk dşubhênin (anko mîna pşîkye) ev para helbestî bêhina helbestên fêrkrin (didaktik) jê têt, peşêw mîna mamostayekî zanyarî û rênmayî yan didet qutabî yan, li destipêkî bi îşaret û hêma, pey hindê jî bi deng dbêjît: ktêbên xwe danne rex û alyekî, kaxez wqelemên reng reng dane pêş xwe. Bi tenahî û hêdî hêdî tevaya xet û hêlkaryan fêlî qutabî û xwendvanan dket, 'evrekî rengîn, yanjî mîna serê espî bît!

*mû gring û çaw pereng bê*

Bi rûyekî vekrî wgeş, dbêjte qutabyan wêneyên wan kêşayne nîşa wî bden, pey hindê dbêjît:

*leçî deçî?*

*serî hespê?*

Ev nexşeye hind pîroz û xweştivye, her dbît tevilhevî mejî û xuyn bbît û li wan dû cîhên hestyar û hesas bi şdandin û qayimkirna hêl û serên qeleman bmînin, eve dumahîk daxwazya mamostayê evîndarê wlatye.

*Kurd.*

*Mrîşke reşeyeke*

*Be topîş naculêtewe ...*

*Nazanim mawe yan mirduwe*

*Deyan salle ...*

*Leser luxmî otonomî ...*

*Kir kewtuwe* (H. r.262)

Peşêw di vî wêney da, yarî û henekan bi her dû peyvên (otoneman) û (otonomî) diket, mrîşka reş dikolîta xweda , kirre wsekinye! Ev hemî bizav û peyvên nêv çembera vib wêneya,helbestî tabloyek rind hatye berhem û afrandin.

*Jînêkî trim xellat ke xwaye!*

*Ba kurt bê*

*wek hî gull û perwane*

*Be her bistê 'erd min qinyat dekem*

*Bellam tya nejîm wekû bêgane!* (H. r.265)

Ev du'a û nzaya helbestvanî, ku bi karînana hinek peyv û cumle û hevuk hatye kirin, bandûr li ser dil û nefsyeta mrovî diket, ev daxwazye, wane û pend û şîretên neteweyî nîşanî me didet, ku em bi tiştên herî kêm û hur razî û qaylîn, heker ya mebit! Ev jîn û 'emrî dixwazît xudê mezn bidete wan, çi rengê jînê ye---- hindî 'emra gul û pelatînk!

Şwên (cye) ------ yek biste 'ard (êk bostê 'erdî)

Bi mercekî ku ez xudan mal bin, ne kesê byanî.

*Mnallekan*

*Desgîranim*

*Kotrêkî dyarbekre*

*Hezî le çyaw qaspey kew û*

*Rengî befre*

*Bo gwastnewey*

*Zincîrey çyam qef qef brrî*

*Roj jmêrm perr perr drrî*

*Pesaportim*

*Awat û zerdexene bû*

*Kildan û kîsêk xene bû*

*Ke le dergay snûrim da,*

*Lebatî maç*

*Maçî germî desgîranim,*

*Tfî zerdî postall reşêk*

*Hat swaxî da nawçewanim?* (P. r.232)

Eve heft care, ku despêka wêney bi zarokane, ev waneye behsî bext reşî û negbetya ev sînura çêkrî (wehmî) diket, ku tinê ew sînûr li ser kaxezî heye, sînurek bi zulm û zorî (bi xude û postal) bi ser meda hatye danan û sepandin! Ev sînure ucax û gund û xizm û bira jê kive kirin herwek tê gotin, helbestvan li ciye û alyekî, destgirtyê wî jî li alyek din, ew destigra ku hez ji çya û dengê kewa, rengê berfê diket, ev tişte bu kesê postal li pêda, bê biha û puyç û çûneye. firman û daxwazî yên wan kar pê têkrin, ne daxwazî yên me (xudan mal). Kurdekî xelkê gundekî dûr, perwerde û terîbet li bin destê zalm wistemkarî ye ku sedan sale zulm wzorî li gundya dket û kar û keda wan herwe dçît! Li nav mal û xanî yê xweda gereke bi fermana wan bket û yasax nebît, ew karta li bajêran bi (pasport) hatye nyasîn, li bedel û şuna pasportî, hîvî û grinjîn li gel xwew hilgirtye, bi dyarî ve dçîte nîk destigra xwe, bi kildan wkîska xenayê, wekî dbêjn ( aş le çi xeyalêk waşewan le çi xeyalêk). Ew bi hîvya ramusan û maçkirna destgirtî yê xweye, lê belê bi tfa postal reşekî, dêm wrûyê wê hatye husîn wiswaxdan.

### 3.2.Ala (beyreq)

Ala hêma û sîmbula azadî û xweserî û hêz û dewlet û deselate. Ala dîrokek kevnar heye, di çax û wi demên berê, netinê her dewlet û împratoryet xwedî ala bun, belkî her 'êl û 'eşîr jî alaw druşm wsîmbulê taybet hebûn. ala pêkhatbû ji (*kincir an pateyekî, anjî kevlê heywanî, bi serê "rim"ekî veken, o wêneya rawr"heywan"nekî li ser wî kincrî an wênek din dhat neqşandin, di çaxê kevnar de ala nîşan û cevengya her le şikrekî bû, di şerî de her leşkrek bzav dkir ala leşkirê dî yê dujminî bînte xar û nehêlît, çimko girtin û keftna ala leşkrekî nîşana şkistna wan bû, di çaxê nuzdî de ala bbû nîşana komek dezgee û rêkixrawan, li hemya gring tir, buye nîşana xweserya gelan*)[59]. niha mijar û babeta ala bûye meselek gring û her dezge e û rêkixraw û partên siyasî û hikumetan, ala taybet heye, lê li hemya gringtir ala neteweyî ye. kurd jî mîna gel û netewên din, ji demek zû hizra alay li nik wan serhildaye, her wek tê zanîn ku îmaret û mîrinşînên kurdan, her êk ji wan ala taybet hebuye. di despêka çaxê bîstan de bizavek xurt hebû ji bo wlatek xweser û hebûna alay, bo vê meremê gelek nvîskar û helestvan xebtîne û cîhek diyar hebûye.

Li pey nû kirina şikil û şêwaza helbestên kurdî, hewl û têkuşînek mezn he bû bo neman û nehêlana ew sînurên dujimnan danan wibzavkrin ji bo damezrandna wlatek xweser ku xwedî ala taybet ya kurdistanê bit. ev mijar û dyardeye bi awayekî diyar û berçav di helbestên "Peşêw'î de xuyaye û berçave, dema dbêje: ez çûme binke û apartmana (netewên êkgirtî) min dît her gel û mîlletekî ala xwe heye, tinê me kurdan tû ala nîne li netewên êkgirtî, evejî ramana hindê ddet ko em azad û xweser nîn, herwesa me wilat û sinurek diyarkirî nîne, ji ber hindê em xwedî ala nîn. di helbestên wî de, peşêwî biha û gringya ala ji bo gel û mîllet diyar û rûnkiriye, amaje bi hindê kiriye, heker di xazn bibne xwedî wilatek xweser gereke we ala hebit.

*Mnallekan*

*Ey bêlane jîn tallekan*

*Şew le xewma rêbwarêk bûm*

*Bo baregay (îwtan) deçûm*

*Ke derwazekey qûtî dam,*

*Reşm bînî allay hebû*

[59] 'Ebdulrehman zebihî, qamûsî zimanî kurdî,bergî ekem, çapxaney korî zaniyarî kurd bexda,1977, r:56.

*Spîm bînî allay hebû*

*Herçîm bînî allay hebû*

*Qîjandyan:*

*Ey bê wllat bo derewe*

*Ey bê alla bo derewe*

*Mnîş gutim:*

*Meqîjênin*

*Ke çûmewe*

*Em çîroke*

*Bo mnallan degêrrmewe* (P. r.239)

"Peşêw" xewnekî dibînit, ew xewna xwe bo zarokên kurdan vedgêrit, bi awayekî rexnevanî, di hundir de rexney ji min û ji te û ji piraniya mîllet digrit, li gorî vî xewnî, çoye bingeha (netewên êkgirtî), tevaya gel û mîlletan, mîna: reş, spî, sor, zer, giştik xwedyê beyreq û ala xweserin, tinê ew bê alaye û bê dewlete, li dumahî da bi ser wî da kirin qîrî û kiriye derve, wî jî karî bêjit: heker bizivrim soz û peyman bit vî xewnî bo zarokên gelê xwe vegêrim, ko ew dibne mêrxasên paşerojê, ew hingî nikarin qebul biken wan ala nebit û xwedî ala nebin. "Peşêw" û ala, ala û peşêw, tevilhevî îk bûyne, dû rûyên êk parene.

*Dostekanim ! Baş bzanin*

*Dujimnanim ! Baş bzanin :*

*Çend bawerrm be zerdeşt û*

*Be avêsta û be xwa heye*

*Hezar hêndeş*

*Bawerrm behellkirdnî alla heye!* (P. r.248)

"Peşêw" bi zelalî û bi eşkere, rûyê xwe dikete dost û dujmin û dbêjit: haydar û agehdarbin û bizanin, min çend bawerî bi pîrozî û xudê mezn heye, hind min bawerî bi ala

û blindkirina ala kurdistanê heye. kaklê naveroka ev pişka helbestî, ala û bûn û blinkirna alaye, lê belê "Peşêw" navunîşana helbestî kiriye ala. Ala li nik helbestvanî pris û mijareka gelek gring û bi biha ye, bi zelalî hest bi hindê tê kirin ko ala têkel û tevilhevî xuyn û bun û bîruhizra wî buye.

*Ballindeyek bûm,şeket û tenya*

*Ballêkim koç bû, ballêk raperrîn*

*Nemirdim carêk geyiştme qonax*

*Dway hezaran car kewtin û frrîn*

*Ballêkim da bem*

*Ballêkim da bew*

*Dway seferî dûr birdimyewe xew*

*Beyanî hellsam*

*Dest şetekdraw,pêşetekdraw*

*Dem şetekdraw*

*Be zîndûyetî awerrûtikraw*

*Çemî umêdim bû be awerro*

*Allay şekawem bû be dû pero!* (H. r.432)

ramana peyvên pişk-kopla- (15):

*Ballinde: frinde, teyîr* / *awerro: cûk, cobar*

*Nemirdim: bi zindî, zindîtî* / *kewtin: keftin*

*Şeket: westyan, mandî* / *xew birdimyewe: spêde zû rabûm*

*Tenya: carekî, bi tinê* / *dest: pê: dem*

*Hezaran* / *bi hzara*

Ev par û beşa helbestî behsî kurd û kurdistanê diket, gelek wêneyên helbest yên hunerî û balkêş, têda hene prranîya bzav û xebtîn ji bo gehiştin bi armanc.

Li destipêkêde "Peşêw" behsî bê kesya kurd û kurdistanê diket, bi tinê westyan û mandîbûna rêk û qonaxên dîrokê ye. piştî 'emrek ji xerîbî û derb derî, zivrrî û hateve kurdistanê û hingî dû hêz li meydanê hebûn! Jiyan û paşeroja xwe kiriye diyarî, ew jî herdû perr û balin. piştî ko çavên xwe danane ser êk ji hay çû, dest û pê û dev, westyayî,, avê rûyê wan çik bû nema, tevaya xewn û xeyal û hizirên xwe , di helkirin û blindkirna ala kurdistanê bibînit, lê belê, karesat û trajîdiya dît, ew jî bi guhrîna ala kurdistanê, bi dû kinc û patey.

"Peşêw" bi hinek peyvan çax û qonaxên paşketî yê gel bi bîra me dihînîteve, ko rojek ji rojan di gotê (şere pate). "Peşêw" mîna xwendevan û hzirvanekî vî mîlletî, xemxwer û haydar li buyeran, bi bîr u hizireka vekirî, mîna rexnevanekî hêja, peyvên xwe bi dengekî blind û rîtmeka rind, digehînte guhên me û dixwazît , karên me bikefte ser rêkeka drust û rast û wec û mifay ji buyeran wergirîn, êdî bese, bla carek din dîrok dûbar û sê bar nebteve.

### 3.3.Prutistokirna şer û dixwazîya aştî

Şer û ceng prosîseke li tevaya alyan wal wêranî û wêrankirine, heker şer qidka her gel û mîlletekî bigrît, wî demî ew gel ji alyê mrovî, aburî, cugrafî, jiyarî,... Dê rastî sosret û trajîdye yeka mezn bit. li çax û qonaxên kevnar û berayî, zû bi zû şer dinavbera xelk û gelan de dqewmîn, lê belê digel guhrîn û pêşkeftna gelan, xelk û mîlletên dinyayê gehiştne wê bawerî ku şer û ceng dibine sedema kavilkarî û xrapbûn û heraftin û şewtîna wilat. Kes mfa û xêrê lê nabînit. li pey pêkînana rêkixrawa (netewên êkgirtî YN ) bi hemî corekî ceng hate protistokrin û proseya aştî boye bingeha mrovayetî *(mesela aştî li nav komela tevaya netewên cîhanê, bûye druşm û daxwazya gişkî, kes nkarît vî tiştî li ber çav negrît, blindkirna ala şer buye cîhê şermê)*[60]. digel van hemî bizavan ku hatye kirin bu rê girtin ji şer û ceng lê belê eve bi temamî nebûye sedema nemana şer û ceng û arîşên dijwar, dinav civaka mirovayetî de. Belkî hijmarek şer û cengên dijwar qewmîne, gelek hikumet û sîstemên dîktatoy, bûyne sedema kuştin û jnavbirna xelkên svîl û koçbarkirina xelkên din. gelê kurd bi drêjay ya dîrokî protistoya şerî kiriye û şer nexwaztye, xwedî peyamek aştî bûye, tû dîkumînt û belge nînin, îspat biken ku kurdan êrş kiriye ser xelk û gelên din, an bizav kirbit wilata mîletek din bigrin û bin dest biken. Çimko kurd hertim bi hîvya aştî û

[60] Dr. Marif xeznedar, dîcle î hizirim, dezga î mukiryanî, çap. wezaretî perwerde, çapî duyem, b. duyem, hewlêr, 2006,r:44.

tenahî bûye, da bşêt û bikabit jiyanek xweş û şad bijît. Lê mxabin cugrafya kurdistanê, buye sedema ku bibte cîhê şer û hevrikî li nîvbera wlatên mezn û yên cînar û dewruber, evejî buye sedema dijwarî û trajîdya ji bu kurdan. Pey perçekrin û dabeşkirna kurdistanê, sîstem û rjîmên êk li dû êk yê hkumeta 'êraqî, hertim dijî kurdan bûn. Zulm û zorî û stemkarya wan li dîrokî hatye nvîsandin. Gelek karên xrap li hemberî kurdan kirin û nayet ji bîr bikin. (*raste karên xrap, çi qas req û dijwar û sosreteka mezn bit, herç qas dreng ji bîra me bçît, lê gereke zû ji bîr nekeyn*)[61]. Heker heya radeyek mezn xrape li hember gelê kurd hatye krin, zû li bîranîna wî nemaye, û pend û 'îbret û şîret jê negrîtye, piştî hingî li nik wî bûye tiştek nurmal.

Babet û mijara aştî bûye remiz û sîmbula gel û helbestên şa'ran, buye behsê gring dinav civaka kurdî de (me peyv û zarava "aştîxwaz" dizmanî kurdî de çêkir, jbo wan kesan yên ku aştî dixwazn û dxebtin daku aştî û tenahî li tevaya cîhanê hebit)62. dibêjin kesekî aştîxwaz ku bi hemû alyekî ve dijî şer bit û piştevanî û berevanî ji aştî biket û bizav û xebatê diket da aştî û tenahî û aramî dinav gel û mîletên dinyayê hebit û binece bit. mesele û mijara aştî li demek zû hatye nav dinyaya nvîsîn û helbestan de, armanca helbestvanan di helbestên wana derdkevît ku aştîxwazîye, xuyaye ku mîlletê kurd, ji dil aştî û aramî dixwazît û djî şer û cenge, çimko hertim şer dibte sedema wêran kirin. Di vî warî de " peşêw" pêşeng û rêbere, di helbestên wî de zêtir bîhina aştî jê têt, nek bîhna şer, zêtir hêma û cevenga aştîxwazî û helbestên wî tê ber çav, nek şer û ceng.

*Ta çray ême nesutê*

*Êwe hergîz runakayî*

*Nabînin be çawî xwetan*

*Ta ême dîl û koyle bîn*

*Her kot û nîr*

*Toq û zincîr dekeyn botan*

*Qirman deken*

*Qurtan be ser*

---

[61] Çavkanî pêşî, r:148.
[62] Çavkanî pêşî, r:45.

*Ger bşimrîn*

*Tenya dîlî dedorênîn*

*Çi heye le dîlî talltir*

*Ger bşimrîn her serkewtuyn*

*Kwa le koyley şehîd zalltir!*

******

*Qirman deken*

*Qurtan be ser!!*

*Dway mirdnîş,*

*Lê nagerrîyn*

*Nîştmanman bken be mall.*

*Lê nagerêyn*

*Goştman bxwen wek qel û dall*

*Ger hêç nebê*

*Debîne lim!*

*Deçîne naw paruy nantan!*

*Debîne mar*

*Pepke dexweyn le naw nwêntan*

*Debîne şêr pence û mîkrob*

*Gera dexeyn le naw xwêntan!!,*

*Debêne kwan!*

*Herdemew le cêyek derdêyn*

*Debîne jan,*

*Le sed lawe têtan werdîyn*

*****

*Qirman deken*

*Qurtan be ser!*

*Dway mirdnîş*

*Lênagerrêyn nîştmanman bken be mall.*

*Goştman bxwen wek qel û dall*

*Şayî bken> deykeyn be şîn!!*

*Pirse danên > kastan dekeyn be pêkenîn!!*

*Debîne lekey zman û taney serçaw*

*Debîne mûy naw xwerak û xilltey naw aw!!*

*Ta çray ême nesutê*

*Êwe hergîz runakayî*

*Nabînin be çawî xwetan !!*

*Ta ême her dîl û koyle bîn*

*He kot û nîr*

*Toq û zincîr dekeyn botan!* (H. r.91)

Hizirvanek dibêjit: (ew gela, zulm û zorî li gel û mîlletek din biket, ew bi xwe jî rehet û aramî nabînt, anko ew jî bi corekî ji coran bin deste û şad nîne û dibin stemê daye) bi rastî ev helbeste binirx û bihadare û hêjay hindê ye ku bibite destipêk. Ev helbeste behsî deselatdarê serdest û gelê bin dest diket, alyê bi hêz li hember alyê bê hêz, xuyn rêj û damarî li hember kesên pepuk û lengaz û birçî. Dujminê gel hertim dixwazit (kuştin, şewtandin, kavlibûn, mal wêranî) bidome, vê carê dixwazît tevaya gel jinav bibet û winda biket, daku ax û ava wilat bu wan bimînit. Eve jî sosret û karesate, anku (cînusayde) helbestvanê me li hemberî ev prosîsa qirkirin û îbadekirin radwestît , divêt hêzî bidete gel.

Çira û fener û şemalka disojît, belê dinya wan ronahî dibit, ev rewşe gehişte wî sînurî ku ew hêvî bixazn li cihê me dabin. wêne û amurên vî helbestî pire ji têkuşîn û xebata gelê kurd û edebyeta berevanî, çîn û texa deselatdar dyar û xuyyaye ku serkeftî nabt û namînt! Alyê bexwedanê sed li sed serkeftî ye û serblinde, dû rêk tête pêş vane, gehiştin bi serifrazî, ku eve encama ew xebtîn û bizava wan kirî, an jî şehîd dibin, ev dû ple û derece herdûk blind û pîrozin. protistokrin û refizkirin bi (ger hîç nebê) dest pê diket, ku ewjî ji komek kul û derdan pêktêt. Ew derd dû cor û rengin: ( kirmên bax û bîstana, zîwana nav dexil û dana, xîza nav nanî, mar dinav kinc û nvînan, penceşêr û mîkroba nav xuynî, jan û brîn û kulk qunêr, ji tevaya alyan ve êrşî bo can û leşê me tînin, kêzên zyan bexiş û xrap, şev prisk). "Peşêw" carek din bi bîra wan tînt û dibêjit: dê me qirken me vebrînin, herî û xulî bi serê we bit, dê bi stayl û awayek din êyne biyav û meydanê. Piştî mirna me jî em nahêlîn wilatê me yê pîroz bikene mala xwe, mîna qel û elhoyan goştê me bixwen, pey hindê kiryar û reftarên we.

*Xwa dezanê*

*ballay tfengim xweş nawê.....*

*Bellam kotrekey aştî,*

*Krre we kû şêre be frîney beyanî*

*Le ser lûley metre lozî we sta receb*

*dindûkî xwey*

*xistote jêr ballekanî*

*Wek bîstûme ew kotre mangirtuwe*

*Le asmanî wllatêkî bê alla da*

*Be şrîxey tifeng nebê qet le şeqey ballî nada* (P. r.252)

Ew xudê mezn dikete şahd, ku hez ji dêm û rûyê tifeng û çek û teqemenî naket, lê belê heker kevoka aştî bê deng û bê hiş bit, hingî tû çare li nik me nîne. wêne û tabloya kevoka aştî, luleyên topa osta receb, wî kevokî dmê xwe danye bin perê xwe û mangirtye û xeydye! ev kevoke li wlatê bê ala bê qire – qira dengê tvengê nikarît, perên xwe veket. "Peşêw" komek ji wênên rengîn û bedew li nav êk çemberî komkirye, lê belê li alyek din

bîr û hizireka taybet li hember aştî hevbêje û te'bîr diket, kurdan di kevinda gotiye: (destekî bi tnê deng lê naêt= çeple be yek dest lê nadrê). ewên xwedî ala(beyreq) nînin, bla her kevokên aştî û aştî xwazbin û bi pîroz deyinin, wî divêt lule topên osta recebî bê deng bin, lê belê mirovên damarî û şerixwaz evî çendî nabêjin! Ew tinê li zimanê kuştin wagir û şewtandin têdgehin.

*Serbazî win*

*Ke wefdê deçête şwênê*

*boser gorrî serbazî win*

*tace gullîneyek dênê*

*Eger sbey wefdêk bête wllatî min*

*, lêm bpirsê kwanê gorrî serbazî win?*

*Dellêm gewrem!*

*Le kenarî her cogeyeyê*

*Leser sekoy her mizgewtê*

*Le berdergay her mallê*

*Her kllêseyê her eşkewtê*

*Le ser gaberdî her şaxê*

*Leser drextî herbaxê lem wllate,*

*Leser her biste zemînê*

*Lejêr her geze asmanê*

*Metirse kemêk ser daxe û*

*Tace gullîneket danê* (P. r.429)

Li wilatê wan o li wilatê min: li wilatî wan her tişt binece û drust û di cihê xwedaye, nemaze remiz û ceveng û şehîdên wan, ew bi serblindî û dile kî geş heq û mafî didne şehîdên xwe, rêzî li wan digrin û qeftekî gula li ser gorên wan dadnin. lê belê li wilatî min,

her rojekî mêvanek, an wefdek bihête wilatê min û bipirsit: (kanê li kû derye, gora serbazê winda!) ez bi rêz û rûmet berisva wî ddem û dibêjim: li rex cokên avê, seko û derazînkên mizgefta (camya), berderî (mal, kenîse, şkeft) li ser berukevrên her çyayekî, li bin darên her baxekî......

Navê heft cîhan înaye, pey hindê wî sînurî nahîlit, anko (li ser her bostekî zevî û 'erdî, li bin her bostekî 'asmanî, dû dil nebe! Serê xwe bi tewîne (bi çemîne) û qefta gulên xwe dane). Ji ber ku serbazê winda, o merasîma danana qeftên gula û tevaya ew rêz û rûmet, li pey serbixwebûnê, namînin, ji bo hindê "Peşêw" bi (heker subehî) ew tişt qewmî, hindê behsî (wilatê min) diket anko (wilatê paşeroj) eve famabûn û hişiyarî yeka rinde û hevbêjeke di cihê xwe daye li hember(kurdistan û deverê,....).

*Beheşt û dozex bo min taze nîn*

*Hawkat û hawcê*

*Ewîşm dîwe*

*Emîşm dîwe*

*Nîştmanî min*

*Lewetî heye*

*Beheşte û dozex dewrî tenîwe* (H. r.231)

hinek peyv û cumle û hevokên dyarkirî, bi tîroşkên rengîn, behis û wesfî wlat û nîştman diket, wêneyeka şi'rî ku tbil û destê afrandin têda xuyaye, nîştman mîna behiştek hatye şubandin, lê belê mxabin durmandur doje û ceheneme.

Mîna pend û gutna pêşya ya kurdî ko dbêjît: ( hingve dpîstê sey daye), eve qeder û çarenvîsa kurdane, ko ji alyê neweyî, cugrafî, kêmasî têdaye, dîrok jî xyaneta perçe- perçe bûnê be serda înaye.

*Otonomî*

*Ne xendeye ne giryane*

*Ne mirdne ne jiyane!*

* * *

*Pênasekey wa lay mne*

*Kurd kuje hîwa xesêne*

*Dest û dem û pê bexwêne*

*Rêgayeke nabrêtewe*

*Le nwênewe berew senger*

*Lewêşewe berew nwêne*

*'eyamîke min deynasm*

*Dêwcameye*

*Xemegrrûy hezar renge*

*Qutabxaney*

*Bêsewadî û debengye*

*Kangay gulî*

*Sûzenek û*

*Frrengîye*

* * *

*Ta neykuştûyn*

*Wern, çingî be xwênî sûrî pê hellbrrîn*

*Be şeq ruy pê le dîwar keyn*

*Tfengî xwe kujî frrê deyn*

*Tfengî azadî swar keyn*

*Zirme le cergyewe bênîn*

*Le baz reqey xwênî ewda*

*Yekem tîşkî roj hellsênîn* (H. r.104)

Êk ji deskevtên mezn yê şorş û xebata kurdan, rêk kevtina (11)î adara sala (1970) bû, bu kurdan deskeftek bû, parek ji xewna kurdan hate ciye. rijêma deselatdarî ya 'êraqê, ev rêk kevtinameye, mîna pîlanek li hember kurdan bi kar îna, piştî salekê merema hkumet ku xyanet bû, xuya û eşkere bû, perde rakir li ser rûyê reş û damarya xwe, pey ku soza xwe li hember kurdan şkand, ew rêkkevtin bû druşm û bi utonumî hate bi nav krin, ew jî mîna hkumeta be'si nema û çû nav gor. "Peşêw" mîna helbestvanekî dilsoz û xemxwerê gel, kul û derd û nexweşî û derdên otunomî behis dikit, rjêma 'êraqê hertim şanazî bi vê rêkkeftnamey dkir bi deskeft bo kurdan dhat hesbandin.

Utunomî tiştek xerîb bû, ne kenî bû ne girî, ne mirin bû nejiyan, nabt gringî bi bûna wî bêt dan û bi gişkî dibt bêt refizkirin. Peşêw bi çavek sivk û bê bha dnêrte ew otonumya rjêma be'si daye kurdan, jber hindê bi peyv û wêne hember krîye, ku nzîke ji rastevîne. li gorî pênasîna wî: kurd kuje, nemana hîvî û umêdan, dest û dev û pê bi xuyn, xuyaye ku li cem helbestvanî baş hatye nasîn: be dêwe came, mîna rawrê xemegurî, xwedî hzar reng, dbistana gêj û nezanaye, mak û kanya sê nexweşên pîs û dijware (gulî, sûznek, ferengî).

Heya ku em nekuştîn û em qîr nekirine, bla em çare û 'îlacê hwe bikin, em wan bşewtînin, çek û tifenga xwekujî virdeyin û bhavêyn, bla piştevanî hev bikin û êketya xwe biparêzin. tifenga azadî hazirbikin wan bi deyne ber guleyên tifenga û da dil û cegerê wan xuyn lê bêt, da armanca me bête dî û tîrojik li asmana şadbûna me bête derve û derkevit.

### 3.4.Bêdengî welatan li astê zordariyê li kurd kiriye

Mirovê kurd jî bi vî cor û awayî ye( parûy, neft, deşt, gir)ên wî hatye dagirkrin û brin, herwesa şerf û kerameta wî ta nha li bin pêla(postal) dagîrkerîye.Peşêw di afrandin û neqşandna wêneyan mîna rexnegirtin, ew xwe mîna wlatyekî kurd dhesbîne û bîru hizrên xwe dbêjît û blav diket.

*Mufawezat*

*Ey gwaye bo dillxweş nebîn?*

*Ey gwaye bo hellneperrîn?*

*Çîman keme?!*

*Wa keştîman rû le kenar, pişt le baye;*

*Xêrubêrî kompanyay xwên*

*Şepol dawê, bnî naye;*

*Serman berze wek allaman,*

*Hawrrêy hewr û lûtkey çyaye!*

*Ey gwaye bo dillxweş nebîn?*

*Ey gwaye bo hellneperrîn?*

*Çîman keme?!*

*Şelîn? Korîn? Lallîn? Kerrîn?*

*Çîman keme?*

*Key bo kezî û biskî daykan*

*Wekû êsta, heş zor buwe?*

*Key le sayey*

*Teymanî hêskuprûska*

*Gullî awa geş zor buwe?*

*Key gorristan wa be herrmên û pirr buwe?*

*Kwanê, le kwê*

*Bêdengî wa carr drawe û*

*Mnallîşî pê kirr buwe?!*

*Ey gwaye bo dillxweş nebîn?*

*Ey gwaye bo hellneperrîn?*

*Serifrazîn wek ranemerr*

*Lenaw gurgelî çawtenga.*

*Têrîn wekû wirdemasî*

*Lenaw henawî nehenga!*

*Ey gwaye bo dillxweş nebîn?*

*Ey gwaye bo hellneperrîn?*

*Şwanî gurgzade xweş bin,*

*Azadtirîn ranemerrîn!* (H. r.113)

Mifawezat, ev peyve bi ramana: danustan, civîn, têt, anko gengeşekirina hinek arîşe û tengazyan li nêvbera dû alyan. dîroka doza kurdî jimarek dyar danustan bixuve dîtiye, êk ji wan danustana (rêk kevtna- 11- adara- 1970) bû, ew danustana li nêvbera kurdan û hikumeta 'êraqî hate encam dan. Serkeftî nebû û bê encam bû, ji ber ku hikumeta 'êraqî, merem û nyetek pak û drust nebûye, ji ber hindê tevaya danustanan bêy ku armanca xwe bînte ciye, bdumahî hatin, di heman demî de bandorek xrap û dijwar li ser mîlletê kurd hêlaye û hebûye. Peşêw di helbestekî de, ku çar caran , ew beyta şî'rî, hatye dûbar kirin:

ey gwaye bo dillxweş nebîn?

ey gwaye bo hellneperrîn?

Ev helbesta peşêwî tijiye ji rexne û tan û haydarkirin, ji pîlan û fêl- findên dujminê xapînok. gel caran hevok, an hevbêj "te'bîr"a (çîman keme = çi ji me kêmasye= me kêmasya çi heye) dûbare diket! bersiv jî hertim nedyare û veşartye, anko ew tiştên normal û sanahî, tiştên gring û bingehî û gewherî ve dşêrît û dinxêvît. Peyvên ( kompanya xuyn, xulî, teyman, hermî, gurgên şvan) ew wêneyên şî'rî geş û balkêş kirine, li despêka vê helbestê heya peyva dumahî, helbestvanê me bi zimanê gişkî, an gel dicvît û daxvît û bîr û hizir û şrovekirina wan nîşan didet. fêl-find û corên xapandinê ku dujmin bikar tînit, bu me rûn û xuya diket, ew li ser nyetên xwe, lê dujmin bi sedan pîlanên xrap dijî me bikartînit.

*Futboll*

*Ajansekanî dengubas rayangeyand*

*Yarîyekî futboll heye*

*Dû tîpeke - krêmil û koşkî spî*

*Top - serî kurd*

*Gol kurdistan*

*Temaşaker - dinyay krî wek goristan* (P. r.320)

Ragehandnek ji ajansa nûçeyan, behsî tepa pê (sporê) diket, ew dû tîpên sporê (krîmlin) û (koçka spî) bûn, ku hevirkin, serê kurdan tepa wane, gol jî kurdistane, tiştê 'ecîb û xerîb ewe ewe, ku temaşevanên vê sporê, kir û bê dengin, mîna kir û bê dengya gordistanan. Li vir helbestvan wêne û tabloyeka bede û ya balkêş neqaşnidiye, ku arîşe û tengazyên gelekî bi yaryeka sporeka demkî hatye nîşandan, li pey evê hemî zulm û xedrê ku li mîlletê kurd hatye krin, li dumahîda bi vî rengî henekan bi pîrozî û serifrazya wî bêtkrin! peşêw ne tnê glî û gaznan ji yarîzanan digrît, belkî glî û gazna ji temaşevananjî digre! bi vî şrovekrinê, peşêw zengula haydarî û hişyarkirnê bome lê ddet, da ku bzanîn em çi qas di rewşekî xrap û dijwar dene.

*Cîhan*

*Cîhan - qehpeyekî kerre.*

*Cîhan - qehpeyekî lalle.*

*Her kesêkî be çorrê newt*

*Bendexwênî nekatewe*

*Ferhadêkî rencbetalle!*

* * *

*Cîhan - qehpeyekî kerre*

*Cîhan - qehpeyekî lalle*

*Emrro nîye, deyan salle*

*Eşkî çawm*

*Zengull zengull, dane dane*

*Xwênî dllim*

*Dllop dllop, dane dane*

*Bo gerdinî şûşenewtêk*

*Dekate morîy gerdane!* (P. r.452)

Dema em helbesta (cîhan) dxuynîn, bome eşkere dibt ko "Peşêw" xeydye û tureye! Mîna pendê kurdî û dibêjit: (do û doşavê têkel diket). xeydî bûn nîşan û sîmayeke li nik mirovan tê dîtin, dem û cihê taybet hene, xeydî ya helbestvanê mîna xeydî buna xelkê nurmal nîne û cudaye, rewşek cuda heye. Çûneyî û bê bihaya dinya yê, mijareke û cihek baş hebuye di şi'rên me yê klasîkî û rewşek rind daye wan helbestan, nvîsîna helbestî bi zmanekî xeydî, di edebyata me da kevnare û ji mêjve tê dîtin, bêre ka çewa helbestvanê mezn (nalî) ([63]) çewa behsî dinyaê diket:

*herdeme ferşî kesêkî keye bê mehir û nîkah*

*dûr le çakan çi 'eceb fahîşe duniyayê ke* (d. n. r.94)

Nalî li vê xezelê de ku ji (6) beytan pêkhatye, behsî gelek tiştan li dinyayê dket, ku bi dlê wî nîne lewma tureye û xeydye! Ew tişta nalî bi dinyayê gotye ( serma be hetîw ba be dewarî şrrî naka= sermaya zvistanê na înte serê sêwya, ba naînte serê dewarê ketî û şirr) , her kesek xeydî bit û bxazît tiştekî bêjte kesek din, her dê hindê bêjît. Di vê warê de helbestvan (hemdî) dibêje[64]:

*qeballey ferr û îqballm bdatê namewê çunke*

*jinêkî herze ye dunya ke haşa her deka bo şû* (d. h. r.412)

Li (diniya û wêneyên helbestên hemdî)de, (416), hemdî gelek bi dijwarî djî dinyayê daxvît û bi çavek sivk dinêrîte dinyayê, eşkere xuyaye ku dinya li cem wî bê bihaye, ji ber hindê li nik van hzirvanan wesa hatye behis kirin. peşêw jî mîna şa'îrên klasîk ji dinyayê xeydye, her çi peyv û axaftnek bête ser ezmanê wî dibêjin û amaje bi hindê diket ku wîjdan û 'edalet û însanyet li dinyayê nemaye, her tişt beruvajî bûye, heq û rastî li dinyayîç nemaye. Neft ji bu hemû alyekî nîşan û ramana jiyanek xweş û şad bûn û tenahî didet, lê belê ji bu kurdan temam cudaye! Çimko li bin 'erdê me kurdan behrek neft heye, dgel hindê jî nan nîne bxwen û birçîne, bi grî wrondikên me ristkan bu xwe çêdken.

---

63 Dr. Marif xeznedar, dîwanî nalî, çapî duyem, çapxane hajî haşim, hewlêr, 2008, r:94.
64 'Ebdulla xidir meulud, dîwanî hemdî, çapxaneya rojhelat, çapî pêncem, hewlêr, 2010,r:412.

*Cîhanî azad*

*Hêndey gwê hellxa*

*Bo zemzemey newt le cergey xaka,*

*Kerr û kûrr buwe,*

*Hest be sûtanî lûtkey kêw naka!* (P. r.471)

Dinya ya azad hind perîşan û muhtacî (neft)ê bitin, bibit sedema nemana hestê gûh lêbûn û bibite sedema seqetî û kêmu kasyan bejin û bala heya ew qas ku biçemît û kurbibit, gelo tu bêjî ew dinya çewa bit! hertim guhê wan li teqe – reqa amurên derînana neftye li hundirê 'erdî eve dinyaye wesa kir û bê deng kiriye, ew haydarî xwe nînin û hest bi girkan û şewtandna serê çyayan naken. neft anko made(mîtral), mîtral jî anko dinyaya tjî tengazî û arîşe, tijî kul û keder, heker dinya her dem û gav qerebalxî û lez wbez bit, tubêjî dumahî çewa bit? Peşêw dixazît bêjit: paşerojeka tarî li hîvya mirovayetî ye, jber hindê gereke, em hişyar bîn û bêyne ser riha rast û drust, dibit hest û sozên xwe vejenîn û zîndî bikeyn, ew jî bi armanca çakî û bervewendya tevaya *mirovan.*

*Sedan salle*

*Le wêrane mallî xwemda,*

*Kitke korey goşey metbeqî sultanim.*

*Sedan salle*

*Hewşu berey xwem wallayew*

*Leber dergey dzanî xwem pasewanim.*

*Sedan salle*

*Rojêk debim*

*Be meyterî walî bexda*

*Rojêk le taran kutalm*

*Rojêk lîfkem*

*Piştî jnî sultan deşom ,*

*Rojêk geskim şam demalm!*

*Sedan salle*

*Weku çengêk dane wêle,*

*Aşî mêjû frêy dawm.*

*Herçwar dewrem şaroçkeye û*

*Mêrûle demyan tê nawm.*

*Sedan salle*

*Kase serm mnareye*

*Kê bê , dengî tya helldebrrê.*

*Sedan salle*

*Nîştmanim nêrgleye,*

*Kê bê,be demyeweydegrê.*

*Sedan salle*

*Le ber dergey tekyey cîhan*

*Cutêk soley pîne pînem,*

*Kê lepêm ka bo ew deşêm,*

*Sedan salle*

*Dwa tlîşêk frrê dedrêm.*

*Sedan salle*

*Dway pîneyek le pê dekrêm.*

*Min piştêkî brîndarm,*

*Le qamçî xwem raperîwm.*

*Min lafawêkî lasarm,*

*Lew kenarane helsawm*

*Ketengyan pê hellçinîwm.*

*Nanîşmewe...nanûmewe...*

*Bêaramim..*

*Aramî min çrayek bû*

*Reşebay dewrim xwênî rişt.*

*Bê bezeyîm....*

*Bezeyî min zeryayek bû*

*Bînyan pêwenaw helyanmişt.*

*Nanîşmewe...nanûmewe...*

*Kemin dan bim, kwa derfet ?*

*Yamin, ya mêrû.*

*Kemin xwên bim, kwa derfet ?*

*Sedan salle,*

*Le wêrane mallî xwemda,*

*Kitke korey goşey metbeqî sultanim.*

*Sedan salle*

*Hewşu berey xwem wallayew*

*Leber dergey dzanî xwem pasewanim.*

*Sedan salle*

*Rojêk debim*

*Be meyterî walî bexda*

*Rojêk le taran kutalm*

*Rojêk lîfkem*

*Piştî jnî sultan deşom ,*

*Rojêk geskim şam demalm!*

*Sedan salle*

*Weku çengêk dane wêle,*

*Aşî mêjû frêy dawm.*

*Herçwar dewrem şaroçkeye û*

*Mêrûle demyan tê nawm.*

*Sedan salle*

*Kase serm mnareye*

*Kê bê , dengî tya helldebrrê.*

*Sedan salle*

*Nîştmanim nêrgleye,*

*Kê bê,be demyeweydegrê.*

*Sedan salle*

*Le ber dergey tekyey cîhan*

*Cutêk soley pîne pînem,*

*Kê lepêm ka bo ew deşêm,*

*Sedan salle*

*Dwa tlîşêk frrê dedrêm.*

*Sedan salle*

*Dway pîneyek le pê dekrêm.*

*Min piştêkî brîndarm,*

*Le qamçî xwem raperîwm.*

*Min lafawêkî lasarm,*

*Lew kenarane helsawm*

*Ketengyan pê hellçinîwm.*

*Nanîşmewe...nanûmewe...*

*Bêaramim..*

*Aramî min çrayek bû*

*Reşebay dewrim xwênî rişt.*

*Bê bezeyîm....*

*Bezeyî min zeryayek bû*

*Bînyan pêwenaw helyanmişt.*

*Nanîşmewe...nanûmewe...*

*Kemin dan bim, kwa derfet ?*

*Yamin, ya mêrû.*

*Kemin xwên bim, kwa derfet ?*

*Yamin, ya zêrû.*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Dan û mêrû bray yekin.*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Xwên û zêrû bray yekin.*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Masîw çengall,*

*Mişk û cewall,*

*Dest û çzû bray yekin.*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Pet û gerden,*

*Gwêzan û mû bray yekin .*

*Wern xellke!*

*Le nêçîru zam biprisn,*

*Bllên, tuxwa,*

*Xencer heye zam tîmarka?*

*Raçî heye nêçîr nexwa?*

*Dexillke, le ka biprisn,*

*Qet agrî sardî dîwe?*

*Le hêlaney mell biprisn,*

*Be nyazî maç ,*

*Qet mar demî tê jenîwe?!*

*De ledar berrû biprisn,*

*Tewrî dîwe dar birr nebê?*

*De le kerêkîş biprisn,*

*Gurgî dîwe ker dirr nebê?!*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Marî şîrîn jarîş heye.*

*Qehpen ewaney pêm dellên:*

*Tewrî bray darîş heye.*

*Min piştêkî brîndarm,*

*Le qamçî xwem raperîwm.*

*Min lafawêkî lasarm,*

*Lew kenarane helsawm*

*Ketengyan pê hellçinîwm.*

*Nanîşmewe...nanûmewe...*

*Bêaramim..*

*Aramî min çrayek bû*

*Reşebay dewrim xwênî rişt.*

*Bê bezeyîm....*

*Bezeyî min zeryayek bû*

*Bînyan pêwenaw helyanmişt.* (H. r.65)

Sedan sale, navunîşana helbest û qesîdeka dirêje, li cem min bi geleryek mezn tê hesbandin, ser dîwarên wî gelerî bi dehan tablo û wêneyên qeşeng û rengîn têda helawîstyene. ew tablo û wêne runahî didene hol û odên gelerî. pênc kuple- par- li vî qesîdey bi (sedan sale) dest pêdiket, kopla êkê û çarê her êkî dû car, kopla pêncê sê car, peyva (sedan sale) têda hatye bi kar înan, deng û rîtma hundirê qesîdê li vir dyar dibit, li hinek wan kopla rewşa, mirovê kurd şirove diket, di hinek wêne û koplê din dije êk û tiştên 'ecîb û xerîb û seyr pêkve hevbend diket, peşêw di vê qesîdey da, peyv û rengê jêk cuda bi kar anye û ev tişte bi eşkere bi wan tabloyan ve diyarn. dijî û deselat, zulm û zorî û xedir û bin destî, haydar nebûn ji xew dewruber, carkî mîna pşîkeka kure, car din mîna sey, ber derê wan dparêzît. Kurd tnê êke lê sê xudan hene ('ereb, 'ecem, turk), herdemekî xulam û 'ebd û benî yê êk jwan bûye, kurdan hinek hêz û şyan têda hene, ku bibt bi sê par, tnê xizmeta wan bket, xizmetkareka sivk û çuneyî: (meyterî, bo xizmetkirna esp û dewaran, lîfk, bo şuştna pişta jna sultanî, gêsk, bomalîn û paqijkirna kuçew klanên şamê).

Dema dîrok mist an çengekî genmî nahêrît, dhavêjît, mêwî lê xirve dbin û bo xwe dben û dxwen. Li kopla çarê de "Peşêw" behsî (ser)î dket, herwek tê zanîn, ku serê mrovî çar hest têdane (dîtin, bîstin, bênkrin, tamkrin), ev herçar hestên kurda nemane û şul naken, herkes bhêt dkarît bi keyfa dlê xwe,berjewendî û armanca xwe bi wî bqedînt (bînte cye), kurd jî dest betal dmînteve. Ji boy haydarkrin û hişyarkirna gel, peşêwî gelek bzav krîye, wêne û amurên cuda cuda bikaranye, karye bi vî corî (dar û ber)an, jî haydar bket! Ku kurd jare li ber derên xelkî sul û pêlava diryayî dkete pê xwe, an mîna kincrekî kevin û pînekirye, hemî mrov an xelk nkarn ev rengê jyanê bi borînin û bjîn. dibêjin: sebir û hedar û xwegirtin sînurek bo heye, jber hindê helbestvanê me, xalek dadnît û bi tureyî ve tête meydan û ew daxwazî bi dengekî blind bket qîrî û hawar û bêjte cîhanê, eveye zulm û stema li kurdan tê krin û rewşa kurdan şrove dket, bi merema hindê ku soz û hiş û wîjdana mrî û winda hişyar û haydar bket, (qançî û piştê brîndar, lehî û rexê avê, çra û reşeba, dar û mêwî, xuyn û zêrû) li dumahya qesîdeyda, hinek wêneyan nîşan ddet, ku tevaya wan dû tiştên jêk cuda û djî êkin, wêne û tabloyên rengîn, tjî deng û awaz û ahenga xweş, şînî û nifrîn û dujîn dan(cnêw), cîhê pêkgehandnaye. hebyestvan bîra me tînt ku ew li xew rabûye û hişyare, berev pêşve dçît, ewjî dxazît carek din, bibit mirov û hêvî û armancan bidestve bînit.

### 3.5.Rexnekirina sîstema wilat û nebuna 'edalet

Deselat wilatî bi rêve dibet, hinek caran ew deselat dibite sedema serifrazî û xweşî û şadbuna xelk û gel, hinek carên din jî deselatek dîktator hukim diket, ku bûye sedema nexweşî û kul û derdan bu xelkî û bu civakî. pir bihatrîn tişt ew ku deselatî 'edalet û wek hevî hebin, anko bi êk çav binerîte tevaya wilatî û xelkî, cudayî û vartinê neket li nêvbera xelkî, bi sedema ol û mezheb û regez û bîr u bawerên cuda yên siyasî. pey drustibûn û damezrandna hkumeta 'êraqê, deselatî cudayî kirye li nêvbera xelkî, bi eşkere dadperwerî û 'edalet pêpes kirye, bi sedema hindê jî gel tûşî , şer, zelîlbûn, birçî bûn, hatye, ev rewşe wesa bû heya gehaye demê hkumeta be's, li demê hkumeta be'si , xraptirîn û dijwartirîn cye bo xelkî, dadgee(mihkme) bû, ( *xelkek zor ji wlatî yên 'êrqê bi sedema dadgeha xrap û regez û şofînî, tûşî nexweşî hatin û perîşan bûn, jber ku dadgeha 'îraqê bnemayên yasa û qanunî bce neîna, eve di demekî em dzanîn ku dad ('dil) mercek bingehî ye bo aştî û tenahî û aramî di nav civakî de*)[65]. pêtvî ye erkê dadgehî dabînkirin û bidest înana heq û mafê xelkî bit, lê belê mxabin li vir dadge buye cihek bu pêpes kirina mafê xelkî. ev deselate

[65] Newzad ehmed şwanî, tawanî cînosaîd le yasakanî îraq da pêş salî 2003,g:senterî lêkolînewey sitratîjî, j:68, r:124.

(deselata hikumeta be's) li hember kurdan gelek xrap bûn li ser syaseta xwe berdewam bû heya serhildanê, ku kurd şiyan mafên xwe bi dest ve bînin, helbestên "Peşêw"î tekez li hindê dikin ku deselatê zalm wistemkar nadomîne pey damezrandna hikumeta herêmê (başûr) û bi bikarînana deselat bi awayek xrap ku di berjewendya hinek kesane, carek din peşêwî rexne ji deselata kurdî girt, tekez kir ku gereke hukim kirin bu xweşî û berjewendiya gelê kurd bit, herwesa gereke dadperwerî dnêv endamên civaka kurdî de dyar bit û reng vedan hebit.

*Xweşewîstim!*

*Xawen wişe lem wllate*

*Hemîşe hatî nehate!*

*Deyanewê*

*Xawen wşe wek heng wabê,*

*Her ke be rûy kaxez wedat,*

*Bimrê wekat!*

*Deyanewê,*

*Wşekanman*

*Kot û zincîr bo pêyan bê,*

*Sayey sêdare cêyan bê!*

*Deyanewê,*

*Wşekanman*

*Bêdeng bkewn be rûda,*

*Wek hezretî smayl kewt*

*Le jêr rehmetî çeqûda!*

*Deyanewê,*

*Bnûyn, bxweyn... Wekû ewan.*

*Bnûsîn, brrêsîn, brroyn... Wekû ewan.*

*Deyanewê*

*Kit û mit "ême" "ewan" bîn*

*Wek melêkî momyakraw*

*Bê arezû, bê rewan bîn!* (P. r.154)

Ev pare, nameke jwan sê name (mesc)yên, kurt yê ku helbestvanê me jbo evîndar û dilketyê xwe hinart ye. Li destipêkêda behsî gringî û bandora peyvan dket, deselatdarên tirsînok û damarî pêtvî çi corên peyvanin, ji ber hindê ew mrovên xwedî peyvên resen û hêja û heq û gran, li cem wan cîhê tirsêye û ew jê hez naken û nifrînan lê dken. Hukim û deselatdarek bi kutek û zorî û agir û asn wlatî brêve bibet, gelo xudanê peyvên heq li cem wan biha heye! ew dixwazn, peyvên helbesta peşêwî bibte zincîr bo grêdana wan. Ew dixwazn peyvên helbestvanî bê deng û bê hest bin wtû bandorek li ser xelkî nebit, mîna hezreta îsma'îl bu bicye înana fermanan. wan divêt û dixwazn em bi temamî sed li sed mîna wan bîn (nvistin, xarin, nvîsîn, rêstin, hatin û çûn,....). li dumahîda van tablo û wêneyan li hinek peyvan de berçav diket:

*ew dixwazn*

*(em) bi temamî mîna (wan) bîn....*

*mîna frindeyekî ya mumyakrî,*

*bê can, bê xwast û bê daxwazî bîn!*

*Xweşewîstim!*

*Rojê dadê,*

*Girr berbête şar û ladê*

*Rojê dadê, kurd bpirsê:*

*Key rewaye lêk bipçrrê*

*Gerdanenekey kej û kêwm,*

*Be pêdze lemyanewe*

*Bo ewî tir pê bibzêwm?*

*Rojê dadê, kurd bpirsê:*

*Key rewaye, xwem birsî bim, keçî lewlaş*

*Bêganeyek genmim bkate qurrgî aş?*

*Key rewaye,*

*Mnallî min serma pencey btezênê,*

*Dzî rojîş zêrrî reşî bsûtênê?*

* * *

*Xweşewîstim!*

*Ke rojê hat*

*Wellamî xweman dayewe,*

*Xwênî tûrrey agrînman*

*Le demara cullayewe*

*Ew rojî xwet meşarewe*

*Taku pêkrra,*

*Yek deng, yek ra,*

*Lenaw şrîxey tfenga,*

*Le jêr çetrî şewezenga,*

*Kurdistanî milyoneha le nahezan*

*Bkeyn be kêllgey kareba,*

*Be gorristanêkî hezaran*

*Lepall tawêre berdêka senger bigrîn,*

*Ya dêynewe dest le gerdin*

*Ya dest leser tfeng demrîn* (P. r.171)

Peşêw rûyê xwe li evîndar û dilketyê xwe dket daxvît, evîn û peşêw, puşêw û evîn, dû alî û dû qutb û cemserên helbestî temam dken. Li vî parî de dû halet û rewşan nîşan ddet ( roja têt, heker rojek bêt), roja li paşerojê têt, pirsê li cem xelkê kurdistanê çêdket, anko bnêrîte xwe û dewruberî xwe, li pey hindê vekulîn û gengeşe dest pêdket, wî demî an hingî guhrîn çêdbit. kengî heqe (jar û belengaz, nexweşî, nexwendevanî) nesîb û para gelê bin dest bit û deselatdar jî, li xweşî û keyfu lezetî bjîtin. peyvên mîna (gerdaney kej û kêw, pêdezewî bizwên, dzî roj û zêrî reş) amorên wêneyeka rind û bedewn. eger rojek bêt (ke rojê hat), evîna min xwe li min winda neke, bi êk deng û bi êk hzir, ew tiştên em dixwazîn, xweşî û serifrazya me têda bit, dê keyn û bê hîvî nabîn, em tola xwe ji dujminê zalm û bê wîjdan vekeyn. Dû rêk li beramene, an dê gehîne hêvî û armancên blind û pîroz, an em û tfeng li çeperên şerî şehîd bîn.

*Qellemekem çekuçe û*

*Her peyvêkîşm - bizmar*

*Stem leher cêyek bê*

*Deyismim wek texte dar!* (H. r.210)

navu nîşaneka mezn, hinek peyv, tabloyeka rengîn û balkêş.

*qelem---------- çekuç*

*peyv----------- bizmar*

*stem----------- le herşiwênek (li her cihek)*

*simandin(simîn)--------- wek texte dar (mîna depê darî).*

Hizirek ne tnê zulm û zorî nahêlît û pê razî nabt, belku dê kun ketin û dê smît. Qelem mîna çekuçî ye, peyv jî bizmare, zulm wzorî nkarît xwe li ber bigrît, mîna depê darî dê smît û kut ket. Stem û zulm derd û belayekî gran û dijware, ev kiryare ku mrovên damarî û serdest li hember xelk û mrovên belengaz wbin dest, dken û encam dden, li dumahîda her şerimzarî û rû reşî bo wan dmînît.

*Kobûnewe*

*Ta pirteqall û moz û sêw mabin,*

*Kobûnewekan qet tewaw nabin!*

*Ger detanewê*

*Ew sîsarkane wek kew kewî ken,*

*Le bexda çonin,*

*Le kurdistanîş*

*Serî seqetyan wa pê newî ken:*

*Tuxwa, emcare, ke kobûnewe,*

*Çerez û mêwey ser mêzekanyan*

*Hemû wela nên,*

*Hêskuprûskî enfalekanyan*

*Le berdem danên!* (H. r.470)

Kombûn, an gengeşekirna bîruhizran li dûr her pirsekî, şop û rêkeke bo dîtneva çare bo arîşe û tengazyan, evejî dbîte sedema pêşveçûn û çareserkrin û nehêlana wan arîşe û tengazîyan, lê belê ev kombûn û gengeşe cîhî sewdaserî û mendehoşîn, jber ko dwan kombunan de pute û gringî zêtir bi xwarn û vexarn dden, evejî dbîte sedema ku dûribkevin ji kakil û gewherê jimjara kombunê û haydar nebin û bi kurî û bi micdî behis neken, anko xweşî û bezeta e tiştên di kombunêda tête bera wa û dxwen, sedemeke ku kombunên xwe bdomînin. helbestvan behsî ( pirteqal, moz, sêw, çereza) dket ko li kombunan de pêve mjul dbin. Dema mrov dostî û soz û wîjdan winda bit û nemînt, hingî xweşî û berjewendyên kesî dkevne pêş serifrazî û berjewendyên gel û mîllet. Gelo tu bêjî hest û soz û heluyista evan mrovên husa çewabît? heker bedelî ( fêkî û çerezat )an, (hestî yên şehîd û enfalkirî yên kurd ) dane pêş wan.

Rexnekrin û glî û gazinde ji kiryarên xerîb û dyardên krêt û vehêt yên nav civakî, pêtvî bi nêrîneka hur û kûr heye. Helbestvanê xemxwerî ax û netewe û gel, ne tnê xal e tiştên dyar dibînit, belkî tiştên ne dyar û veşartî jî dibînit û lê haydare, ew tişt bi sanahî bi ser wîda naburn.

*Gring û gringtir*

*Serbexweyî gring nîye!*

*Her heşt pîtî nawî wllat - be 'aneyek.*

*Qellay hêskî enfalekan -*

*Be merhebay bêganeyek.*

*Gring nîye!*

*Xuda deykird (qudis) debû be orşelîm,*

*(dill)îş deçuwe naw perasûy yekaneyek.*

*Gring nîye, ba be'sî û caş*

*Burûkêne naw derpêşman*

*Wekû şare moraneyek.*

*Gring nîye! Deba wllat seruxwarî*

*Bbête kellexaneyek.*

*Bellam gring*

*Kursîyekî sard û srrî*

*Wek tabûtî bin mirduwe,*

*Gringitrîş:*

*Ew dolare çawsewzanen*

*Ke bo xurbet serî xweyan hellgirtuwe!* (H. r.472)

Gring, gringtir, an gring nîne! Helbestvanê me dbêjît: li cem wan azadî û xweserî, ku eve mafên bingehî yên her kes û netewe û gelekin, gring nîne, heker xuynek zor û zehif jî pêxemetî hindê bê rêtin! Tevaya xelkî dzanin ku çi bac û bhayê xweserî çend grane). Ew heşa (tîp)yên ku navê wlat pêktînin (k,û, r, d,s, t, a, n) bi 'aneyek(çar flis)î, anko heker tiştek bê bha bît, dbêjn: (be 'anekye)! Kelhek ji hestyên laşê enfalkirî yên me, bi êk

merheba (serpêkî)î, ya mrovekî byanî ya nedîtî û nenasî, bidin. mirovek an grupeka mirovan, ev serifralzî û pîrozyên mîlletekî bi vî awayî bê bha bket, dibit ew mirov di ç ast û dereca mrovayetî û jînê dabin. heker ev nêrîn û şrovekirne tûne û bê biha bo ew babet û mijarên gring û çarenvîsa man û jyana wa bit! Guhrîna orşelîm bi qudis, û qudis bi orşelîm, yanjî ewên din çi l meselan tê guhrîn. Heker eve qonaxa dorandin û jdestdana êkê bit! Gelo qonaxa duwê me di gehînte kuder?! Evene mrovên be'sî û çete (caş)ekan, mîna spî û moraney li her çar rexêt me hene û li dewruber û li nav depê meda hene, da şeref û namusa me bin pê bken, gring nîne! Bla tevaya axa wilat bibte cihê (fisq û fcur) û hewesbazî, li gorî wan tû gring nîne. tiştên gring li cem wan dû tiştin:

1- kursîka (deselatî) ku bi tabuta mirya hatye şubandin (mîna tabutye)

2- xirvekrin û komkirna (dolar)an, daku daxwazî wmeremên xwe bce bînin.

*Mnallekan*

*Ey birsîye jîn tallekan*

*Leser sînge*

*Newtawîyekey babegurrgurr*

*Nêzîk tavgey*

*Serewjûrî zêrrînî girr*

*Gullkoyekî biçkolem dî*

*Lêy nûsra bû:*

*alêreda*

*Mnallêkî çawrreşî kurd,*

*Lebirsan mird* (P. r.233)

(diwazde wane) li nêvbera salên (1969- 1970) li gundê (kendal) li bajêrê hewlêrî hatye nvîsandin û o li 22/3/ 1973 li vîstfala şî'rî kurdî, li bajêrê kerkuk, hatye xwendin. Dwana (heştem) de, tabloyeka xemgîn û trajîdî ya mîletê kurd nîşan didit. ev sosret(trajîdya)ye, heya nhajî li nav kurdan dûcar û dûbare dibteve û carek din dqewmît.

Babagurgur: derya ya zêrê reş, boryên mezn yê neftê, terîbe dgel gor (turbe)yên, zarokên kurd, ku bi sedema birçî bûnê mrîne û canê xwe ji dest dane.

*Mnallekan*

*Ke wanekan dexwênnewe,*

*Eger roj bû*

*Le kuncêkda kip helltûtên*

*Eger şew bû*

*Ba çrakan kiz bsûtên*

*Çak dezanim*

*Gewrekantan btanbînin*

*Daxtan deken*

*Wanekanim desûtênin*

*Dên dûbare*

*Cestey helac*

*Dedenewe le sêdare* (P. r.240)

di waneya (dwazde) de, peşêw, şîretan li zarokan dket, çewa û bi ç awayekî wan (dwazde wanan) bxuyinin! Bi roj an bi şev, heker meznêt hewe bzanin hun ev wana dxuyinin, dê hewe êşînin, dî hewe (dax)ken, heker ew bzanin dî hemî waneya şewtînin, carek din mîna (helac) heq bêjan bi darve ken û pey hindê dşewtînin.

### 3.6.Zivrîn (vegeriyan) bu kelepura gel

Mirov qonaxên jiyanê êk li dûy êk derbazkirîye û gehiştye bunyad nan û çêkirina wilat û ala(beyreq) û hevbendî di çarçova sînurekî daniye. Her gel û mîlletên dinya yê komek tîtal û dabunerît hene, ku hevbendî bi çand û kelepura wan yên civakî, ko di jîna rojane de van tîtala tê praktîzekirin. Tîtal û 'edet û wi dabunerîtên berê û kevnar, berhemê destê bab û kaên mene, gereke em bi çavekî kêm û nebaş ne nêrîne van tîtalan. (*Li gorî hindê em nabt bi çavekî kêm û nzim berhemên berayî û kevnar mêze bikîn, herwesa gereke*

*ew lêkolînên hinek hzirvanêt mezn mîna: hirbirt sipnisr, adlov bastyan, firdrîk ratzil, di vê mijarê de bi cih înayne, dibit em li ber çavên mebin*)[66]. ev folklor û kelepura kevnar, ji bu mirovên dem û çaxên borî tiştekî bi mfa û bhadar buy ye. Gereke em kar û xebatên wan nvîskaran li bîr nekin, ewên ku karîne kelepûr û folklora me kom krine û nvîsandine, eve jî boye sedema hindê ev folklor winda nebit û bêt parastin. (*folklor runtirîn û xuyyatrîn alyên reftar û kiryarên mirov ye, ji ber hindê bu tevaya xelkî, mîna: saykolocî, civaknas, dîroknivîs, zmannas,gring û pirbhaye*)[67]. tev alyên jiyana mirovî dinav folklor û keltûra kurdî de hene, anko folklor wek neyneka civakiye, mirov dikare bi saya neynekê civakî baştir nas bike, anko mirov berhem û rengvedana dabunerît û tîtalên civakî ne, bandora folklorî bi ser tev alên civakî de heye, mîna: saykolocî, civakî, dîrokî, herwesa bkarînana ziman, ev pirse hemî hevbendin bi kelepûr û frilklorî ve.

Çand û kelepura civakî di ast û dereca ruşnibîrya civakî ye, anko heker civak di alêy roşnibîrî pêşkeftî bû, eve ramana hindê didet ku ev civake xwedî komek çand û tiştên bedew û balkêşe, di alyekî din ve, heker cvatek xwedan kultureka rind û bedew bit, lê belê dalyê roşnibîrî ve pêşkeftî nebit, hingî ew civak hêdî hêdî kultura xwe winda diket, wî demî çand û roşnibîrya byanî û xerîb cihê wan digrît.(*heker roşnibîrî taybet nebt bi gel û netewekî, herwesa sura parastna roşnibîrî bi hêz û bnecye nehatbû bunyad nan û vejentin, bi corekî ptir rêk û şopa zarvekirin û teqlîdkrin helbjardibit, eve hêjay vî navî nîne û erkê xwe bce ne înaye û nabit roşnibîrî)*[68]. anko ew roşnibîriya dinav civakî de buye çand û kultur, heker baş xwe qaiym neket û rastî êrşên byanî nebteve, bi temamî bi awayekî drust rêkî li lasayî û zarvekrin negrît, êdî hingî ew roşnibîrî nikare be rolê xwe bich bînit, di dawîde ew roşnibîrî dimrît û namînt û civak jî dibit xwedî kultureka byanî û xerîb.

Kelepur û folklora kurdî, folkloreka pir dewlemende, ji bab û kalan ji bu me maye, helbestvan û nvîskarên kurd, her tim behsî gringî û bha folklorî kurdî kiriye, o tekez ji parastna vî folklorî kiriye.(*em di dîroka kurdî de, li dû mirovekî feylesuf bgeryên, herwesa bi armanca dîtna felsefekê diyar, eve dinav folklora kurdî de bi giştkî felsefên cuda cuda tê dîtin*)[69]. folklora evro li ber destê medaye, gelek dewlemende, û pranya mîllet ji folklorî hez dike, her alyekî folklorî mêze bikin, dibînin komek mijar û tiştên, bedew û jêhatî têda hene, herwesa dibne amûr û programa gelek vekolînan. (*heker hîkayet û efsane û janrên kurdî bêxîne alyekî û behis nekîn, tnê li ser " pend û metelokên kurdî- gotnên pêşîya-"*

[66] Cewad heme beg salih, rojnamenusî mindalan le başûrî kurdistan,ko.raman, j:187, r:123.
[67] Mehirdad r.êzdî, ziman, wêje, xwêndin, wergêr: yusufezadin, ko. raman, j:110, r:110.
[68] Pr.d. Kamil hesen besîr, wêje î kurdî û rexnesazî, çapî ekem, çapx. dar elcahiz, bexda, 1990,r:386.
[69] Dr. Mawlud îbrahîm hesen, pêkhateiy efsaneiy kurdî, çapx. renc, çapî ekem, 2007,r:294.

*baxvîn û vekolînê li ser bkîn, dnav van mesele û penda de, ree û rîşalên felsefên cuda,tên dîtin*)[70]. heker tinê (gutnên pêşîya-mezna-) ko pişkeke ji derya folklora kurdî, mêzebkîn, dibînin tijî ye ji hîkmet û zanayî û felsefe. (*piştî serhildanê ku em bxwe-kurd- azad buye û serdeste, piştî hingî hur hur gerek bû bzavê bkîn ji bu drustkirina însitîtîwt û peymangee û dezgehên, kelepûrî û roşnibîrî, ewehnigî heya nha hkumet û partên kurdî, hizra danana "syaseteka kelepurî " nekriye, daku angurî plan û programek kar û xebat ji bu roşnibîrya gel û netewe yê resen û esl, bce bînin, bi armanca derînana vî roşnibîrî li bin bandora kuledarî û paşkotya kultura biyanî*)[71]. piştî damezrandna hikumeta kurdî, gerek bû hikumet û partên kurdî, di xema folklora kurdî ya resen bin, rêk nedaba û nehêlaba kelepora biyanî, bgehte kurdistanê û xwe qaym biket, gerek bû syaset û planek hebaye, ji boy ku folklora kurdî wekî xwe mabaye, glî gaznan li pranîya alî û xelkê kurdistanê tê kirin (*gerek glî û gaznan ji mîlletê kurd bê krin, ko nekarîye bi temamî kelepurê xwe bparêzît*)[72]. ev gazinde hêjane, çimko gereke gelê kurd bi xwe bi parêzit. Wî demî ev folklor bi tu awayekî winda nabit, o kiltura biyanî nikare bête cihê çand û kelepura me.

Helbestvan "Peşêw" rastî folklor û tîtal û dabunerîta kurdî buye, hest û ş'ur bi hindê krîye ko hêdî hêdî folklora kurdî tê li nav brin û namînt, ji ber hindê ew mîna mêrxasekî hate meydanê, têkoşîn kir daku helbestên wî mak wrewşeka folklorî pêve dyarbit û kaklê folklorî di helbestên wî de rengibdeteve û xuyyabt.

*Eger emcare bêmewe :*

*Beyanyan,*

*Wek berxwelleyekî sawa,*

*Lenaw qersîlî parawa*

*Til dexwem û*

*Gyayekî tift...têrtêr decûm,*

*Ta kift debim,*

*Pê û belekim*

---

[70] Çavkanî pêşî, r:294.
[71] Azad ebdulwahîd, bîst sale raman wek dar berû her be pêweiye,g:raman, j:229, r:3.
[72] D. Meulud îbrahîm hasan, newrozî kurd le efsane we bo be cîhanî bun,dezga î bedirxan, çapxane hêvî-hawlêr, çapî ekem, hewlêr, 2012, r:41.

*Le şewnimî sard helldesûm !*

* * *

*Eger emcare bêmewe :*

*Wek simore,*

*Be dargiwêze berzekana helldegerrêm,*

*Wek pelleyek hewrî newî*

*Beser kêllge sewzekana dexulêmewe,*

*Wek şenge bî*

*Beser çema,*

*Beser gişt znarekanî*

*Kenara...deçemêmewe,*

*Ax , bes emcare bêmewe !*

* * *

*Eger emcare bêmewe:*

*Sernic dedem*

*Gullegenim çon zerd debê,*

*Henaru sêw çon pê degen,*

*Qetêyekan*

*Hêlaneyan çom çê deken !*

*Sernic dedem,*

*Zerrneqûte çon ball degrê,*

*Perresêlke koçerekan,*

*Leser têlî karebay rê,*

*Çon rîz debin ,*

*Cogelekan le kwêwe dên ,*

*Bo kwê deçin !*

** * **

*Eger emcare bêmewe :*

*Le goy memkî her kanyek*

*Qume awêk dexwemewe,*

*Giştyan dekem be daykî xwem ,*

*Le her eşkewtêka, şewêk*

*Ser be gaşe berdêk dekem ,*

*Giştyan dekem be lankî xwem ,*

** * **

*Eger emcare bêmewe :*

*Zmanî girr dehênmewe bo lallekan,*

*Şaperrî girr dehênmewe*

*Bo frrinde bê ballekan !*

** * **

*Eger emcare bêmewe :*

*Nahêllm lawan gull biçnin*

*Bo gulldanî mirdûy ser mêz .*

*Fêryan dekem ,*

*Ke çûne jwan ,*

*Le berokî kçanî den ,*

*Ewsa byan kene amêz !*

* * *

*Eger emcare bêmewe :*

*- mnallanî moskoy çawşîn fêryan kirdûm -*

*Bê şîrînî*

*Ser nakem be hîç mallêka,*

*Zor colaney nerm û sade*

*Bo mnallan helldebestim.*

*Le cejnî ledaykbûnyana*

*- ke nîyane -*

*Beşdar debim ...*

*Lebatî mom dadegîrsênim engustim .*

*Girr berdedem*

*Le glêney çawekanim ,*

*Le sawatrîn hellbestim .*

* * *

*Eger emcare bêmewe :*

*Her bêşkeêyk bête rêgem ,*

*Be şêneyî be serya denûştêmewe*

*Ax , mnallan !*

*Ax , bes emcare bêmewe .* (P. r.339)

Heker vê carê vegerim!! Eve axiftin û bêjeyeke, ramanek hêja û blind ji soza xerîbya wilat didet, mîna giryeka xerîbî û dûrya wilatê, bla bzanin heker "Peşêw" vê carê vegerît dê çi ket? Eve navunîşana helbest- qesîde- yeka drêje, ji şeş par-kople-an pêkhatye,

li destipêkêda bi wêneyeka şi'rî rind û balkêş despêkirye û dibêjit: heker vê carê vegerm , speedy ya mîna kark û berxekî, dinav pincar û gya û çulî yên durmanorî gundî dê xwe çerînim xwetêvedem xwegevzînim û henekan dikim, pey hindê dî xwe bu alê rastê bu alê çepê gevzînim û bizivrim û xwe berdeme nav pincarî, ew gya û pincarên tifin û te'li jî bi dilê xwe dixwem, pey hindê heya diwestim, çeng û pê û zendê xwe li nav wan pincarên şîn yên xunav girtî dê hnum û têvedem. Gelo dibit helbestvan çi lezet û xweşyekî ji van wêne û tablo û kevalên rengîn, yên spêdeyya gundî wergirit. "Peşêw" tiştên hûr û bçûk yên sruşt û xwezaya kurdistanê mêze kiriye, bi kurî nêrye wan tiştan, karye tiştekî bakêş bi afrînit, bnêre, ew xwe bi (svore) dişbînt(mîna svorey), dema dçîte ser dara guyzê yên mezn û blind, pî hindê helbestvan hiş û xeyala xwe dûr dbet û xeyala hindê dket ko ew boye 'evrek hêdî – hêdî bi ser zevî û rez û baxên gundî bburît û derbaz bibit. xeyala hindê dket dara çnarê baye, dema dbîte rewşa ser çem û gya û wan dera dxemlînt, bi ax û kulekî xemgîn dbêjît, bes vê carê vegerim! cara sêyê, raman û nêrînên wî hurtir û xuya dibin û derdkevin, hêjayî û meznya "Peşêw" di hindê daye ew mîna mirovekî haydar û dostê xweza û sruştî, hatye meydanê, nûvejen dtiştên hûr û biçûk, wêne wresm û kevalên, mezn û balkêş dafrînt û çêdket, bnêr wî demî dema ko gulên genmî zer dibin! Yanjî hinar û sêv dema digehîjin çend bedewe, bala xwe dikşîne teyra(qetê)yan, dema hêlîna xwe çêdiket.

gulên genmî—sêv û hinar--- qetê

"Peşêw" zêtir heyran û mendehoşê xweza û sroştîye, dema hur dnêrte ferxên çuçkan, yên nû bûy ka çewa perên wan derdkevin, herwesa dnêrîte teyra(peresêlke)î, dema dfirn , bi awayekî rind û balkêş mêze krîye, dema li ser têlên kareba û li ser rêkan dnîşn, pranîya xelkî ev wêne dîtne, lê belê "Peşêw" karye van wêneyan bkete helbest û carek din bala me bikşîne, li dûmahîda cokên avê mêze dke, li kuve tên û kuve dçin.

Zernequte, peresêlke , cok

"Peşêw" ta niha bi temamî can û dlê wî li nêrîna ev xwezaya firdewsî têr nebuye û naxwazît bhêlît. Ji ber hindê dbêjit: heker vê carê vegerrm!! Vê carê cuda ji carên din, xeyal û hest û soza şa'îryetî bu wêne û dinyayek din yê balkêş çûye û friye, wêneyek me heyran û sewdaser diket. dema jnek hinek caran şîrê xwe ddete zarokekî wî demî ew jin dibîte dayka şîrî yê wî zarokî, û li gorî dîn û ola me hsêbek taybet bu wê jinê tê kirin. ew kevir û berên nav şkeftan diakete hêlîn û landik. Di vê wêneya şi'rî helbestvan dixwazit carek din mîna zarokekî sava xwe bêxte ber sîngê dayka mezn û landika berê , zivrîn û vegeryana helbestvanî bu çax û qonaxa zarokî, xuyaye ku ramanek taybet didet, anko

hevbeendkirina jiyan û bûnê bi b wî axî ku bi wlat û nîştman hatye nav kirin, ku helbestvan bu demekê kind jî nikare lê cuda bibit. "Peşêw" dûr keriste û amurên cuda, wêne wdîmenan diguhrit, heker vegerit dû tiştên xwedî hêz wişyan dînit!

*zmanê gurrî (gir) bo mrovên lal*

*perrên gurrî (gir) bo frindên bê perr û bal*

Lalî û nebûna perr û bal, dû nexweşî û derdên dijwarn dnav civakî de, tiştên hevbendî yên jîn û jyarî nahêlît û o winda dket, tiştên spî dibne reş, yên reş dibne spî. ev wêneya hunerî ger li ser baxfîn û bi her alyekî lê bnêrî ramanek dewlemend ddete me. Derkeftin ji sînûr nhênî yên xwezayî û axiftin bi zmanê gurrya agrî û şaperên gurrî tiştên mezn tên guhrîn û tiştên rasn û drust wekî xwe dmînin. Her jber hindê xurt wlawan tînteve ser rêka rast û ew armanca wî dvêt, bo van xurta dbêjît û nîşanî wan ddet, ne ew tiştên hene. li dumahîda "puşêw" ezmunên xwe bi taybet ew tiştên li zarokên (mosko) girtye û zanîye û bala wî kşandîye, dînteve bi armanca çêkrin û drustkirna rewşekî delal û rind û mutirbekirna wan tiştan bi kelepura me, ji bo xweşkirna jyanê, nemaze jyana zarokan û dinyaya paqij û balkêşa wan, ku eve dibne pêşkeftna civakî.

*li dû êk hatin*

*ax, zarkno*

*ax, bes vê carê vegerm*

Ev gotine ji blî kû ramanek normal heye: gelek raman û ceveng û nîşanên mezn didin û kefiş dikin. da em bizanîn ku rêk yên kurt û hûr, bîr û hizrên helbestvanî bi sanahî dûmahî naên.

*Bo nêrgizêkî kêwîlke*

*Drextekanî verronêj,*

*Wekû kîje kurdî ladê,*

*Şerm deken rût bibnewe,*

*Herçend heway payzîşyan beserda dê.*

*Ey nêrgze kêwîlkeke!*

*To şarezay cadekanî*

*Em şare xerîbet kirdim,*

*Bo bertîşkî çray kzî*

*Hemû baxe pirr nhênîyekant birdim;*

*Kollan kollan*

*Dallan dallan*

*Hemûy gerrayn*

*Koga koga*

*Rêga rêga*

*Hemûy gerrayn...*

*Kam sûç tarîk û nûteke,*

*Lewê xweman kird be çra û*

*Tya dagîrsayn!*

*********

*Ey nêrgze kêwîlkeke,*

*Supas boto*

*Ke şarezay cadekanî*

*Em şare xerîbet kirdim!*

*Supas bo to*

*Bo ber tîşkî çray kzî*

*Hemû baxe pirr nhênîyekant birdim.*

*Bellam,tuxwa,lêm bbûre*

*Eger bllêm*

*Rêgey dillt pê nazanim,*

*Ke çwar pence le min dûre!* (P. r.302)

Veronîj: navê bajêrekiye, ev bajêre li ser rûbarekye bi navê (veronîj). Xuyaye ku "Peşêw" sala xwendna (1973- 1974) li wêrê borandîye. peşêw li (veronîj) qîzên bi şerm-şermînok- yên kurdistanê hate bîra wî, dhaletekîda ew qîz bi darên vî bajêrî şubhanye û hesbandye. Li wir kinc û belgên xwe naêxin û nawerînin, şerm dikin xwe rûs bikin. wêneyeka helbestî yê balkêş:

*kiça kurd----- şerminî*

*Darên veronîj------ awhewayî.*

Dgelek cîhên dnê, li ser vî 'erdî, bi sedema seqa û awhewayeka xweş, pranîya rojên salê, behare û hertim deşt û çya xemlandîye.

*Serkewtin*

*Serdekewîn!*

*Çunke dwênê*

*Topequrrêkî destkirdim*

*Daye dest mnallêkî kurd,*

*Ew, lebatî bûkeşûşe,*

*Tifengêkî biçkolaney lê drust kird!* (P. r.251)

Rastî û yeqînek li nîk "Peşêw" çêbûye ku gel û mîlleta wî dê serifrazbit û serkevît, hinek caran tişt û cevengên bçuk, raman û me'nayên mezn didin. ew yeqîn û rastî li cem wî li hindê xwe nîşan didit, bu nmûne, dema hink teqin û herî bdene dest zarokekî kurd (xurt an qîz, ti nîk helbestvanî wek hevin) ew bûkekî an tiştek din taybet bi zarokan çênaket, belkî ew zarok tvengekî bçûk dê çêket û drust ket. hebûna xurt û qîzên nûdem, paşeroja mîlletî rontir krîne, belê: tevaya rastyan niha hene, şek û gumanên me nahêln.

Di beramberkirna nvîsîna vî têksitî(1971- 2016). helbestvanê xwendevan û hişyar (dûrmêze de, tiştên dûr dibîne) bîr û hizir û şrovên wî, xwedî ezmûne, tîrê xwe bi drustî li nîşanî ddut, li rastyan nêzdîk dibîteve.

*Kose*

*Hatin, hatin, kose hatin.*

*Hatin, hatin,*

*Derge daxen, kose hatin:*

*((heyaran û meyaran*

*Yaxwa dakate baran*

*Bo feqîr û hejaran))*

*****

*Kesêk derge le rûy kose nekatewe!*

*Sallehaye*

*Tewnî dro helldebestin*

*Kosekanî em dinyaye.*

*Sallehaye*

*Derwazey asman daxrawe,*

*Çawman wek pûl*

*Be zerfî reşî ruxsarî*

*Kosekanewe nûsawe.*

*****

*Sallehaye, sallehaye,*

*Beqed espêy nîfokanman,*

*Beqed rişkî tûkeserman,*

*Hewrî bellên bem xakeda têdeperrê û*

*Dllope baranêk naye.*

*Sallehaye,*

*Sallehaye,*

*Nazanîn klîlî asman*

*Le gîrfanî xwemandaye!*

***

*Hatin, hatin, kose hatin.*

*Bin zmanyan*

*Hezar û yek zurrnay tyaye,*

*Gwêtan bigrin, tê nekewn.*

*Peyjekanyan*

*Dendey rûtî birsîyekane,*

*Agadarî serbanan bin, sernekewn!*

***

*Hatin, hatin, kose hatin.*

*Eger dergeyan rahejand,*

*Mnallekan fêrken bllên:*

*Bon dê... Bonî bêganan dê...*

*Bon dê... Le 'erd û banan dê!* (P. r.277)

Kose an kosebebe, di rûpela (280), çavkanî de hatiye, (kose: li bajêr û devera hewlêr dibêjine kesekî ko li demê salên baran nebarît, bi tenî-xulî- dêm û rûyê xwe reşdket û li kuçe û kolanên taxîda dzivrît û dçîte ber derî yê xelkî, xelkijî dî avê bi ser daken, daku baran bibarît)[73]. Ferheng û mjarên din yê kelepurê kurdî, me'na û ramanên din didet, kose: ew mêre ko mû li smêl û rîhên wî nehêt, anko bê mû bit, kurd dibêjin (ev mirove koseye). Herwesa dinav efsane û hîkayetên kurdî de, hinek kes bi kose tên navbrin, ewên ko: (*fend-*

[73] Abdulla peşêw, pişt le newa û rû le krêwe, helbest, , çapxane hêvî-hawlêr, çapî sêyem, hewlêr, 2008.

*fêlên xurt bizanît, her roj rûyek cuda hebt*)[74]. helbestvan "Peşêw" ev tîtalê kurdewarî dbin navunîşana kose, dexne dike, mîna rexne vanekî nvîsandye û xaztye bi rêka hinek şîretan qazanc û mfay bgehînte mîlletê xwe, bi armanca neman û nehêlana ev tîtalên kevnar). Xuya ye ku dema çaxê berê dema buye hişkatî û baran nebarîye, mrovekî henek van dêt û dêm û rûyê xwe bi tenî reş kiriye û rûyê xwe yê rastî veşartye, da nehête nyasîn, wî demî zarok bi tlîlî û hawar û qîrî û li dû kosey çûne, o lber deryê malan av kirye ser serê kosey, bi armanca hindê daku xwedê baranî bbarînt (xuya ye ku ev tîtale gelek kevnare widnav xelkê deverê hebûye).

Di pişka (kopla)êkê de "Peşêw" hink ji wan sitranan tomarkirîye, yên ko zarok li vî buneyda dbêjn, di pişka duwê de rûyê axiftna xwe li xelkî krîye û dbêjît: deryê xanyên xwe li kosey bigrin û neveken! Ev çend saln tevnên drew dhunin, çend saln deryê asman girtye û qepate. Di wêneya dûmahîk dêm û rûyê bi tenî bi kaxez û zerfê reş dşubhînt.

Nîfo: eve ew der û kune ko li alya jorî ya şel û depê bo doxînî tê çêkrin, dema berê ko " kêç û spî" hebûn, nîfo cîhî bûna kêç û sipya bû.

Rişk: dem û çaxên berê gelek rişk û spî dnav kinc û li ser leşê mrovî hebûn, li dûr vê çendê helbestvanê me dbêjît: hindî van hemî jmarêt rişk û sipya, suz û peymana hatna 'evrî daye me, belê dlopekî baranê nebarî. Eve hinde saln, kesekî hizreka nû bo vî mjarî kşif nekrîye û neytyeve. Haydar nînin li wê hindê ko klîla vekirna dergehên asmanî her dinav berîkên wandaye. di pişka çarê de, dibêjit, behsî fend-wfîl û xapanidinên kosan diket, "Peşêw" me haydar û hişyar dket, ko gelek corên xapandinê li ber destê wan hene, bi merema xapandna xelkî. Xuya ye ku hijmara (hizar û êk) hêma û cevengeka pir dewlemend heye, "Peşêw"î ev jmare bo pranîya tiştan bikar anye.

"Peşêw" di pişka pêncê de, motîv û mijareka balkêş ko efsane û hîkayetên, kurdî dumahîk bi vî motîvî tînin, ewjî motîva ( bon dê, bonî bêganan dî, lew 'erd û banan dê= bîhin têt, bîhna bînya tît, ji 'erd û banyan têt).

---

[74] Hejar, ferhengî hembane borîne, xapxane sirûş, tehran, 1991.

**ENCAM**

1. Helbestvan digel hestên welatparêz, helbest û rexne bi hev re honandiye.
2. Helbestvan,di der barê fenomena ku wekî ku Kurd kirêt in de peyivîye û çareserî nîşan daye.
3. Helbestvan, di der heqê civaka xwe de hizirîye û ev hizra xwe wek helbest anîye zimên.
4. Helbestvan, hemû helbestên xwe ji van sedeman der barê gel û welatê xwe nivisîye: dûrketina ji welêt, parçeweslebûna Kurdistan, nedewletbûna Kurdistan û ji alîyê dagirkeran ve dagirkirin û pelixandina Kurdan.
5. Peyama helbestvan a dawî jî mirovatî û aramî ye, ew jî lihebersekinanadina şer mimkun e.

**ÇAVKANÎ**

1. D. Şûkrî azîz el mazî,fî nezeriyetil edeb, dar neîir el mûeseset el erebî lildirasat, libnan, 2013.
2. D. sûhêr el qelmawî, mihazerat fî neqid el edebî, dar el marifa, qahîre, 1959.
3. M.ç.ebramiz, ferheng tewsîfî û îstîlahat î edebî, t. s'ed sebiziyan, întîşarat rahinma, tehran, 1384.
4. D.ebdel hûseiyn zirîn kûb ,aşnaiyî ba neqid edebî, întîşarat sexin, tehran, 1387.
5. Riniye wîlk û eustn warn, nezeriyetil edeb, t. miheadîn sûbhî, d.hîsam el xetîb, teb'eya:3, dar neîir el mûeseset el erebî lildirasat, beiyrût, 1987.
6. D.ûmer muhemed talîb, el mezahîb neqdiye(dîrase u tetbîq), dar el kutub lil tiba'e u lil neîir, el musil, 1993.
7. D. hîmdadî hûseiyn, derwazeiyek bo rexne î edebî kurdî, çap. xanî, dihok, çapî ekem, 2007.
8. Said yasîn, tehlîl ectîma'eî lil edeb, dar 'eiyn lil naşir, teb'eya:3, el qahîre, 2007.
9. Mecmû'e min katib, t. d.rezuan zaza û d. El munsîf el şinufî, medxel ela menahîc el neqid el edebî, sîlsîle 'ealim el m'erîfe(221),el kiueiyt, 1997.
10. D. hûriye muhemed hemu, hereke el neqid el mesrehî fî suriye (1967-1988) dîrase, min menşûrat îtîhad el kîtab ereb, 1988.
11. D. silah fezil, menahic el neqid el mi'easir, mîrît lil neşir û lil m'elumat, teb'eya:1, el qahîre, 2002.
12. Amanc usman hemed, saîkolociyet î deqî edebî, ko. raman, j.20.
13. D.ûmer muhemed talîb, el mezahîb neqdiye(dîrase u tetbîq), dar el kutub lil tiba'e u lil neîir, el musil, 1993.
14. D.ebdel hûseiyn zirîn kûb ,aşnaiyî ba neqid edebî, întîşarat sexin, tehran, 1387.
15. Riniye wîlk û eustn warn, nezeriyetil edeb, t. ziya mûehîd û perwêz mûhacîr, întîşarat 'elmî û ferhengî, tehran, 1382.
16. Can bul sarter, mel edeb? , tercume: d. Muhemed huneiymî hîlal, dar el nehze misr lil teb'e û neşir, qahîre.
17. Wiliyam c. grîs, edebiyat û baztab an, t. behruz ereb defterî.
18. Ş'eban ş'eban ehmed, kurte pênaseiyek bo cîhanî firawanî rexne î nû ê, ko. raman, j.(50).
19. D.sîrûs şîsima, întîşarat firdus, tehran, 1381, r:23.
20. Raber tel'et, pêgeiy 'eqil û sefsete lay 'eli werdî, dezgay aras, çapa ekem, hewlêr, 2008.

21. Rolan barit, çêjî deq, wer. îsma'el zari'eî, çap. minare, çapa ekem, hewlêr, 2007.
22. D. hîmdadî hûseiyn, derwazeiyek bo rexne î edebî kurdî, çap. xanî, dihok, çapî ekem, 2007.
23. 'ebdul mecîd 'ebdul rehman, rexne y 3 honrawe keiy himare ekî defterî kurdewarî, ko. defterî kurdewarî, b. sêyem, çap. zehira, bexda, 1970.
24. Muhdîn aware, rexne î kurdî be çi aqarêk guzer dekat, ko. nuserî nû ê, j.64, hewlêr, 2013.
25. Sadiq behadîn, dîwana melaiyê cizîrî, çap. korî zaniyarî kurd, bexda, çapa ekê, 1977.
26. Ehmedê xanî, mem û zîn, amadekirin heharî mûkiriyanî, çap. enstîtû î kurdî parîs, çapî ekem, parîs, 1989.
27. Marf xeznedar, dîwanî nalî, çap. hacî haşim, çapî duem, hewlêr, 2008.
28. Ebdulla peşêw, hespim hewre û rikêfim çiya, helbest, çapî sêyem, kurdistan-hawlêr, 2008.
29. Azad 'ebdulwahîd, diyalog, b. sêyem, çap. şehab-hewler, çapî yekem, hewler, 2013.
30. 'ebdulla xidr mewlud, ew ş'eraneiy le dahênanêkiyan ziyatir têdaiye, ko. zanko, b. 18, j.1.
31. D. 'ebdulla xidr mewlud, janirekanî edeb, ko. raman, jimare 187.
32. D. Muhsîn ehmed umer, edeb û baiyografî, ko. raman, jimare 112.
33. Refiq hîlmî, ş'ir û edebiyatî kurdî, b. dwem, metbe'e el te'lîm el'alî, erbîl, 1988.
34. Silahedin hesen, hewl tebî'e elfen û mulamehe electîma'iye, mûcele el eqlam, 1976.
35. Marif xeznedar, bo biray berêz ebdulla peşêw, ko. karwan, jimare 168.
36. Dr. Marif xeznedar, dîcle î hizirim, dezga î mukiryanî, çap. wezaretî perwerde, çapî duyem, bergî ekem, hewlêr, 2006.
37. Şêrko bêkes, kejawey giryan, helbest, wezaret el seqafe û wel e'lam, çap. kameran, çapî ekem, silêmanî, 1969.
38. Ev axaftin di dr. Muhemed xidir meulud wergirtiye, dema li rusiya xandina bilind temem kir, ev tişte dît bû.
39. Îlham bacelanî, ciyawazî nêwan kiç û kûr le komelgakanda, ko. karwan, j:237.
40. Îsa'il resûl, lêkolîneweyeş le edeb û folklorî kurdî, ko. defterî kurdewarî, j:1, bergî ekem, bexda, 1970.

41. Dr. Hamîd ezîz, hizirî komelaeytî le çiwar çêwe î sîstemêkî sertapagîrî da, ko. raman, j:110.
42. Ferhad celal mistefa, rolî asaiyş le siyasetî newdewletî da, ko. senterî lêkolînewe y sitratijî, j:68.
43. Fereydun ebdulrehîm, barudoxî siyasî Kurdistan-îraq, çap. minara, çapa ekem, hewlêr,2006.
44. Ebdulla xidir meulud, lêkolîneweiyek le ş'irî hemdî, çap. roşinbîrî, çap:ekem, hewlêr, 2004.
45. Ebdulrehman zebihî, qamûsî zimanî kurdî, b. ekem, çap. korî zaniyarî kurd bexda,1977.
46. Dr. Marif xeznedar, dîcle î hizirim, dezga î mukiryanî, çap. wezaretî perwerde, çap duyem, b. duyem, hewlêr, 2006.
47. Ebdulla xidir meulud, dîwanî hemdî, çap. rojhelat, çapî pêncem, hewlêr, 2010.
48. Newzad ehmed şwanî, tawanî cînosaîd le yasakanî îraq da pêş salî 2003,g:senterî lêkolînewey sitratîjî, j:68.
49. Cewad heme beg salih, rojnamenusî mindalan le başûrî kurdistan,ko. raman, j:187.
50. Mehirdad r.êzdî, ziman, wêje, xwêndin, wergêr: yusuf ezadin, ko. raman, j:110.
51. Pr.d. kamil hesen besîr, wêje î kurdî û rexnesazî, çapî ekem, çap. dar elcahiz, bexda, 1990.
52. Dr. Mawlud îbrahîm hesen, pêkhateiy efsaneiy kurdî, çap. renc, çapî ekem, 2007.
53. Azad ebdulwahîd, bîst sale raman wek dar berû her be pêweiye, ko. raman, j:229.
54. D. Meulud îbrahîm hasan, newrozî kurd le efsane we bo be cîhanî bun,dezga î bedirxan, çap. hêvî-hawlêr, çapî ekem, hewlêr, 2012.
55. Ebdulla peşêw, pişt le newa û rû le krêwe, helbest, çap hêvî-hawlêr, çap. sêyem, hewlêr, 2008.
56. Ebdulla peşêw, Hespim hewre û rikêfim çiya, helbest, çap. hêvî-hawlêr, çap. sêyem, hewlêr, 2008.
57. Hejar, ferhengî hembane borîne, xapxane sirûş, tehran, 1991.